MEDYA, PÊŞEROJ, MIROVAHÎ Û KURD • Faysal Dağlı • ▶ 5

Îslam û çanda ciwanên li bajaran
Synnøve Bendixsen • ▶ 6

Li Sûriyeyê pirsgirêka "biyaniyên Tirkiyeyê"
Mihemed Cemal Barut • ▶ 15

LE MONDE diplomatique kurdî

Almanya: 3,50 Euro
Welatên din: 4,00 Euro

Kanûn 2009 - Hejmar 2 www.lemondediplo-kurdi.com · info@lemondediplo-kurdi.com 32 Rûpel

# Deynê ku bûye qeder...

SERGE HALIMI*

Bi xêra alîkarîya fermî ya dewletê, rewşa banqeyan ji nû ve baş bû. Êdî weha bûye ku piştî wê qeyrana aborî, pişta banqeyan jî ji berê xurttir bûye û ew jî mezintir bûne. Bi vî awayî, derfet jî kete destê wan ku, heger bobeleteke din ya weha were serê wan, ew ê dewletan baştir "êsîr" bigirin. Ji ber wê ye ku hikumetên rojavayî û banqeyên wan yên navendî tam di vê demê de alarma deynên xwe lê xist.

Bi awayekî konetî di nava parantezan de behsa wê hatibû kirin û diviya ku ji bo rizgarîya Goldman Sasch, Deutsche Bank an jî BNP Paribas alîkarîya ku hatibû dayin ji derekê bihataya stendin. Di heman demê de, wê sembola topavêtinê dîsa serî hilda, da ku hişmendîya kara bazirganî êdî hin warên ku li derveyî wê hatibûn hiştin bi temamî bindest bike. Giranîya deynan, ya ku bi qeyranê ve xurttir bû, dîsa ji wan re bû mahne ku parastina civakî û servîsên fermî têk bibin. Salek berê jî dihat gotin ku liberal li ber sikratê ne; lê belê di daxuyanîya "qase vala ne" de, wan vejîna xwe ya polîtîk jî peyda kir.

Ew ê leza xwe kêm nekin. Koalîsyona nû ya desthilatdarîya Berlînê soz da ku ew ê deynê wan ê bacê bi 24 milyar euroyên din jî siviktir bike, digel ku, sala bê, çavkanîyên Almanyayê yên navxweyî dê li gora mesrefên ku dike % 6.5 kêmtir be (li gora rêjeya ku Yekîtîya Ewrûpayê ji bo peymana stabiliteyê daniye, ji du qatan zêdetir e).

Konservatorên ingilîz da xuyanî ku ew ê baca li ser şîrketan kêm bikin. Li Fransayê jî, ji hilbijartina Birêz Nicolas Sarkozy û vir ve, rastgiran bere bere saetên kar yên zêde ji holê rakirin, bi "mertaleke bacî" wan pişta sermayeyên mezin xurt kir û kara wan ya ji sermayeyê xist bin parastinê, mafên firotinê kêm kirin û herweha biryar dan ku baca profesyonel ku li ser şîrketan bû jî ji holê rabe.

Berê, konservatoran xema wê dixwar ku hesab li hevdu dernekevin û amade bûn ku baca ji bo vê bilind jî bikin. Ji sîh salan û bi vir ve ye ku dijberê wê dikin û deynê dewletê jî berhema wan e û bi armanca ku rêkên mudaxaleya fermî ya civatê bêne xitimandin, hatiye kirin. Yanî, tevgereke xemsarîyê ya ku reçeteyan kêm dike û di ber re daxuyanîyên li ser felaketan dike û bi vî awayî mesrefên Dewleta-xwedayî didewisîne.

"Reagan nîşan da ku deynên dewletê ne giring in." Sala 2002'an, Cîgirê Serokê Amerîkayê Richard Cheney, gava ku kêmkirina baca rasterast hat rojevê, ji wezîrê xwe yê aborîyê ku ji vê mijarê ditirsiya re weha digot. Ji bo Birêz Cheney deynên dewletê tu ziyanê nade wî

* Nivîskar, rojnamevan, edîtorê Le Monde diplomatique

▶ 4

TIRK Û KURD

# Rêya çareseriya aştiyane

ANDREAS BURO*



Rıza Topal, (Bênav)
(Derbarê hunermend de rûpel 4)

Di Kanûna 2002'an de ez hatim vexwendin da ku tevî şandeyeke mafê mirovan biçin serdana serokê giştî yê AKP'ê yê wê demê û serokwezîrê Tirkiyê yê niha Tayyip Erdoğan li Enqerê. Komeke mezin a wezîran û hevalên wî yên kar ên herî nêzîkî wî di hevdîtinê de amade bûn. Me ji wan re eşkere got, pirsgirêka mafê mirovan ên Tirkiyê bi tenê eger pirsgirêka di navbera tirk û kurdan de bi awayekî aştiyane û siyasî were çareserkirin, çareser dibin. Ji bo vê jî me pêşniyarên xwe kirin. Bersiva Erdoğan ev bû: ''Pirsgirêka kurdan nîne.'' Wî ev yek di 2004'an de di dema serdana xwe ya serokwezîrê Almanyaya Federal Schröder de li Berlînê jî dugêsînî kir. Di vê navberê de guherîneke mezin çêbû. Çareseriya pirsgirêka kurd di dawiyê de û bi awayekî ku veger jê nebe di rojeva Tirkiyê de cihê xwe girt.

* Profesor doktorê zanistiya siyasî

▶ 2

Rûdaw Hemû rojên sêşemê li firoşgehan
Deutschland, Österreich, Nederland, Belgique, France 1,50 Euro | Schweiz 2,70 CHF | England 1,40 GBP | Sverige 21,00 SEK | Denmark 15,00 DKK
info@rudaw.net | www.rudaw.net

www.arsivakurdi.org

Ji bo vê yekê gelek hêz bi hev re xebitîn: Hewldanên aliyê kurd tevî pêşniyarên wan ên li pey hev ji bo çareseriyeke aştiyane, demokratîk û siyasî û agirbestên yekalî jî hêjayî behskirinê ne. Serokkomarê Îraqê Celal Talabanî bang li Tirkiyê kiribû da ku efûyeke giştî ji bo şervanên Partiya Karkerên Kurdistanê (PKK) a qedexekirî (1) derbixe. Talabanî ji rojnameya "Sabahê" re di 17'ê Adara 2009'an de axivî û got, gaveke bi vî rengî dikare bibe bingehê çareseriyeke aştiyane. Di civîneke navnetewî de wê komên girîng ên kurdan hemûyan bang li PKK'ê bikira ku di kontrola Dewletên Yekgirtî yên Amerîka'yê (DYA) de sîlehan deyne. Berê nîşaneyan li aştiyê bû. Herweha girîng bû ku Talabanî daxwaza efûya giştî li Stenbolê ango li nava dilê Tirkiyê kiribû. Bi vî awayî nedibû ku elîta siyasî ya Tirkiyê xwe li vê daxwazê re kerr bikira. Daxwaza ku PKK sîlehên xwe di kontrola DYA'yê de deyne, nîşan dide ku li pey daxwaza efûya giştî û danîna sîlehan DYA jî heye. Têkiliyên DYA'yê bi kurdên Îraqê (2) re gelekî taybet û baş in.

Erdoğan hê sala 2005'an der barê 'pirsgirêka kurd' de -ya ku wî di vê navberê de naskiribû- nîqaş derxistin pêş. Heta, wî şaşiyê dewletê jî qebûl kirin. Daxuyaniya Serokkomarê Tirkiyê Abdullah Gül a 12'ê Gulana 2009'an hê jî ji bo îhtîmala siyaseteke nû ya Enqerê der barê vê pirsgirêkê de gelekî girîng e. Wî gotibû: "Pirsgirêka kurd, pirsgirêka herî mezin a Tirkiyê ye. Mirov çi jêre bêje bila bêje, çi 'pirsgirêka terorê, çi pirsgirêka başûrrojhilat çi jî pirsgirêka kurd', ew pirsgirêka herî girîng a Tirkiyê ye û divê were çareserkirin."

Li gorî vê, di dawiyê de sala 2009'an Erdoğan jî amade bû ku bi serokê giştî yê partiya kurd Partiya Civaka Demokratîk (DTP) Ahmet Turk re rûne. Ev hewldan hemû divê bi rêzdarî werin qebûlkirin, lewra li her du aliyan jî di şert û mercên herî dijwar de pêk hatin.

Nîqaşeke piralî ya navxweyî dest pê kir û di vê nîqaşê de hema bêjin her mijar hat ravekirin. Pirraniya van mijaran di nexşerêya dosyaya bi navê "Projeyên Çavdêriyê: Şewirmendiya Pirsgirêkan a Sivîl, Pêşîgirtina li Şîddet û Şer" (3) ya saziya Alman 'Hevkariya ji bo Aştiyê' (4) de hebûn û li derdorên ku berê wan li siyaseta aştiyane yên li Tirkiyê jî hatibû danasîn.

Di Mijdara 2009'an de 'pirsgirêka kurd' li parlemana Tirkiyê jî hat nîqaşkirin. Wezîrê Karê Navxweyî Beşir Atalay bahsa hin mijarên siyaseta kurd kir ku hewl didin pêş bixin. Di nav van de ev hebûn: Navên berê yên deveran wê ji nû ve bikarîbûya werin bikaranîn, Kurdî di jiyana dînî û civakî de were bikaranîn; dibe ku kurdî weke 'dersa bijarte' di dibistanan de were fêrkirin, kontrolên polîs û leşkeran werin kêmkirin û saziyeke serbixwe ji bo kontrolkirina giliyan were damezrandin. Guhertinên ku wezîr behsa wan dikir, bingeheke têrker ji bo siyaseteke lihevhatinê ya kurdan a nû nînin. Ev guhertin bersiva pirsa sereke nadin; bi PKK'ê re li hevhatinek wê çawa çêbibe û şer wê çawa bi dawî bibe?

## Sedemên çiva Enqerê di siyaseta kurdan de dayî xwe

Ji bo çiva Enqerê di siyaseta Kurdan de dayî xwe, ango guherîna siyaseta wê, gelek faktor hene ku divê mirov bahsa wan bike. Hikûmeta AKP'ê ji 2002'an ango destpêka ku hatiye ser desthilatdariyê û vir ve berê awirên xwe û hişê xwe dabû endametiya Yekîtiya Ewrûpayê (YE) û ji ber vê yekê jî diviyabû serê xwe bi reforman biêşanda. YE yekîtiyeke firetnîsîte, fireçand û firedîn e. Siyaseta bi darê zorê asîmîlekirina kurdan û binpêkirina mafên mirovan ên bigehîn bi hev re meşiyan. Şerê leşkerî yê li dijî gerîllayên PKK'ê kêm serketî bû. Bi ser de jî daxuyaniya Serokê Fermandariya Giştî ya Artêşa Tirk ê berê Yaşar Büyükanıt heye: "Eger em tevahiya artêşa tirk bişînin çiyayên Qendîlê (5), emê nikaribin wî çiyayî ji PKK'ê paqij bikin." Bi awayên eskerî hewldana çareserkirina pirsgirêkê ji bo budceya Tirkiyê gelekî buha ye û aliyê generalan jî beramberî hikûmetê bihêztir dike. Şer zirareke mezin li pêşketina aborî ya Rojhilat û Başûr-rojhilatê Tirkiyê dike. Xuya ye weke welatekî ku gaza xwezayî û nift têre derbas bibe, Tirkiye girîngiyeke mezin dide pozîsyona xwe. Lê lûle divê ji deverên pirraniya şêniyên wan kurd re derbas bibin, ango eger şer dewam bike, ev lûle jî wê timî di xeterê de bin. Enqere ev demek e hewl dide têkiliyên xwe bi welatên li Başûr û Rojhilat re baş bike. Lê pirsgirêka kurd ya nehatî çareserkirin pêşiyê li vê jî digire. Heman tişt ji bo başkirina têkiliyên bi dewleta federe ya kurdan a (li Bakurê Îraqê) jî derbas dibe. Ev dewleta federe ji aliyê Amerîkayê ve bi awayekî taybet tê parastin û ji aliyê Tirkiyê ve gelek pere lê tên razandin. DYA jî ji ber planên xwe yên vekişîna ji Îraqê dixwaze pirsgirêka kurd hatibe çareserkirin, lewra pirsgirêk li aloziya heyî ya herêma kurdan a Îraqê, aloziyê zêde dike.

## Tevî sozên tên dayîn hemûyan pêleke zextan

Hema piştî hilbijartinên herêmî yên Adara 2009'an, ya têde DTP'ya kurdan gelek deng li yên xwe zêde kirin û partiya hikûmet AKP'ê jî gelek ji dengên xwe kêm kirin, ne bi tenê operasyonên leşkerî yên Fermandariya Giştî ya Artêşa Tirk li dijî gerîllayê kurd destpê kirin, di heman demê de nîşana destpêkirina zextên li dijê DTP'ê jî hat dayîn. Bêhtirî 400 endam û rêveberên wê hatin girtin.

Êrîşên li dijî DTP'ê gihiştin parlemanterên DTP'ê yên di parlemana Tirkiyê de jî.Rewş dema girtina parlemanterên kurd yên li dora Leyla Zana ya sala 1994'an, tîne bîra mirovan. Weke mînak, li Cîgirê Serokê Koma DTP'ê di parlemanê de Selahattin Demirtaş de ji ber axaftinekê doz hatiye vekirin. Di wê axaftina xwe de ew weha peyivî bû: "Li Tirkiyê divê êdî ne dayikên kurd, ne jî dayikên tirk biêşin. Herikîna xwînê divê were rawestandin, divê diyalog bi Öcalan re were kirin." Ev hemû, ne nîşaneyên amadebûna ji bo çareseriyeke pirsgirêka di navbera tirk û kurdan de ne û bi kêra bawerîdana hev jî nayên.

Bi ser de jî bûyerên din yên xeternak qewimîn. Weke komkujiya li dijî civateke kurdan a dawetê, ya ku cerdevanên dewletê jî tevlî bûbûn. Weke ku tîmên taybet ên tirk di roja cejna zarokan a Tirkiyê 23'ê Nîsana 2009'an de bi awayekî hovane li zarokên kurd xist, ên ku li nav erdekî vala ji xwe re dilîstin. Îro nêzî 3000 zarokên kurd bi bahaneya kevir avêtine polêsan, girtîne. Zarok niha di bin tehdîda cezayên zindanê re rûbirû ne. Pirgirêka kurd di heman demê de parçeyek ji şerê di navbera hikûmeta AKP'ê û artêşê de ye jî. Pirsgirêka di navbera herdûyan de carinan gihîşte qonaxên xeter. Rojnameya ''Tarafê'' di 12'ê Hezîrana 2009'an planeke veşartî ya Fermandariya Giştî weşand. Armanca vê planê bêîstîqrarkirina AKP'ê bû û sernavê wê jî "Plana çalakiyan ya li dijî paşverûtiyê (ya îslamî)" bû. Di nava planê de ev tişt hebûn: Bi dizî bicihkirina sîxuran, xirabkirina 'dijminên ji berê de' Ermenîstan û Yûnanîstanê da ku rastgir li Tirkiyê bi hêz bibin, vedîtina sîlehên berê hatin bicihkirin, kampanyayên dezînformasyonê û hwd. Gelo ev plana veşartî, êrîşek e ango bersiva kesên nêzî artêşê heta gelekî nezî leşkeriyê dayî doza li dijî darbeparêzên Ergenekonê (6) ye? Şerê di navbera hikûmet û artêşê de, paşeroja pirs- girêka di navbera tirk û kurdan de şîlo û nediyar dike.

## Tirs û li hev ewlenebûn heye

Yê ku di PKK'ê de herî zêde li pêş e, Murat Karayılan gelekî bi Tirkiyê ne ewle ye û tirsên wî hene. Di hevpeyvîneke bi Hasan Cemal, rojnamevane Milliyetê (hejmara 6'ê Gulana 2009'an) Karayılan pêvajoya salên 90'î weha tîne bîra xwe: "Sala 1993'an Özal (serokkomarê wê demê yê Tirkiyê A.B.) mir, û derfeta aştiyê wê demê ber bi bê ket. Özal kesek bû ku maneya pirsgirêka Kurd têgihiştibû û li çareserkirina pirsgirêkê difikirî, li ser dihizirî. Özal 1993'an (di bin şert û mercên gelekî gumanbir de A.B.) mir û sala 1994'an bi rastî jî kujer û hov bû. Gelo dîsa êrîşeke mîna ya sala 1994'an li pêşiya me ye? Em bi tiştinan dihisin, lê bi xwe newle ne. Gelo hikûmeta AKP'ê jî wê darê desthilatdariyê bide dest eskeriyê û ji nû ve wê weke hingî xwîn bibe gol?"

Di daxuyaniyeke Serokatiya Konseya Rêveber a Koma Civakên Kurdistanê KCK'ê ya 1'ê Îlona 2009'an de ev tirs û fikar bi awayekî zelaltir têne zimên: "Em bi helwestekê re rûbirû ne ku bi ti awayî bi kêr nayê, cihê siyaseta înkar û tinekirinê ya ku ji destpêka damezrandina komarê û vir ve li dijî me tê bikaranîn, bi gavên bawerî bi wan were, tirs û fikarên mafdar ên gel û tevgera me bêmane bikin, dagire. Beriya her tiştî divê dewleta tirk û hikûmet dev ji retorîka tesfiyekirinê û siyaseta şîddetê berdin."

Di daxuyaniyeke KCK'ê ya der barê nîqaşên di parlemanê de jî weha tê gotin: "Siyaseta ku di destpêkê de bi navê 'hewldana kurd' bi raya giştî hat danasîn, paşê bû 'hewldana demokratîk'; îro navê wê 'projeya yekîtiya netewî' ye û berpirsiyar wê weke 'tesfiyekirina gerîlla û PKK'ê' bi nav dikin. Çi hevdîtinên wezîrê karê navxweyî bi derdorên cihê re, çi têkiliyên dîplomatîk yên wezareta karê derve li herêmê û çi jî pêwendiyên serokwezîrê Tirkiyê bi DYA'yê re, ev hemû hewldan û kirinên ku armanca wan ne çareserkirina pirsgirêka kurd e, lê belê tesfiyekirina PKK'ê ye."

Ya rastî, tişta xuya dike ew e ku Enqere dixwaze PKK û gerîlla heta ji destê wê tê, ji pêvajoya çareserkirina pirsgirêka kurd der bike. Pêşniyarên berfereh yên serokê PKK'ê yê ku li girtîgeha Îmraliyê tê ragirtin, ji aliyê Enqerê ve heta niha ji raya giştî re nehatiye eşkerekirin. Ev rastî ji aliyê kurd ve, weke operasyonên leşkerî yên Enqerê yên misêwa û weke êrîşên dijwar tê şermezarkirin. Ji bo ku pêşiyê li xitimîna pêvajoyê veke, Öcalan bang kir ku sê komên aştiyê ji baregeha gerîlla ya Qendîlê, wargeha penaberan Mexmûrê ya li Başûrê Kurdistanê û ji Ewrûpayê biçin Tirkiyê. Ev kom bi beşdariya girseyeke ewqasî mezin û bi coş û kelecaneke ewqasî bi heybet hatin pêşwazîkirin ku Enqerê biryarê bide çûna Tirkiyê ya koma aştiyê ya Ewrûpayê bide paş (vê rewşê heta 18'ê Mijdara 2009'an dewam dikir).

Di nîqaşa nîvê Mijdarê ya li parlemana Tirkiyê de partiyên muxalefetê Partiya Komarxwaz ya Gel (CHP) û Partiya Tevgera Netewperest (MHP) bi awayekî dijwar êrîş birin ser partiya hikûmeta AKP'ê. Wan xwe disipart pêleke red û liberrabûnê ya di civaka Tirkiyê de ango civaka ku bi deh salan netewperest û kemalîst hatibû civakîkirin. Nîqaşa çareseriyeke pirsgirêka kurd diyar e dijminatiyên etnîk, yên demeke dirêj di şer û pirsgirêkê de ne xwedî rolekî girîng, sor dike. Timî ji nû ve tirs û fikara ku kurd dewle-

www.arsivakurd.org



*Rıza Topal, (Auf den Bergen) - Efekt LMD kurdî*

teke serbixwe dixwazin û ew cudaxwaz in, derdixin pêş. Ev îdîa ji aliyê kurd ve tê redkirin. Ya aliyê kurd der dixe pêş ew e ku ew dixwazin pirsgirêk di nava Tirkiyê de bi awayekî aştiyane û demokratîk çareser bibe. Nîqaşa heyî di navbera partiyên siyasî de her diçe dişibe xisletên hilbijartinên pêşde anî. Tevî ku hilbijartin wê di 2011'an de pêk werin. Ev yek mixabin li zelalkirin û çareserkirineke pirsgirêka kurd bi awayekî merdane, li gorî şert û mercan û bilez, dibe bar.

### Divê şer ji dest neteweperest û artêşperestên Tirkiyê were stendin

Niha û wisa xuya ye hê demeke dirêj nîqaş wê li ser 'awayê' çareserkirina pirsgirêka kurd werin kirin. Jixwe ji ber şerê dirêj ê dîrokî tevî bandorên xwe yên kûr ên siyasî, civakî-derûnî û îdeolojîk-neteweperestî yên li ser civakê û beriya her tiştî li ser komên pêşiyê dikişînin, bi awayekî din jî wê nebe. Dîsa jî eger saetê nedin paş, tehlûke heye ku "qolinc bên çiyê, lê çiya bi tenê mişkekî bizê." (7) Eger ev biqewime, hingî 'demeke giran' wê destpê bike ku wê bi-ke xizanî û xeddarî vejî. Ti kes nikare pêş bibîne, kîjan şert û mercên navnetewî wê bandorê li pêvajoya çareseriyê ya evqasî hewcedarî pê heye, bikin. Lew-ma, li gorî min hewldaneke mezin û aqlîselîm a aliyê kurd pêwîst e, da ku tevahiya rewşa pirsgirêkê ji binî ve biguhere. Ev yek ji Enqereyê nayê, bi tenê aliyê kurd dikare vê yekê bi ser bixe.

Divê ji destê neteweperest û artêşperestên tirk û Herweha dewletên endamê NATO'yê, yên ku heta niha xwe ji bo çareseriyekê qet neêşandî û xwe li pey îdîaya beredayî ya terorîzmê ya li dijî aliyê kurd veşartî, şer were stendin. Ev jî bi tenê eger aliyê kurd di warê pêşbîniyên fereh û hizirînên stratejîk de bide zanîn ku ew amade ye, dev ji şerê eskerî bi tevahî berde û sîlehên xwe di kontrola navnetewî de deyne. Ango wê dev ji her gefxwarina eskerî were berdan, lewra kî gefê bixwe û bêje "û tu ne amade yî, naxwe şîddet ji min re divê" (8) ew li mentiqê eskerî yê şer vedigere û vedigere vê rewşa heta niha evqasî trajîk.

Bi gaveke evqasî aqlîselîm, aliyê kurd wê hevgirtî fikra xwe ya heta niha gelek caran diyar kirî û fikra serokê wê Abdullah Öcalan, ango fikra dibêje pirsgirêka kurd bi tenê bi riyên siyasî, demokratîk û aştiyane wê çareser bibe, bişopîne. Bi vî awayî wê serencama sereke ya ji dax-

wazên xwe yên heta niha derbixe û di heman demê de wê rewşa heyî hemûyî serûbinî hev bike. Hingî wê armanc û navgînan dîsa li hev bikira.

Bi vî awayî wê rê li pêşiya siyaseteke nû ya lihevhatinê û şerê ji bo pêkanîna edaleta beramberî gelê kurd li Tirkiyê vebûya. Tevahiya civaka kurd – bi hêviya tevî wê gelek welatiyên bi eslê xwe tirk jî – dikarîbûn ji hezar aliyên civakê ve beşdarî van hewldanan bibin. Ji bo demokratîkbûyîna civaka Tirkiyê dibû ku gelek sedemên berfereh derketa holê û ev jî wê ji bo tevahiya civakê baş bûna. Îdîaya terorîzmê li dijî aliyê kurd êdî nedikarî bihata bilêvkirin.

Hemin, divê ti kes der barê zehmetî û demdirêjiya pêvajoyek û siyaseteke lihevkirinê ya bi vî rengî ya civaka sivîl û demokratîk de xwe nexapîne. Weke berê hêzên xurt hene ku dixwazin pêvajoyeke lihevkirinê asteng bikin. Ev ne bi tenê generalên tirk, ne bi tenê hêzên kevin ên neteweperst in ku di nava gelek sazî û dezgehên dewletê de hê jî xwedî roleke girîng in, Herweha komên bendperwer yên ji şîddetê re amade yên li her aliyî, ku bingeha rewabûna wan a taybet a heta niha êdî di tehlûkê de ye.

Ji bo ku mirov tevî provakasyonên gelekî xirab jî li ber xwe bide, rewşeke diyarker belê ewqasî jî sosret heye. DYA, hêza pêşeng a NATO'yê, ji ber sedemên ku bi vekişîna wê ya ji Îraqê ve girêdayî ne, dixwaze pirsgirêka kurd were çareserkirin. Ev sînoran datîne ber artêşa tirk û dewletên din yên endamê NATO'yê yên ku heta îro di warê siyaseta aştiyê de rolekî neerênî bi cih anîn. Ya ku heta niha kêm mayî mixabin destekeke eşkere bilêvkirî ya dewletên endamê Yekîtiya Ewrûpayê ji bo çareseriyeke aştiyane ye. Ji ber pirsgirêka mezin a di nava civakê de û ji ber helwesta nezelal a der barê endametiya Yekîtiya Ewrûpayê ya Tirkiyê de, ev dewlet nikarin fonksiyona navbênkariyê bigirin ser xwe. Ew dîsa jî dikarin cesaretê bidin û alîkariyeke mîna Plana Marshall ji bo rewşa bi dawî kirina şer û derxistina efûyeke berfereh, pêşniyar bikin. Wekî din, dikarin bibin xwedî helwesteke ku doza lihevkirinê li penaberên tirk û kurd ên li welatê xwe bikin.

## Berê siyaseteke lihevkirinê di esasê xwe de li paşerojê ye

Nabe ku ew di daxwazên hesabê gunehên berê kirî, yên Herdû aliyan de biteqine. Hingê wê her du alî jî bi rik gunehbariyan, neweyiyan û înkaran li ber hev bikin lod! Mirov berê xwe bide nîqaşên li ser qirkirina Ermeniyan! Zêdebûna dijminahiya heta ku bigihe kuştinê û dubendbûnê wê bibin encamên wê! Vê yekê pêşî li bawerî-bihevanînê û amadebûna ji hevkariyê re girt. Di rewşa heyî de dadgehên ji welatên din û bûyerên dîrokî yên ji deverên din nabin mînak.

Eger gavên ji bo çareseriyê piçûk û hêdî bên avêtin û ji berdêla siyaseteke lihevhatinê, lihevkirinên qelp werin kirin, ev ê jî bibin tehlûke. Li aliyê din aliyê kurd daxwazên xwe ewqasî zêde bike ku di civaka pirranî de ya ku ev sed sal in bi neteweperestiya tirkîtiyê hatiye civakîkirin, dîsa tirsa parçebûnê derkeve holê jî tehlûke ye; lewra hingî ew ê ne amade be diyalogê bike. Piştî vê rabihuriya şîddetbarkirî, jixwe guherandina şêwazê fikrê wê têra xwe zehmet be.

## Nabe ku deriyê li îhtîmala aştiyê vebûyî, dîsa were daran

Divê riyên bi serê xwe werin ceribandin û ev rê werin şopandin. Nîşaneyên sereke yên armancên wan divê ji nû ve bawerî-bihevanîn û beriya her tiştî bi hev re sazkirina edaletê bin. Divê ev yek di her asta civakê de ango ji gund, bajar, herêm heta bi tevahiya dewletê bi awayekî berfereh were ravekirin. Edalet çi ye? Eger mirov zêdebûna otorîteyê û kêmasiyên di demokrasiya Tirkiyê de li ber çavan bigire, gelek mijar û pirsên ku yekser bi pirsgirêka kurd ve ne eleqedar in jî wê werin nîqaşkirin û ev yek wê baş be! Bi vî awayî tevahiya civakê wê biketa nava diyalogeke li ser paşeroja xwe. Ev 'diyaloga mezin a civakî' neçar nîne ku li benda biryarên zehmet tên dayîn ên saziyên hikûmeta tirk bimînin. Ev diyalog dikare niha, di cih de destpê bike. Di girseyîbûna xwepêşandanên vê dawiyê de, ez nuqteyên destpêkê yên girîng dibînim ku dikarin ber bi vî aliyê min li jor behsa wê kirî de biberidin.

Di dawiyê de 'derî li îhtîmalan' vebû, li îhtîmalên bi awayê aştiyane bidawîkirina vî şerê xeddar û bêmane yê dewleta netewe ya tirk li dijî hemwelatiyên xwe yên kurd dimeşîne û xwe ji nav lepên siyaseta bi darê zorê asîmîlekirinê ya neteweperest xilas bike. Eger ev bi ser bikeve, ev ê ji bo tevahiya mirovên li Tirkiyê, çi tirk, çi kurd, çi ermenî û çi jî hindikahiyeke dînî bin, bibe dewlemendiyek.Ev ê bibûya rewşeke ku ji bo tevahiya Tirkiyê alî hemû bi ser bikevin, wê destûr bida ku Tirkiye tevahiya potensiyel û jêhatîbûna xwe bi pêş bixista û wê neçar nemaya ku xwe bi şerê birakujiyê yên li dora îdelojiyên kevinbûyî hêlak bikira.

Nabe ku 'deriyê li îhtîmala' aştiyê vebûyî, dîsa were daran û riya ber bi çareseriya pirsgirêka kurd ve bi salan were paşvexistin. Lewra di vê rewşê de divê tevahiya hêzên ku çareseriyeke aştiyane, sivîl û demokratîk dixwazin, pirsgirêkên xwe yên din deynin aliyekî û werin cem hev.

**Agahdarî der barê nivîskar de**

*Dr. Habil. Andreas Buro (1928 li Berlînê ji dayik bû). Profesorê xanenîşin yê beşa Zanistiya Siyasetê û Têkiliyên Navnetewî li Zanîngeha Johann Wolfgang Goethe ya Frankfurt/Mainê. Yek ji sazkerên tevger û kampanyaya 'meşa dema hêkesorkê' ya Alman a ji bo demokrasî û bêsîlehbûnê ye û demeke dirêj berdevkê komîteya wê ya 'Buroya Sosyalîst' û komîteya wê ya 'ji bo Mafên Bingehîn û Demokrasiyê' bû. Îro berdevk û koordînatorê komîteyên jêr ên siyaseta aştiyê ya Dialog-Kreisê ye: "Dem ji bo çareseriyeke siyasî ya pirsgirêka di navbera tirk û kurdan de hatiye" û "Projeya Çavdêriyê: Çareseriya Pirsgirêkan a Sivîl, Pêşîgirtina li Şîddet û Şer."*

**Werger ji almanî**
**Lokman Turgut**

---

(1) PKK li Almanya qedexekirî ye. Nivîskar bi dibêtiyeke mezin ji vê perspektîfê li PKKê dinêre *(jêrenota wergêr).*

(2) Nivîskar ji bo Başûrê Kurdistanê vê peyvê bi kar tîne *(jêrenota wergêr).*

(3) Bi Almanî: Monitoring-Projekts:Zivile Konfliktbearbeitung, Gewalt- und Kriegsprävention *(jêrenota wergêr).*

(4) Bi Almanî: Kooperation für den Frieden *(jêrenota wergêr)*

(5) Baregeha gerîllayên PKKê li Başûrê Kurdistanê.

(6) Ji niha ve hin ji wan payebilind gelek subayên artêşa tirk, ji ber ku gumana endametiya rêxistina li dijî qanûnan ji wan tê birin, weke guhenbar tên dadgehkirin. Di nav de generalên payeya wan gelekî bilind yên teqawît Hurşît Tolon û Şener Eruygur jî, dozger sûbayan bi rêvebirina rêxistineke terorîst gunehbar dike. Li gorî dozger armanca rêxistinê hilweşandina sîstema li gorî destûra bingehîn û hukûmetê ye. Doza pêşî ji Cotmeha 2008'an û vir ve li dijî 80 gunehbarên endametî û rêveberiya rêxistina Ergenekonê, dewam dike. Doza sêyemîn jî destêpêka Tebaxa îsal destpê kir. Sîlehên di sala 2007'an de hatin dîtin, rê li ber lêpirsîn û bi komî girtina genehbaran vekir.

(7) Wergera vê gotina pêşiyan bi Kurdî wê bibe navek giran, gundek wêran lê li gorî min wergera ji Almanî jî tê fêmkirin *(jêrenota wergêr).*

(8) Orjînala wê wisa ye: Und bist Du nicht willig, so brauch' ich Gewalt" (Goethe, Erlkönig) *(jêrenota wergêr)*.

## Rıza Topal Hulmanî

Di sala 1934'an de li Dêrsimê hat dinyayê. Di dema xwendina dibistana mamostatiyê de dest bi wênekariyê kir.

Di sala 1950'an de wenevaniya Ewrûpa naskir. Di salên pêşîn de di bin pêla ekola impresyonizm û Kubîzmê de ma. Ji sala 1957'an heta roja me bi wêjeya klasîk ya Ewrûpa û felsefeyê ve mijûl bû. Berhemên Henri Bergson, Goethe, Willhelm Busch, Oscar Wilde, Schiller û gelek nivîskar û şaîran wergerand kurdî.

Di sala 1967'an de dest bi xwendina Akademiya Hunerên Ciwan ya Munihê kir û xwendina xwe li wir kuta kir.

Ji sala 1973'an heta sala 2006'an dema xwe bi gerên hunerî derbaskir. Weneyên xwe li 26 welatên cîhanê ku geriya ye li firçê daye. Hinek ji wan welatan: Kürdistan, Komara Domînîk, Kuba, Kenya, Brezilya û Hîndistan e.

Li Ewrûpa û gelek welatên cîhanê tevlî bi dehan pêşengehan bûye.

Rıza Topal Hulmanî li peytexta Almanya li Berlinê dijî û li wir xebatên xwe yên hunerî didomîne.

## Deynê ku bûye qeder...

kesê ku biryara wan daye, lewre Ronald Reagan di sala 1984'an de bi xurtî careke din jî hate hilbijartin, digel ku di dema serokatîya wî ya yekem de deynên dewletê kiribûn sê qat. Lê belê mecbûrîyetên butçeyê pişta xelefên wî dişikîne, bi taybetî jî gava ku xelk wê yekê dixin stuyê wan û dibêjin ku ew ne ji hêla rast in... Hingê, ji bo ku bikare reforma sîstema tendurustîyê pêk bîne, Birêz Barack Obama mecbûr ma ku berî wê sozê bide ku ev reform dê tiştekî li deynên dewletê zêde neke. Ma gelo, ji bo macerayên leşkerî jî şert û mercên weha tên danîn?

Bi polîtîkaya xwe ya ku baca li ser restorant û qahweyan sê qatan kêm kir, hikumeta fransî 2.4 milyar euroyên çavkanîyên xwe kirin qurban. Çend hefte bi şûn de, bi mahneya "heqîyê", 150 milyon euroyên tazmînata qezayên kar ji qurbanîyên wan qezayan stendin. Digel ku di vî warî de gellek zîrek xuya dibe jî, ji bo ku xwe bigihîne Reagan'î, hê ji wê re heye. Lewre, serokê amerîkayê yê berê baca dewlemendan bi bêdengî li wan vedigerand, lê belê ji bo kêmkirina ziyana butçeyê (ku wî bi xwe ziyan dabûyê), rabû û ji kantînên dibistanan xwast ku gava ku hesabê xwarina ku didin şagirtan dikin, hesabê ketçapê jî weke yê fêkîyan bikin.

Li Kalîfornîyayê, li dewleta ku Reagan bû walîyê wê, di sala 1978'an de kontr-şoreşa bacî ku bi dû re dunya da ber xwe dest pê kir. Li wira, îroj qase bi temamî vala ne (deynê ku êdî bûye adet gihiştiye 26 milyar dolaran). Roja 19'ê çiriya paşîna bihurî, zanîngeha fermî heqê qeydan % 32 bilind kir. Berî wê jî, heman zanîngehê duhezar kes ji kar avêtibûn.

SERGE HALIMI

www.arsivakurdi.org

JI EDÎTORIYA

# Medya, pêşeroj, mirovahî û kurd

**Xwînerên hêja! Li ser navê edîtoriya û xebatkarên Le Monde dîplomatique kurdî we silav dikin. Em gelek şanaz in ku vê rojnama navnetewî bi zimanê kurdî digihînin destên we. Herwiha ji bo jiyandin û pêşvebirina Le Monde diplomatique kurdî, em ji we hêviya piştgiriyê û daxwaza abonetiyê dikin.**



*Illustration, LMD kurdî*

Mirovahî tevî rojgerena me ya kevn berbi nava dilê sedsala nûh ve dimeşe. Hevkarî têne tezekirin, berjewendî jihev dikevin, ref diyardibin. Hakimên cîhanê ji nûh ve şekil didin dinyayê.

Di sedsala derbasbûyî de em bûn şahidê têkçûna sîstemên ramyarî û dîktatorî. Di encama valahiya ku derket de, berjewendiyên aborî di jiyana ciwakî û dewletî de wek sîstemên nûh ê ramyariyê derketin holê. Edî li piyasa dîplomasî û siyasetê nirxên bilind ê mirovahiyê hijmarên panoyên borsaya ne, globalîzm wek hespên serxweş li hemû sînoran didin. Sînorên nû bêsînorî ye.

Li gor pêşveçûnan wê motora sedsala me û sedsalên li pêş me qudreta maddî ya netewan be.

Şêniya cîhanê bilez zêdetir dibe, lê çavkaniyên jiyanê yê rojgerena me jî bi heman lezî kêmtir dibin. Dewlemendên cîhanê dewlemendtir, xizan jî xizantir dibin. Însan ji bo ku ji refaha cîhanê zêdetir par bigrin an jî ji bo ku bijîn wê bikevin nav têkoşîneke xedartir. Wiha xuyaye ku wê ev têkoşîn ne nêzî rêbazên dadmendî û edaletê be.

Teoriya Maltûs a kêmkirina nifûsa cîhanê belkî careke din were bîra hin kesan. Kî kare bêjê, piştî ev gengeşiyên li ser çavkaniyên petrol û madenên stratejîk wê pêşeroja mirovahî û rojgerena me di sedsalên pêş de wek kehanetên hin fîlmên fantastîk nebe.

Li aliyekî dewletên xewdî qudreta atomîk yên wek Pakistan û Hindistan ku piraniya nifûsa wan alfabeyê nasnake, li aliyekî din karesata ekolojîk ku hawîrdorê û jiyana xwezayî tehdît dike û di van rojan de li lûtkeyên Danîmarkayê jê re li çareyekî tê gerîn, li aliyê din îtîfaqên pîroz ê wek DYA/Ewrûpa ku ji bo berjewendiyên xwe li Afxanîstan, Îraq û deverên din yên cîhanê diselimîne.

Helbet li pişt van hemû weneyan, li piştperda van hemû bûyer, 'dijminî û dostaniyan' de qudreta daringî û bidestxistin an jî kontrolkirina çavkaniyên dewlemendî û firsendên jeostratejîk û jeopolîtîk hene.

Hin netew û dewletên ku xwedî jeostratejiya bilind in -ku ev nirx ji alî xwezayê ve ji wan re hatiye bexşkirin-, wê ev awantaja xwe bikarbînin. An jî wê di bin barê van awantajan de bibetilin, wek kurdan... Bûyerên li Kurdistanê careke din pirsa bêbersîv tîne bîra mirov: Di nav ev teşqele û pozberiyên cîhan û mirovahiyê de kurd çiqas hesabên pêşeroja dûr dikin?

Pirsgirêka Kurdistanê wek tariya li ber zayinê di pêvajoya çareserkirinê de ketiya reştariyê. Rewşa kurdan ya sûbjektîf çi dibe bila bibe, herçiqas ew di rewşeke kambax de jî derbasdibin û bedelên giran dabin jî, şevtariya ku li ser welatê wan bariyaye, niha li ber zayinê ye. Çemê reş yê qedera Kurdistanê jî wek mînakên beriya xwe, ber bi dawiya serpêhatiya reş ve diherike.

Dengeyên nûh ê cîhanê, hêzên kurd yên netewî, rewşa welatê wan û ya heremê û îhtîmalên pêşketinên nûh ê sedsala me, ji kurdan re pêşerojeke nûh amade dike. Ger kurd xeletiyên întîxarî nekin, îşaretên vê pêvajoyê ji niha ve diyar bûne. Di demên pêş de li ser rê û rêgezên çareseriyê wê gelek tişt bên axaftin. Helbet alternatifên hemû pêşniyazan wê hebin. Dewletên serdest êdî li gor cîhana nû, li gor nîzama nû nikarin li ser kurdan hukum bajon. Ne dengeyên cîhanê, ne jî hêza kurdan destûr nade vê yekê. Lêbelê ji bo kurd û welatê wan ji forma kolonîbûna klasîk derkevin û nebin koloniyeke nû divê li gor rêbazan bilîzin. Divê neyê jibîrkirin, kurd çiqas bi adab û rêbazan ji bo demokrasiyê bixebitin wê çareseriya bi dilê wan jî ewqas bilez bide pêşiya wan.

Yek ji bingeha tevlîbûna pêvajoya global, medyayeke bibandor e. Li roja me medya êdî rola dîplomasî, nasandin, têkiliyên civakî û bandorên psîkolojîk yanê endezeriya civakî û global dilîze. Medya êdî li gor binavkirinên qirna borî ne ''quweta 5'em e'' belkî di gelek waran de quweta yekem heta ya bê rakîb e jî.

Medya kurd heta niha di bin siya siyaset û siyasiyan de mabû. Ev rewşa ku wek nexweşiyeke zarokatiyê bû, divê êdî ji laşê medya kurd derkeve. Asta rojnamevan û civaka kurd gihîştiye wê yekê ku êdî ew jî dikarin medyayeke netewî biafirînin û gav bavêjin nav cîhana medya navnetewî.

Herwiha desthilatdarên kurd jî divê êdî dev ji qirika rojnamegeriya kurd berdin da ku medya kurd bikaribe di geşbûna civakî û asta navdewletî de rola xwe bilîze.

Le Monde diplomatique yek ji van şansê kurda ye, ku medya wan bikaribe bibe xelekek ji zincîra global û di projeyên mezintir û serkeftîtir de rêya wan vala bike. Bi hêviya cîhaneke tijî aşîtî, wekhevî û demokrasî, bi hêviya saleke bextewar û tendurist…

FAYSAL DAĞLI
*Edîtore Le Monde diplomatique kurdî*

www.avestakurdi.org

# Îslam û çanda ciwanên li bajaran

SYNNØVE BENDIXSEN*



*Rıza Topal, (Bênav) - Efekt LMD kurdî*

Ciwanên ji malbatên penaber yên di nav civakên ewrûpî de parçeyek ji veguherîna civakî û çandî ne ku bi kirina muzîka hip hop, pêkanîna çeteyên ciwanan û di asta herêmî de bi tevlîbûna nav pêvajoya vejîna Îslamê, dide der. Ji bo ciwanên ji dê û bavên kurd û tirk ên piştî nîvê salên 1960'î weke *karkerên mêvan* (Gastarbeiter**) çûn Almanyayê, misilmantî bi tenê qadake muhtemel a nasnameyê ye (1). Mislimantî nasnameyek e ku ji aliyê çapemenî, dibistan û siyasetvanên Alman û carinan jî ji aliyê wê bavên ciwanan bi xwe ve tê nîqaşkirin. Lêkolînvanên civakî yên ku bi ciwanên misilman - ên ku ji wan re nifşê diduyan yan jî sisiyan (2) tê gotin – re mijûl dibin, pirrî caran mijarê weha rave dikin; ev ciwan nasnameyeke dînî ya ferdî bi maneya lawazbûna dewra otorîte- yê pêk tînin û ew ji Îslamê tişta herî zêde li gorî wan e dineqînin (3). Hin lêkolîner îdîaya taybetkirin yan jî ferdîkirina Îslamê tînin rojevê, ji vê û wêde ci-wan di gera xwe ya li bersivan de berê xwe didin otorîteyên nû yên dînî. Tevî ku, heke mirov li ber nifşê wê û bavên wan bigire, ciwan bi awayekî zelal û darî çav di guherîneke nasnameya misilmantiyê re derbas dibin jî, xebata min a lêkolîna li cihê cih ya li ser ciwanên wê û bavên wan kurd, tirk û misrî yên li Berlînê, digihêje wê encamê ku ciwan hê jî dîndariya xwe di nîqaşên komê de û di tefekkura dînî de bi cih dikin û di heman demê de çandeke dînî ya ciwanan diafirînin (4). Valahiya neqeba di navbera nifşan de divê ji nêzîktir ve were lêkolînkirin da ku em nasmameya misilmantiyê ya van ciwanan çêtir fêm bikin.

## Nifşekî nû yê misilmanan

Cihêtiyên navxweyî yên xwe îfadekirina dînî di navbera nifşê diduyan û sisiyan yê ciwanên misilman ên li Almanyayê de, mirov dikare bi gereke li kolana Oranienstrasse ya li Kreuzbergê darî çav bike. Kreuzberg taxeke serjimara wê gelek û ji mirovan himhimî ya Berlînê ye. Di koşeya xwaringeheke 'suşî' de dibe ku hûn rasta keçeke ji bîst salan ciwantir bên ku li gorî modeyê berê, herweha bi awayekî nefspiçûk cil û berg li xwe kirine û serê xwe jî bi awayekî lê were nixumandiye. Heman keçik li cem dayika xwe ye ku kirasekî dirêj ê li gorî xwenixumandina îslamî *-teseturê-* li xwe dike û serê xwe jî bi çefiyeke rengên qehweyî digire. Komek ciwanên jin di ber we re dibihurin, hinan jê tayt, cil û bergên seksî li xwe kirine, makyajeke zêde kirine û bi çefiyên beriqandî yên avorî yan jî kesk serê xwe girtine, yên din şalên jeans, sakoyên dirêj li xwe kirine û porên xwe yên reş û dirêj berdane. Cihêtiyên di pêkanîna dînî de û xwepêîfadekirinê nabe ku hema bi hêsanî, bi nîşanên madî yên ji derve yên weke sembolên cil û bergan werin tespîtkirin. Dîsa jî modeya cil û bergan nîşanek e ku mirov pê derdixe ka kî dixwaze nûneriya wan bike û kî xwe bi wan îfade dike.

Rewşa heyî weha ye; Li hemberî Îslama jêre dibêjin, li gorî 'çandê' yan jî 'rêûresmê' hûnayî ye, ya dê û bavan û li dijî ya jêre dibêjin 'xwe îfadekirina dînî ya sembolîk' a hevsalên xwe yên cil û bergên 'seksî' li xwe dikin, gelek ciwanên misilman ji malbatên kurd, tirk û herweha misrî li Îslameke 'xwerû' (5) yan jî 'objektîf' (6) digerin. Tevî guhertinên piçûk ên navxweyî di dawiya salên 1990'î de, ji berdêla girêdayî civaka îslamî ya cîhanê *-umetê-* be, pêkhatina rêxistinî ya pirraniya mizgeftan ji aliyê koka etnîk ve diyar dibû. Ev pêkhatin bi pêwendiyên netewî yan jî etnîkî girêdayî welatê cemeeta wan jê tê ye. Jineke, min pêre kar kir, Fatîma (31 salî) bi bîr tîne ku di nîvê salên 1990'î de dema ew ciwan bû, ew û hevalên wê li mizgeftan aciz dibûn, û gelek ji wan bi tenê ji bo ku dilê wê û bavên xwe xweş bikin diçûn mizgeftan. Dersên dînî bi zimanê wê û bavê wan dihatin dayîn, lê belê ciwanan hemûyan bi vî zimanî baş nizanîbû. Bersivên *îma-mê**** ji derve hatî anîn jî, li rewşa Almanyayê nedihat. Fatîma û ciwanên din ên ku di qada dînî de çalak, tirsiyan ku ev yek bandoreke neerênî li dîndariya ferdî ya nifşê wan bi xwe bike. Ew hiseke xwe tîne ziman ku perwerdeya dînî di nava saziya malbatê de bi bin ketiye û li gorî wê sedema vê jî hinekî ew bû ku nifşê hatî Almanyayê nifşê 'Atatürk' bû ku li Tirkiyê 'di warê dînî de bi awayekî tekûz nehatibû perwerdekirin.' Li gorî fikra wê, nifşê kaltir ne xwediyê jêhatîbûna pedagojîk e, lewra ew nehatine perwerdekirin û meyila wan a tevlîhevkirina dîn û rêûresmên kevneşopî yên ji gundên wan heye.

## Otorîteyên nû yên dînî

Komên nû yên dîndar, yên mîna *Muslimische Jugend Deutschland* (Ciwanên Misilman ên Almanyayê) yên ku di nava gelek civakên ewrûpî de hene, ji aliyê ciwanên li Ewrûpayê perwerdebûyî ve hatine damezrandin û nûneriya qadên civakî dikin ya ku girêdana etnîk û netewî têde wenda dibe û şûna wê nasnameyeke 'gerdûnî' ya misilmantiyê digire. Îslama di qadên bi vî rengî

** Li Ecole des Haute Etudes en Sciences Sociales û di beşa antropolojiya civakî ya zanîngeha Humboldtê de xwendekara doktorayê ye. Li Zanîngeha Kurdistanê ya li Hewlêrê dersên civaknasiyê dan (2008-2009) û berê li ser mijarên penaberiyê li UNESCO'yê şewirmend bû.*

www.arsivakurd.org

de ciwan didin dûv, gelek caran Îslameke 'xwerû' yan jî 'rast' e; ev kar jî bi riya bikaranîna pirtûkan tê kirin. Di nava van de pirtûka pîroz Quran û herweha sinet (rêbaz û şêwazê jiyanê yê ku ji aliyê pêxember ve hîmê wê hatî danîn) jî hene.

Fîgurên nû (û kaltir) yên otorîteyê, yên weke navdarê televizyonê yê misrî Amr Xalid, ulemayê li Qetarê yê gelekî li ser nîqaş tên kirin Yûsif el-Qeredawî û fikirkarê swîsrî yê li ser tê nîqaşkirin Tariq Remezan, di ser televizyona kabloyî, tevna înternetê û komên nîqaşê re ciwan digihêjin wan (7). Ew bi taybetî berê axaftinên xwe didin ciwanên ku li jiyanke gelemper a dîndar digerin û di heman demê de naxwazin dev ji 'modernîteya' xwe û 'ciwantiya' xwe berdin. Navdarên muzîka popê, stranbêjên hîphopê û fîgurên ciwan yên mîna hosteyê hunandina malperên li ser tevna înternetê Elî Ardekanî (weke 'Babe Elî' navdar e) yê ku şowên bi yek mirovî di ser bloga xwe ya dîmenan a li ser YouTube a bi navê 'Ummah films' nîşan dide û Yûsif Îslam (berê navê wî Cat Stevens bû) bandorê li têgihana ciwanan a li ser Îslamê dikin (8). Ev fîgur gelek caran mijara 'sergirtinê' dixine nav mijarên sereke yên stranên xwe, bernameyên xwe yên televizyonê û semînerên xwe yên li raya giştî vekirî. Di straneke Samî Yûsif de piştî gotina 'Free (Azad)', ku behsa jinên sergirtî dike, ev gotin tên: "So don't you see? (Ma tu nabînî)/ That I'm truly free (ku ez bi rastî azad im)/ This piece of scarf on me (ev parçe çarika li ser sere min)/ I wear so proudly (ez wê vê çêndê bi serfirazî li sere xwe dikim)/ To preserve my dignity (da ku ez rûmeta xwe biparêzim)…." Gotinên straneke din a di nav ciwanên misilman ên li Almanyayê de tê hezkirin a bi navê Xwîşka delal (Liebe Schwester) ya hîphopvanê Alman ê misilmanbûyî Ammar 114 ku di malbata wî de kesên ji Hebeşîstanê jî hene, weha ne: "Dev jê (ji sergirtinê) bernede. Buhişt li pêşiya lingê te ye." Hîphopvanê ku gotinên stranên xwe bi xwe dinivîse, cesaretê dide jinan da ku li dijî pirsgirêkên ew ê ji ber sergirtinê di nava civaka Alman de bi wan re rûbirû bimînin, li ber xwe bidin, lewra di jiyana axretî de wê werin xelatkirin. Hêja ye mirov li ber civakê rabe (lewra, formên vê yên siyasî jî hene), ji ber ku di dawiya têkoşînê de wê buhişt hebe. Stran her wiha têkoşîna (dînî ya) ferdî ya jinên serê xwe dinixumînin jî weke parçeyekî ji berxwedana têde jinên sergirtî 'hemû' cihê xwe digirin, derdixe pêş. Tevî ku siyasetvan û rojnamevan gelek caran sergirtinê weke ji aliyê malbata bavik ve tê ferzkirin, dibînin û lêkolîner jî niha meyila wan ew e ku bêjin, sergirtin tercîheke ferdî ye jî, li gorî min tevî ku gelek jin bi îradeya xwe biryara nixumandina serê xwe didin jî, ev biryar yan jî tercîh bi awayekî xurt di bin bandora pêkhatina civaka, otorîteyên dînî û rol-modelên wan de ne. Di nava van otorîte û rol-modelan de hunermendên îslamî yên li jor navbihurî jî hene. Bi hev re, yan jî bi serê xwe guhdarîkirina stranên bi vî rengî, dike ku jineke sergirtî weke ferd xwe bi jinên din ên sergirtî îfade bike, yên ku bûyerên (civakî û dînî) yên mîna yên wê, di ser wan re bihurîne. Ev yek hisa civakbûnê xurttir dike. Bi awayekî zelal sergirtin sembolek yan jî nîşanek e û di roniya rewşa civakî-siyasî de bû parçeyek ji danûstendin û ragihandina kolektîfbûn yan jî nasnameya kolektîf.

## Çanda ciwanan a dînî

Mode bi awayekî giştî mijareke ciwanan eleqedar dike ye û ciwanên misilman jî di vî warî de ne îstîsna ne. Bi tenê çendek ji wan xwe bi dikanên cil û bergan ên misilman ên 'kurd', 'tirk' yan jî 'ereb' ên li Berlînê yan jî dikanên li ser tevna înternetê yên mîna 'Takbir Fashion Clothes', sînordar dikin. Ji berdêla wê gelek jinên ciwan dikana zincîr a navdar a Swêdî Hennes & Mauritz bi kar tînin, cil û bergên wê dikanê erzan in, li gorî ciwanan û modê ne. Keçên misilman bedenekê ji bejna xwe mezintir dibijêrin û bi vî awayî xwe ji qutik û kirasên ku mumkin e'zêde teng' xuya bikin jî dûr digirin. Û hemin, dema mirov kirasekî heta bi kabokan dirêj yê li gorî rengên modeya demsalê, bi ser de li xwe bike, mirov dikare şalên jeans jî bide 'qebûlkirin'. Şortên mildirêj bi qutikên bêmil ve weke bedil li dikanên misilmanan tên firotin. Cihê ku xwe disipêrinê sitîlên Alman (ewrûpî) û yên îslamî bi hev re ne, ku ji televizyonên kabloyî yan jî tevna înternetê girtine. Di vê pêvajoyê de ev ciwan sîstemeke modeyê ya alternatîf diafirînin, ku hem ji bazara girseyî ya modeyên rojava û hem jî ji modeyên misilman yên ji deverên din ên cîhana îslamî tê.

Sitîlên ciwanan parçeyek ji berxwuriya dînî ye ku nasnameya wan a dînî û di heman demê de jî nasnameya wan, ciwanbûn û bajarîbûnê jî xurttir dike. Ciwan bawer dikin ku kalîteya estetîk ya tiştên 'îslamî' dikare bi ya 'modern' re were lihevanîn û bi vî awayî bibe li gorî modeyê. Bi modeya ku jêre tê gotin 'li gorî Îslamê rast e' ciwan hem dikarin rûmeta xwe ya exlaqî biparêzin û hem jî wêneyekî xwe bi xwe yê 'modern' biafirînin.

Ciwan estetîkê bi exlaqê dînî re li hev tînin – di vê pêvajoyê de ew formekî taybet ê sitîla ciwanan diafirînin. Ev ciwanên misilman ne weke pirraniya (jêre) çandên ciwanan e. Ev ciwan didin dûv hin îdeal û pîvanên ji nîqaşa dînî tên ya ku rewşa wan a weke ciwanên misilman marjînal, derdixe holê. Rê û rêbazên berxwuriya wan a ji bo ku ciwantiya xwe bijîn, timî û dewamî di nava têgihiştineke rêzik û pîvanan de ye û Îslam van rêzik û pîvanan diyar dike. Berevajî pirraniya çandên ciwanan, di nava otoriteyên nirxan ên vê çanda ciwanan de ji bilî otorîteyên nûtir yên ciwan û 'modern' yên weke Tariq Ramadan, referansên ji derve yên weke rûspiyan (kalên dinyadîtî û zane) yên weke îmaman jî hene – û hemin çavkaniyên dînî yên mîna Quranê jî hene. Bi riya bihêzkirina girêdanên xeyalî yên di navbera mirovên xwedî dewr ên îslamî de li seranserê dinyayê, dibe ku berxwuriya transnasyonal (di gelek netewan re) a îslamî ne bi tenê vîzyona ummeteke gerdûnî xurt bike. Tecrûbeya hisa endametiya ummeteke ku weke gerdûnî tê fikirîn, destêpêka xwe-dîtina weke parçeyekî hêzeke mezintir û xurttir e jî. Û xwe îfadekirina bi civateke bi vî rengî, dikare bibe riyeke çêkirina wêneyekî xwe bi xwe yê erênî di nava civakeke ku Îslamê bi awayekî neerênî dinirxîne. Di heman demê de lêgerîna li jiyana Îslameke 'gerdûnî' di pratîkê de pêk tê, lewma pêdiviya ciwanan pê heye ku rênan peyde bikin da ku di civaka di navê de ne Îslamê bijîn.

## Nûneriya Îslamê

Perwerdebûna di Îslamê de û xwedanederê, ev ciwan di afirandina 'misilmanê baş' de weke esasî dinirxînin. Ji bo başkirina îmaja Îslamê û misilmanan li nav civakên Ewrûpayê, di raya giştî de nîşandana 'misilmanê baş' pêwîst tê dîtin. Bi taybetî jî sergirtin bû nîşaneke 'jina misilman' û ciwanên sergirtî jî di raya giştî de weke ku 'nûneriya îslamê' bikin, hem ji aliyê misilmanan û hem jî ji yê ne misilman ve tê qebûlkirin. Encameke ku nehatî plankirin a vê rewşê zexta civakê ya li ser rabûnûrûniştina wan a di nava civakê de ye. Ciwan vediguherin aktorên civakî yên xwe bi xwe kontrol û eyar dikin – bi maneya ku gelek ji wan bi şêla xwe, bi cil û berg û rengên li xwe dikin, li xwe bi xwe vedigerin – weke li xwenekirina cil û bergên reş ji bo ku weke dîndarên hişk û fûndamentalîst neyên dîtin. Bi ser vê de jî, ciwan gelek caran li ser diponijin, ka ji derve dîtina wan 'li gorî îslamê rast e' yan na û hewl didin bi riya tevger û rabûnûrûniştina xwe ya di nava civakê de bi awayekî erênî fikra pirraniya raya giştî ya Almanyayê der barê Îslamê de biguherin. Ji vê û wê de, gelek ciwanên ez bi wan re xebitîm, bi awayekî neerênî behsa keçên sergirtî kirin yên ku cil û bergên 'seksî' li xwe dikin, di nav civakê de cixareyê dikişînin yan jî bi 'kurikên nebaş' re digerin. Ev nîşandana 'çewt' a van jinên misilmanan ji aliyê hinan ve bi vî awayî hat nirxandin: "felakete ji bo me!" Ciwan nêrîna xwe weha diparêzin; der barê fikra 'jineke sergirtî ya misilman çi ye' û 'çi parçeyekî vê sergirtîbûnê ye', ev jinên ku 'nerast' sergirtî ne, nîşanên çewt û şaş didin derve, ango didin hem misilmanan, hem jî ne misilmanan.

Weke encameke giştî, ciwan ne bi awayekî ji xwe re lêhato bersivê didin nîqaş û agahdariyên dînî û ne jî mexdûrên pasîf ê bêdoktrînhiştinê ne. Dîsa jî di lîstik yan jî têkoşîna ciddî ya li ser manedaneke erênî ya misilmanbûnê de û girêdana di navbera sergirtin û misilmana 'rast' de ku otorîteyên dînî datînin, jinên ciwan di tehlûkeyê de ne ku bibin piyonên lîstika kişikê.

**Werger ji îngilîzî**
**Lokman Turgut**

---

** Ev gotina ku di destpêkê de li karkerên ji welatên din yên li Almanyayê bi cih bûn hatî kirin, îro gelekî tê nîqaşkirin û bi ti awayî ne peyvek e ku ji aliyê her kesî ve tê qebûlkirin (jêrenota wergêr).

*** Li vir ez peyva îmam bi kar tînim, lewra ez bi vî awayî kadroyên dewletê û meleyên ku ji medreseyên kurdî îcaze stendine, ji hev bikim (jêrenota wergêr).

(1) Zehmet e mirov hejmara kurdên li Almanyayê dijîn texmîn bike. Lewra li gorî prosedûra fermî ya li Almanyayê li koka etnîk nayê pirsîn, bi tenê li netewe (dewleta mirov welatiyên wê) tê pirsîn, statîstîkên fermî der barê kurdên li Almanyayê de nînin – bi tenê texmîn hene. Rêjeya ji çar paran yekê nêzî du milyon penaberên ji Tirkiyeyê yên di salên nîvê 1990'î de li Almanyayê dijîn, kurd in yan jî 500 000'ê wan kurd in, ji aliyê gelek lêkolînvanan ve tê bikar tînin. Hejmara kurdên ji Îran û İraqê yên ku ji salên 1990'î ve li Almanyayê dijîn jî li vê zêde dibe. (Faist, Thomas 2000. *The Volume and Dynamics of International Migration and Transnational Social Spaces* (Hecm û dînamîkên koçberiya navneteweyî û qadên civakî yên transnasyonal), Oxford: Oxford University Press).

(2) Têgîna 'nifşê diduyan' têra xwe tê nîqaşkirin. Dîsa jî ev têgîn, ji bo bi navkirina nifşekî xwediyê heman xisletên biyografîk, weke yên ku dê û bavên wan li derveyî welatê lê ji dayik bûyîn, peyveke sîwan a kêrhatî ye.

(3) Weke mînak binêre li Roy, Oliver 2004. *Globalized Islam* (Îslama gerdûnîbûyî). Weşanên Colombia University Press. New York; Cesari, Jocelyne 2000. La querelle des anciens et des modernes: le discours islamique en France (Qayîşkişandina kevneperest û modern: Li Franseyê nîqaşên îslamîk), in Dassetto, F. (edîtor), *Paroles d'Islam: Individus, sociétés et discours dans l'islam européen contemporain* (Gotinên ji Îslamê: ferd, civak û nîqaşên di nava Îslama ewrûpî ya hevdem de), Paris: Maisonneuve-Larose, rûpel 87 – 100 û Cesari, Jocelyne 2003. Muslim Minorities in Europe: the Silent Revolution (Hindikahiyên misilman li Ewrûpayê: Şoreşa bêdeng) , in Esposito, J. û Burgat, F. (edîtor.), *Modernizing Islam: Religion in the Public Sphere in the Middle East and in Europe* (Modernkirina Îslamê: Li Rojhilata Naverast û Ewrûpayê di nava qada gelemperiyê de dîn), New Jersey: Weşanên Rutgers University Press, rûpel 251 – 261.

(4) Li ser jinên ciwan ên endamê rêxistineke dîndar a ciwanan ya bi navê Ciwanên Misilman ên Almanyayê, di çarçoveya xebata min a doktorayê de ya li ser antropolojiya civakî, min xebateke lêkolînê ya demdirêj (18 mehan kişand) li cihê cih kir. Dê û bavên ciwanan (temenê wan ji 13salan heta bi 30 salan bû) ji Misir, Tirkiye û Filistînê bûn, ev yek 'qadeke pirrçandî' diafirîne, rêxistina dînî a ciwanan jî vê pirsê derdixe pêş; weke misilman miorv çawa di civaka Almanyayê û bi zimanê Almanî bijî. Awusturya, Fransa, Îtalya, Norwêc û Swêd jî di nav de rêxistina ciwanên misilman a ji bo ciwanên misilman, li gelek welatên Ewrûpayê heye. Di kare xwe yê doktorayê de ez hewl didim fêm bikim, çawa nasnameyeke dînî ya taybet pêk tê. Dema min ev kir jî min berê xwe da nîqaşên îslamî yên di nava qada dînî de tên hînkirin.

(5) Roy, Oliver 2004. *Globalized Islam* (Îslama gerdûnî bûyî). Weşanên Colombia University Press. New York.

(6) Eick Alman, Dale F. 1992. Mass Higher Education and the Religious Imagination in Contemporary Arab Societies (Perwerdeya bilind a girseyî û hêza xeyalê ya dînî ya civakên îro yên ereb). In: *American Ethnologist* (Etnologê emerîkî), berga 19'an, hejmara 4'an, rûpel 643-655.

(7) Tariq Remezan, neviyê damezrînerê rêxistina Birayên Misilman, di Nîsana 2006'an de ji aliyê Time Magazine ve weke yek ji sed mirovên herî bi hêz û xwedî bandor ên cîhanê hat nîşandan û weke fikirkarê pêşeng di nava nifşê diduyan û sisiyan ên misilmanên koçberî Ewrûpayê bûyî, da nasîn. Yûsif el-Qeredawî weke yek ji întellektuelên sereke yê Vejîna Îslamî ya niha tê dîtin.

(8) Otorîteya Elî Ardekanî xwe disipêre jêhatîbûan wî ya bi awayekî zelal ragihandina gelek pirsgirêkên hemdem û mijarên divê bi lezgînî mirov bi wan re mijûl bibin e ku di jiyana rojane de tên serê ciwanan. Dema vê dike jî valahiya neqeba di navbera nifşan de û têkirliyên bi ne-misilmanan re derdixe pêş. Di peyamên xwe û nîqaşên xwe de 'rêûresmê' û 'Îslama rast' ji hev dike û kesên ku xîtabî wan dike jî bi taybetî ciwanên li welatên ne-misilman in. Ciwanên li Berlînê hez ji dîmenên wî yên li ser YouTubeyê dikin, bi vî awayî ew dibin parçeyeke ji tevgereke dînî ya ciwanan a ji ya li Berlînê berferehtir, ev jî çandeke transnasyonal a dînî ya ciwanan e. Binêre li youtube.com/ummahfilms.

www.arsivakurd.org

HAVÎRDOR

# Du astengên li ser rêya Kopenhagê

RICCARDO PETRELLA*




*(www.camp09.dk)*

Ew ê bibûya dewama Protokola Kyotoyê, lê belê giringtirîn alava bi armanca têkoşîna li dijî guherîna germahiyê, "Peymana Kopenhagê", wê pêk neyê. (1) Hê gava ku hevdîtinên dawîn (2) ji bo amadekariya vê civîna ji 7 heta 18 çileya pêşîn pêk dihatin, dawiya wê jî hatibû fahmkirin. Senatoya Amerîkayê qanûna li ser av û hewayê di dema xwe de qebûl nekir, Konseya Ewrûpî ya li ser vê mijarê jî ku di 30 û 31'ê çiriya pêşîn de li dar ket, encamên tevlihev diyar kirin û daxuyaniyên piştî civîna G2 ya 16 û 17'ê çiriya paşîn di navbera Çînê û Amerîkayê de pêk hat jî derba dawîn lê xist. Serokên van herdû dewletên ku cîhanê herî zêde gemarî dikin li hev kir ku ji bo biserketina konferansê bixebitin û da zanîn ku ew hêvî dikin ku konferans biryarên xwe di cih de pêk bîne; lê belê wan negot bê ew ê vê yekê çawa bidin bicihanîn. Bê guman, di derheqê "peymaneke" weha de ku wan mecbûr bike, em ê nikaribin heta... 2012'an jî bipeyivin.

Rewşeke ewqasî ji derveyî aqilan pêk hatiye ku fikra li ser "qeyrana gerdûnî" ya wargehê êdî zorê dide ser kesên herî serhişk jî. Û piştgirên ji bo daxwaza kêmkirin, an jî, bi dû re, jiholêrakirina Herdû astengiyên sereke jî tucarî ewqasî pirr nebûbûn. Herdû astengî ew in ku cîhan bûye alaveke bazirganiyê û Amerîka jî bi awayekî "dîrokî" tucarî tev li peymanên navnetewî nabe, lewre azadiya wan û berjewendiyên wan pê kêm dibe.

** Profesorê ekolojiya mirovane, Akademiya Mîmariyê, USI, Mendrisio (Swîsre) û profesorê berê globalîzasyonê li Zanîngeha Katolîk ya Louveain'ê (Belçîka)*

Birêvebirên cîhanê pirsgirêka li ser siberoja mirovahiyê daxistin pirsgirêka birêvebirina "erzan û bikêrhatî" ya çavkaniyên xwezayî, nemaze yên enerjetîk. Wan diyarkirina vê birêvebiriyê û bicihkirina wê jî teslîmî mekanîzmayên bazarê kiriye. Awayê birêvebiriyê jî li ser cîhaneke weha bû ku bi reqabeta berjewendiyên bazirganan ava bibe û di nava wê de, yê xurt tim bi ser bikeve. Hingê, ji wê û bi şûn de, ne mimkun e ku ji bo peymaneke rasteqîn, polîtîk û cîhanî ya li ser siberoja mirovahiyê û jiyana li ser dinyayê li hev were kirin.

Enerjî û bazar di navenda bazarên wan yên niha de ne – hingî weha bûye ku mirov dibêje qey mijarên din bi tenê detay in û di dereceya duyem de ne. Protokola Kyoto (1997) bû destpêk ku bazarên li ser av û hewayê ji aliyê enerjî û bazarîkirina hewayê êdî ji adetê derkeve. Hemû pirs li dora dabeşkirina cîhanê digerre ku ji bo her welatekî "mafê kotayê, mafê gaza ku berra hewayê" dide û di encama wê de jî, "bazara berdana gazê" pêk tê. (3) Gelo gaza ku berra hewayê didin bi rastî jî bi mekanîzmayeke weha hatiye kêmkirin an ne, ew jî cihê nîqaşeke din e.

Di vê rewşa niha de, siberoja mirovahiyê û rizgariya wê ya ji bindestiya enerjiya fosîl di destê "bazirganên gazên xerab de ye" (bi taybetî $CO^2$). Hingê, munaqaşeyên wan û nemaze jî cudabendiyên wan bêtir li ser wê ye ka her welatek wê çiqasî gaza ku berdide kêm bike, ka buhayê wê yê bazirganî wê çiqas be û wê ji bo aboriya "netewî" çiqas giran be, ji ber ku bi vî awayî sektorên netewî û "şampiyonên wan yên netewî" êdî mecbûr dimînin ku bikevin reqabeta navnetewî. Texmînên li ser van pirsan bandorê li rewşa polîk jî dike. Jê xerabtir: Helwêsta polîtîk ku divê ji aliyê desthilatdariyên wan welatan ve bê avakirin, di eslê xwe de ji aliyê komên mezin yên aborî, bazirganî û endustriyel ve tê amadekirin.

Ji ber ku av û hewa jî ketin bazarê, êdî pêdivî bi dezgeheke din jî çêbû ku bi du milan bixebite. Ji hêlekê ve Peymana Binhegîn ya Netewên Yekgirtî bo Guherînên Germahiyê û Protokola Kyoto, ji hêla din ve jî Banqeya Cîhanî.

Dewletên ku tev li mijarê dibin, bi tenê hewl didin ku ev mekanîzma baş bixebitin û promosyona wan dikin û pereyan jî dixinê, û bi vî awayî pereyê şîrketên taybetî jî dikeviyê, lewre prensîba hevgirtina di navbera civatî û taybetî de vê yekê pêwîst dike. Guherîna weha ya di biryarên polîtîk de pirsgirêkên giring wê di warê birêvebiriyeke baş ya çavkaniyên xwezayî de derxe û tew em behsa etîkê û hiqûqa civakî û demokrasiyê jî nakin...

Hertişt – di serî de têkçûyin û hilweşîna fînansê – nîşan dide ku stratejiya "market first" (berî hertiştî bazar) têk çûye. Ji bo ku fermana "life first" (berî hertiştî jiyan) bikeve şûna vê fermanê û mirov nikare hêvî bike ku li Kopenhagê Peymaneke cîhanî derkeve û bernameyeke wê ya çalakiyan hebe, du tedbîrên pêşîn pêwîst in. Ya yekem ew e ku zagonên mafê telîfê ji nû ve bêne diyarkirin, bi taybetî jî yên li ser jîndaran. Heta ku jîndar (ji bo hêsankirina analîzê, em ê enerjiya veguherînbar jî tev lê bikinê) bikare bibe malê şexsî, mirov nikare hêvî bike ku lihevkirineke cîhanî ya li ser guherîna germahiyê pêk were.

Gelo çima Çîn, Hindistan, Brezîlya û welatên Afrîka, heger bixwazin awayê xwe yê pêkanîn û bikaranînê, bi armanca kêmkirina berdana gazê, biguherînin, mecbûr in ku heqê wê bidin welatên bakurî? Lewre, temamê mafên telîfê yên di vî warî de di destê welatên bakurî de ye. Ma ew ê çawa fînasekirina "mezinbûna kesk" ya Bakur qebûl bikin? Em nabêjin bila zanîn û teknolojiyê belaş bidin seranserê cîhanê, em dibêjin bila ew zagonên heyî ku rêyê li ber hevkariyeke navnetewî ya rasteqîn digirin, bêne guhertin. Buhayê bidestxistina armancên ku jê re dibêjin "nermkirin" (bilindkirina germahiya atmosferê) û "adaptekirin" (li gora germahiya gerdûnî) ev e.

Tedbîra duyem jî ew e ku sîstema fînansî ku li derdora "bazara karbonê" (4) ava bûye bê guhertin û "planeke cîhanî ya fînansî û civakî" bikeve şûna wê. Heta ku desthilatdariya li ser biryarên polîtîk di destê bazarê de be, têkoşîna li dijî germahiya gerdûnê wê yekalî, bêkêr û li xisarê be. Birêvebirên cîhanê, heger bixwazin, dikarin berê çavkaniyên mezin biguherin – 8000 milyar euro – heta niha dane sermayeya taybetî, ji bo "rizgarkirina kapîtalîzmê" ya ji vê felaketa ku wê bi xwe dinya xistiye navê. Li gora texmînên dawîn, deh salan, salê 66.7 milyar euro (bi giştî dike 667 milyar euro) dikare bike ku têkoşîna li dijî germahiya gerdûnê bigihije armanca xwe. Ev pêre ji wî pereyê ku ji bo alîkariya banqe û sermayeyên taybetî dane ser hev duwanzdeh caran kêmtir e; li seranserê cîhanê ji mesrefên leşkerî yên salane kêmtir e (998 milyar euro, sala 2008'an); û bi tenê du qatê mesrefa reklaman ya li seranserê cîhanê ye (363 milyar euro, sala 2007'an)! Tenê bes e ku mirov bixwaze...

Lê ev "tenê bes e ku" bi helwêsta Waşîngtonê ve li binguhê dîwaran dikeve û nagihije tu deran: Digel ku sed û heyştê û çar welatan Protokola Kyotoyê îmze kiriye jî Amerîkayê hê jî

www.arsivakurdi.org



*Protestoya xazayê xera nekin! (Greenpeace) - Efekt LMD kurdî*

îmze nekiriye. Em ji vira digîjin astengiya mezin ya duyem. Heger bixwaze jî (ev ne bi temamî eşkere be jî), Amerîka wê nikaribe li Kopenhagê piştgiriya helwêstên aqilane û erênî bigire ku vê yekê wê bikiraya ku welatên mezin yên din jî – Yekîtiya Ewrûpa (YE), BRHÇ (Brezîlya, Rûsya, Hîndistan, Çîn), Japonya… – xwe bidaya ber û bi kêmanî sozên ku li Kyotoyê hatine dayin dewam bikin.

Ev ne cara yekem e ku Dewletên Yekgirtî yên Amerîkayê li ser navê "mezinbûna" modela xwe ya civakî û "ewlekariya" welatê xwe (ku tim weke "ewlekariya cîhanî" fahm dikin), polîtîkaya xwe ya yekalî bi rê ve dibin û nahêlin ku kesek li ser tercîhên wan yên polîtîk û awayê wan yê jiyînê bi wan re bazarê bike. Wan bi vî awayî rê li ber vekir ku dezgeh û derfetên eyara "polîtîk" ku di navbera pirrhêliya navhikumetî de hatibû avakirin qels bibin û hetta bi temamî ji holê rabin. Tercîha wan soft law e, bi taybetî jî ew e ku herkes xwe bi xwe eyar bike û her dewlet ji xwe berpirsiyar be. Mînaka herî berbiçav û zelal ya di vî warî de wê hevoka navdar ya George Bush'ê bav e ku digot – "awayê jiyana Amerîkiyan ne mijara bazaran e" û armanca wî jî ew bû ku nîşan bide bê çima tev li civîna Rio de Janeiro ya 1992'an nebûye ku li pêşketin û wargehê hatibû kirin.

Astengkirina Kopenhagê jî li ser heman xettê ye. De facto "America first" ji bo niha li gora "market first"ê dibe astengeke mezintir. Ji ber wê jî, dewletên ku amade ne ku nîqaşan ji bazirganîbûnê û netewîbûnê derxin, êdî kêmtir dibin.

Dîsa jî, ji bo ku ev asteng ji holê bên rakirin rê tê de heye. Hin welatên Ewrûpaya Rojava û Amerîkaya Latîn (5), heta yên Afrîkayê jî, êdî aciziya xwe nîşan didin. Helwêsta wan ya ku niha hê bela wela ye, dikare di hefteyên pêşiya me de bi ser hev de were û xurttir bibe. Hin derdorên polîtîk yên progresîst û dezgehên sivîl yên van welatan hewl didin ku zorê bidin ser hin dewletan ku beyî Amerîkayê be jî, nîqaşên li ser dewamkirin an jî guherîna Protokola Kyotoyê ya bi Peymana Kopenhagê israr bikin. Rast e ku cudabendiya ku niha di navbera Waşîngton û Pekînê de heye karê însiyatîfeke bi vî rengî dijwartir dike. Lê, trêneke ku li ser rêyê ye sirf ji ber ku hin rêwî naxwazin lê siwar bibin nikare bê rawestandin. Gava ku Amerîka jî bixwaze lê siwar bibe, kesek wê li dij dernekeve.

Dîrok nîşan dide ku, her cara ku hin welatan xwastiye bidin ser rêya ku aqilane tê hesibandin û ji bo berjewendiyên giştî ye, hemû welatên din jî daye dû wan – Amerîka jî di nav de. Nûnerên hilbijartî yên bîst û heft welatên Yekîtiya Ewrûpayê, endamên Parlamentoya Ewrûpa, Amerîka ne di nav jî de be, heger bikarin welatên din ji bo xebat û îmzeya peymaneke Kopenhagê qane bikin, ew ê bibe destpêka gaveke polîtîk ya nû û ji bo wan jî delîla berpirsiyariyeke polîtîk ya dîrokî.

## Pere û bazar û hevkarî

Di nava mekanîzma û fînansa ku dikevin çarçowa Peymana Binhegîn ya Netewên Yekgirtî li ser guherînên germahiyê (PBNYGG) ya ku sala 1992'an hate îmzekirin û sala 1994'an jî li parlamentoyên sed û nod û du welatan ve hate pejirandin, ev xal jî hene:

- "Bazara berdana gazê" ku di nivîsa hember de behsa wê hate kirin.
- Bi xêra "mekanîzmayên pêşketina paqij" (MPP), welatên endustriyel projeyên Netewên nedewlemend ku berdana gazê kêm dikin an jî bi temamî dadixin, fînanse dikin û ji bo vê jî dikarin krediyan bistînin û pê bikarin bigihijin armancên xwe yê berdana gazê.
- "Budceya wargeha cîhanî" (BWC) ya ku alîkariya fînansî dide projeyên welatên kêmpêşketî yên di warê pirrengiya xwezayê, guherînên germahiyê, avên navneteweyî, xerabûyina erdê, tebeqeya ozonê û gemarên organîk yên dijwar de.

Di nava mekanîzma û budceyên ku bi destê Banqeya Cîhanî tê birêvebirin jî ev hene:

- "Budceya projeyên îklîmê" (BPÎ) ya ku didin welatên kêmpêşketî, ji bo ku bi alîkariya teknolojiya ku jê re dibêjin "ya paqij" û karbona wê hindik e, li hember guherînên av û hewayê hêza wan a liberxwedanê bilindtir bibe.
- "Budceya hevkariya karbonê" (BHK) ya ku alîkariyê dide welatên kêmpêşketî ku sîstemên ku karbonê kêm berdide peyda bikin.
- "Budceya hevkariya karbona daristanî" (BHKD) ya ku li konferansa Baliyê, sala 2008'an, dest pê kir; çavkaniyên wê dikarin piştî 2012'an, piştî bidawîbûna Protokola Kyotoyê werin bikaranîn. Armanc jê ew e ku welatên kêmpêşketî daristanên xwe ji holê ranekin û wan daristanan xerab nekin.

Herweha, divê mirov bi bîr bîne ku bazareke serbest jî di warê "bazara karbona serbest" heye ku ji derveyî van herdû dezgehên me behsa wan kir tev digerre.

**Werger ji fransî**
**İbrahim Seydo Aydoğan**

(1) Pirraniya welatên endustriyel soz dabû ku gaza ku berra hewayê didin û ku bûbû sedema germahiya gerdûnê % 5.2 kêm bikin.

(2) Civîna Netewên Yekgirtî ya taybetî ku li New York'ê roja 22'ê 'İlona 2009'an pêk hat, G20'a ku 24 û 25'ê mehê li Pittsburgh'ê pêk hat, hefteya "teknîkê" ya Bangkok'ê ku di navbera 2 û 9'ê çiriya pêşîn de û ya Barcelona'yê ku di navbera 2 û 7'ê Çiriya Paşîn de pêk hat.

(3) Welatekî ku di biniya kotaya xwe re gaz berra hewayê dabe, dikare wî mafê xwe yê mayî bifiroşe welatekî din ku, ji ber gellek sedemên cuda, di ser kotaya xwe re gaz berra hewayê daye.

(4) "Bazara karbonê" ew bazar e ku li ser kota û krediya welatan ya berdana gazê hatiye avakirin. Kota û kredî mafê wan yê berdana gazê diyar dikin û bi "$CO^2$"ê tê pîvan. (Nota wergêr)

(5) Di vê mijarê de mirov dikare li hevkariya franko-brezîlî ya bi navê "ji bo piştgiriya Kopenhagê" ku roja 14'ê Çiriya Paşîn ji aliyê Serokê Brezîlyayê Luiz Inacio Lula da Silva û yê Fransayê Nicolas Sarkozy ve hat aşkerekirin.

www.arsivakurd.org

DYA-ÎRAN

# Rêya têkçûneke dîplomatîk

GARETH PORTER*

Gotûbêjên di navbera G5+1 û Îranê de, berev şikestineke pêşdemî diqelibin. Heger prosesa gotûbêjan bi rastî têk biçe, behra pitir wê ji ber şaş-hesabkirineke cidî ya dîplomatîk a rêveberiya Obama be. Obama, her digel hevpeymanên xwe yên ewrûpî, pîlaneke wisa da ber xwe ku bi zîrekane doz li Îranê dikir ku destan ji piraniya stoka xwe ya ûranyûma kêm-dewlemendkirî (ÛKD) bikêşe. Ev pîlan derfeteke zêrîn bû ji bo gîrokirina bernameya enerjiya nukleer a Îranê; û serera îşaretên hişyarker ku Rojava bi vî awayî nagihe wê hedefa diyarkirî, dîsa jî pîlana navborî îmkan durist kirin ku Rojava nekeve rewşeke wisa ku mecbûr bibe hewlên mezin bide ji bo gihiştina lihevhatineke dîplomatîk digel Îranê bi amanca aştkirina dijminiya dehan salan a di navbera Washington û Tehranê de.

Sersebebê aloziya dîplomatîk a demûdest a li dor vê pêşniyarê vedigere ser pêdiviya Îranê ya dabînkirina karbûranê bo reaktora xwe ya nukleer li Tehranê ku çêkirina/produksiyona DYA'yê ye û radyoîzotopên pizijkî hildiberîne. Îranê bi xêra peymaneke hevkariyê, ku di 1998'an de hatibû îmzekirin û di 1993'an de tewaw bûbû, ji Arjantînê 23 kîlo karbûrana sedî 20 dewlemendkirî bi dest xistibû. Lê belê, çaverê ye ku ew tedarek berev dawiya sala 2010'an biqede, û Wezîrê Karûbarên Derekî yê Îranê Menûçehr Mottekî, meha hezîranê nameyek hinart bo Ajansa Navnetewî bo Enerjiya Atomî (IAEA) û daxwaz jê kir ku alîkariya Îranê bike ji bo kirrîna têra xwe ûranyûma sedî 20 dewlemendkirî di bin serperiştiya ajansê de da ku dîsa tedarekeke demdirêj bê teqezkirin bo reaktora pizijkî.

Lê belê, ji bo wê, pêşî divê mueyyideyên navnetewî yên li dijî bernameya nukleer a Îranê sist bibin. Û gava rêveberiya Obama bi wê daxwaza Îranê hesiya, rabû stratejiyeke nû ya dîplomatîk darişt bi amanca tengavkirina Îranê da ku razî bibe ku bo salekê dest ji piraniya ÛKD'ya xwe bikêşe. Hatiye ragihandin ku di hengava seredanekê de bo Moskovayê, meha hezîranê, Gary Samore'ê rawêjkarê Serok Barack Obama yê Qesra Spî ji bo babeta nukleera Îranê, pêşniyarek biriye bo rayedarên rûs ku li gorî wê pêşniyarê Îran wê ûranyûma xwe ya kêm-dewlemendkirî bişîne Rûsyayê da ku bê veguhartin bo tîrikên karbûranê [lûle an jî tûpên hesinî ku tê de sotemenî/karbûrana nukleer heye] yên pir zêdetir dewlemendkirî. Bi vî awayî, wê behreya çekduristkirinê ya Îranê, ku niha xwedanê wê asta çekduristkirinê ye, saleke din paş ve bidin.

Pêşniyar herwiha hevaheng bû digel ew hedefa dîplomatîk ku Samore di Hezîrana 2009'an de pêşkêşî Qesra Spî kiribû. Di gotarekê de ku digel Bruce Reidelê ji Brookings Institutionê nivîsîbû û di Kanûna 2008'an de hatibû belavkirin, Samore, pêşniyar kiribû ku ÛKD'ya Îranê bê îxrackirin bo Rûsyayê da ku bê veguhartin bo tîrikên karbûranê ji bo reaktora Buşehrê û bi vî rengî behre û qudreta Îranê ya çekduristkirinê ji dest bê standin.

Hingî, bi tenê heftiyek piştî ku Îran razî bûbû beşdariyê di gotûbêjên grûba 5+1 de bike, Tehranê ragihande IAEA'yê ku xerîk e dezgeHeger din a dewlemendkirina ûranyûmê ava dike li nêzîkî Qomê. Dewletên Yekgirtî, Brîtanya û Fransayê hebûna dezgehê bi "dek û dolab" nirxand û şermezar kir, û rayedarên DYA'yê pê da çûn ku Îranê bes ji ber ku îstixbarata Rojavayî bi hebûna wê hesiyabû dezgeh eşkere kiribû.

Lê belê, delîlên bidetaytir nîşan didin ku dezgeha navborî wekî beşek ji bernameya duristkirina destek û teqwiyeyê hatibû destpêkirin di rûdana êrîşeke bombeyî de bi ser binkeya serekî ya dewlemendkirinê li Natanzê û ji bo bêtesîrkirina gefa xef û nerasterast a êşrîşeke Îsraîlê hatibû eşkerekirin. Lewre stratejîstên îranî wisa bawer dikirin ku DYA pê ve bû ku wê gefa amajekirî wekî fişareke dîplomatîk bi kar bîne di prosesa gotûbêjan de. Heta dereceyekê pişka rastiyê hebû di vê ferz û boçûnê de. Samore, berî ku têkeve nava rêveberiyê, gelek caran ew boçûna hanê parastibû ku desteya muzakereyan a DYA'yê divê îstifadeyê ji îhtîmala êrîşeke Îsraîlê wergire. Û meha tîrmehê, Joe Bidenê wekîlê serokdewletî, bi rengekî eşkere çiraya kesk roşin kiribû ji bo êrîşeke hewayî ya Îsraîlê bi ser dezgehên nukleer ên Îranê bi şertê ku Îsraîl qanih be ku ev yek pêwîst e.

Ragihandina Îranê ya binkeya Qomê kereste û bingeke din da destên rêveberiya Obama ku boçûn û muamileyeke hişk û dijminane hilgirin li dijî Îranê di wan dîdaran de ku 1'ê Cotmehê dest pê dikin. Netîce pêşniyarek bû ji G5+1'yê, ku li gorî wê, Îranê wê sedî 80'yê ûranyûma xwe ya kêmdewlemendkirî bihinartaya Rûsyayê, ku ew jî wê dû re bihata veguhastin bo Fransayê da ku bê veguhartin bo tîrikên karbûranê ji bo reaktora Tehranê. Amanca bingehî ya wê boçûna DYA'yê ew bû ku Îran tavilê dest ji piraniya ÛKD'ya xwe bikêşe, bi vî rengî serkeftineke dîplomatîk li ser malika rêveberiya Obama li qelem bide. Neh heta dazdeh mehan wê bigirtaya heta ku careke din Îran bi têra duristkirina gefa çekduristkirinê ÛKD'yê bi dest bixwe.

Rayedarên DYA'yê diyar kirin ku bi xêra vê pêşniyarê wextê herdû layenan wê firehtir bûya da ku bigihine lihevhatineke firehtir di çarçoveyeke bêyî ihtimala bombeyeke îranî de. Lê belê, mentiqa wê bingeh û wan sebeban şaş bû. Bîra ku rêveberiya Obama, piştî ku pê dihese ku Îran dike bigihe bidestxistina çekên nukleer û diyar dike ku xwedantiya wê ya rêjeyeke ÛKD'yê ku têra duristkirina çekan dike bi ti awayî nayê qebûlkirin, wê li piştî çend mehan vegeriyaya û pêşniyareke wisa li Îranê bikiraya ku wê derfet bidaya Îranê ji bo berhevkirina zêdetir ÛKD'yê di dahatûyê de, hîç cihê baweriyê nebû.

Desteya gotûbêjan a îranî pêşniyara roajavayî ya di 1'ê Cotmehê de hatî pêşkêşkirin red nekir. Diyar e emr li wan kiribûn ku hevkariyê bikin û sernerm bin da ku hinceteke wisa nedine destên Rojavayê û bi vî rengî dewletên rojavayî nekarin gotûbêjan rawestînin û nekarin berdewam bin di sepandina mueyyideyên aborî li dijî Îranê de. Lê belê, bi awayê ku Reutersê ragihandî, William Burnsê Wekîlê Wezîrê Karûbarên Derekî, nûnerê pilebilind ê DYA'yê di civîna li Cenevreyê, ji peyamnêran re eşkere kir ku sekreterê Lijneya Bala ya Ewleyiya Netewî ya Îranê Seîd Celîlî razî bûbû ku Îran 1,200 kîlo ji tevahiya 1,500 kîloyên ÛKD'ya xwe bişîne da ku bê veguhartin bo ûranyûma bi sedî 19.75 dewlemendkirî.


Lê belê, rayedarekî pilebilind ê îranî, 16'ê Cotmehê ji Reutersê re got ku desteya gotûbêjan a îranî li ser ti pîlaneke rojavayî negihiştibû lihevkirinekê; qesta rayedarî bi vê hindê ew bû ku, wan dil lê hebû bigihine peymaneke ku wan xal û madeyan di nav xwe ve bigire, lê belê li ser ti tevdîr û peymaneke bidetay negihiştine hevbîriyekê. Heman rayedarî eşkere kir ku desteya gotûbêjan a îranî, ne xwedanê wê erkê ye ku bigihe biryarekê di xeleka duyem a gotûbêjan de ku çaverê ye di 19-21'ê Cotmehê de li Viyanayê bi rê ve biçin.

Xeleka duyem a gotûbêjan li dor reşnivîsa peymanekê zivirî ku bi wê peymanê dîrektorê giştî yê Ajansa Navnetewî bo Enerjiya Atomî Muhammed El Baradeyî, mîqdara ÛKD'ya ku Îranê wê bişandaya Rûsyayê û ûranyûma sedî 20 dewlemendkirî ku wê li Îranê bihata vegerandin bi detay destnîşan dikir. Dîplomatekî fransî ji Washington Postê re got ku ev "zêde dûr nebû" ji çareseriya îdeal a Rojavayê. 21'ê Cotmehê, roja dawî ya civîna sê-rojî ya li Viyanayê, çapemeniyê dîsa ragihand ku desteya gotûbêjan a Îranê pîlana El Baradeyî qebûl kiribû. Nûnerê Îranê yê IAEA'yê Elî Esxer Soltanî diyar kir ku reşnivîs "li ser rêça rast" bû lê belê, "divê em bi berfirehî vê deqê tehlîl bikin." El Baradeyî bi xwe ron kir ku hêj ti lihevhatinek li ser deqê nehatibû ragihandin û ku du roj dabûne Îranê da ku bersiva xwe bide.

Lê belê, gengeşeyên giştî û taybet ên li ser bersiva reşnivîsê çar an pênc rojan kêşa. Gotûbêjkerê meseleya nukleerê yê berê Alî Laricanî, ku niha berdevkê Parlemanê ye, û Alaeddîn Boroucerdiyê serokê lijneya parlemanî bo Ewleyiya Netewî û Karûbarên Derekî, pêdagirî li ser vê hindê kirin ku divê Îran ûranyûma zêdetir-dewlemend-

*Rojnamevan.

www.arsivakurdi.org




kirî bikirre, ne ku stokên xwe yên ÛKD'yê bifiroşe ji bo wê yekê.

### ÛKD'ya Îranê wekî kozên bazarkirinê

Lê belê îtiraz û berhelistiyeke gelek berfireh û bingehî hebû bo pêşniyara El Baradeyî. Bi ya malpera reformxwaz *Kalemeyê*, Mîr Huseyîn Museviyê reqîbê Ehmedînecadî di hilbijartinan de û serokê bizava muxalefeta piştî hilbijartinan, gotiye ku Heger şert û bendên pîlana El Baradeyî bêne bicihanîn, "hemû ked û hewlên bi hezaran lêkolîneran wê xwerayî/ bêhûde biçin." Parlemanterê parêzkar/ muhafizekar Hesmatullah Felahetpîşe got ku her çi peymaneke digel Rojavayê sebaret bi îxrackirina stokên ÛKD'ya Îranê, divê bi wî şertî bê qebûlkirin ku mueyyideyên aborî yên li ser Îranê bêne rakirin, bi taybetî ew mueyyideyên li ser kirrîna ûranyûma xav. Herwiha, Sekreterê Parêzkar ê Şûraya Çavdêran Mohsen Rezayî, got ku Îran divê 1.100 kîlo ji 1.500 kîloyên xwe yên ÛKD'yê di enbarên xwe de biparêze ne ku 1.200 kîloyan bişîne derve wekî ku pîlana El Baradeyî dixwaze.

Ev îtiraz û berhelistiyên bo pîlanê hemû balê dikêşine ser wê hindê ku reşnivîsa pîlana El Baradeyî wê Îranê ji wan kozên bazarkirinê mehrûm bike ku ewqas bi zor û zehmetî bi şiklê stokên ÛKD'yê bi dest xistine. Rayedarên pilebilind ji ewleyiya netewî ya Îranê, di axaftinên xeyrî-resmî de ragihandine ku amanca wan a serekî ji berhevkirina ûranyûma kêm-dewlemendkirî ew bûye ku Dewletên Yekgirtî yên Amerîkayê mecbûr bikin da ku bi awayekî ciddî digel Îranê rûne ser maseya bazarê. Lewre wan ji çavdêriyên xwe fam kiribû ku berê, berî ku bernameya dewlemendkirina ûranyûmê dest pê bike, meyla Dewletên Yekgirtî hîç li ser muzakereyan nebû. Bi ya wê boçûna stratejîk, Îran îro, bi xêra stokên xwe yên ÛKD'yê, xwedî pozîsyoneke bihêz e ji bo muzakereyên digel Dewletên Yekgirtî ku di dewra Refsancanî û Xatemî de pozîsyoneke wiha li ber destê wê nebû.

Gotinên Laricanî û Boroucerdî yên sebaret bi lihevhatinê, li bal gelek derdoran, wekî derz û duberiyeke kûr a elîta siyasî ya Îranê li ser meseleya bersiva bo pîlana El Baradeyî şaş hatiye şîrovekirin. New York Timesê du gotar di heman heftiyê de belavkirin ku bal dikêşane ser wê yekê ku Obama, bi berçavkirina derzên kûr ên di navbera serekên Îranê de li ser meseleyê, gihiştibû amanceke siyasî ya bingehî.

Lê belê ev tehlîla hanê xwe disparte wê ferzê ku serokdewletî jixwe pêşniyara rojavayî hembêz kiribû, halbûkî wî bi hişyarî bîr û meyla xwe ya siyasî-dîplomatîk a di meydana vê meseleyê de sist û fireh hiştibû. Ya rast, delîlên wê yekê hene ku mirov bawer bike ku, li pişt perdeyan, konsensûseke nû dihate darîştin di navbera hikûmet û dijberên pîlana El Baradeyî yên di muxalefetê de. Şermezarkirina Mousevî ya pîlana rojavayî, 29'ê Cotmehê eşkere bû –heman rojê dijpêşniyara Îranê di medyaya dewletî de bû mijara behs û lêkdanan.

Ûboroucerdiyê Serekê Komîteya Parlemanteran, 26'ê Cotmehê doza pîlanekê dikir ku li gorî wê pîlanê ÛKD'ya Îranê wê di çend merheleyan de bihata hinartin bo Rûsyayê da ku bi vî rengî "teqez bikin" ku nayêne xapandin, 29'ê mehê Boroucerdî vê carê dijpêşniyara Îranê bo reşnivîsa El Baradeyî ji raya giştî re eşkere û rave dikir. Herçend ti beyaneke resmî nehatibe dan jî, ajansa nûçeyan a dewletî IRNA'yê diyar kir ku pêşniyara Îranê doza wê yekê dikir ku hinardeyên ÛKD'yê bi şiklê çend par/pişkên cuda bêne birêkirin, ne ku hemû di carekê de. Herwiha li gorî pîlanê, bes piştî ku ûranyûma ji bo reaktora pizişkî digihe ber destê rayedarên îranî wan wê para duyem bişandana. IRNA'yê taybetiya "lihevguhorîna hevkat" a pêşniyarê wekî "hêla sor" a pozîsyona muzakereyên Îranê destnîşan kir. Taybetiyeke din a pêşniyarê jî ew bû ku Îranê dixwast ku beşek ji ûranyûma ji bo reaktora pizişkî her rasterast jê re bê firotin.

Herçend dijpêşniyara îranî hemû ew layenên ku reşnivîsa El Baradeyî ji bo rêveberiya Obama balkêş dikirin elîmîne dike jî, bersiva resmî ya Îranê pir bi hişyarî xwe ji derbirrîna redkirina eşkere ya reşnivîsê diparêze. Ya rast, li gorî beyana resmî, Îran, "helwêsteke pozîtîf" û dilxwaziya xwe ya birêvebirina bêtir danûstandinan li ser reşnivîsê derdibirre. Eşkere ye ku ev hewleke din bû da ku firsendê nede destê G5+1'ê ku rabigihîne ku Îran bi cidî beşdarî di prosesa muzakereyan de nake û ji ber vê hindê muzakereyan bi dawî dike.

Gava ku gotûbêjkerên din ew dijpêşniyara Îranê piştguh kirin, Ehmedînecad pêşniyareke taze da û şert danî ku qederê çaryekê ÛKD'yê ji aliyê IAEA'yê ve li ser axa Îranê bê pêçan heta ku ûranyûma ji bo reaktora wê ya pizijkî digihe ber destên rayedarên îranî, û bes piştî hingî bê hinartin. Lê belê, Obama 15'ê Mijdarê hişyariyek da û got ku "wextê me dibiriyê" ji bo gotûbêjên li ser pêşniyara El Baradeyî. Niha teqez xuya dike ku G5+1 wê berî dawiya Kanûnê qedandina muzakereyan îlan bike û dest bavêje merheleya din a mueyyideyan li dijî Îranê.

Bi vî rengî, gotûbêjên digel Îranê, hêj berî ku ihtimala bazareke firehtir digel Îranê bê ceribandin, wê bi dawî bibin. Di wê bazara firehtir de wê xalên wekî bidawîbûna siyaseta dijminane ya Dewletên Yekgirtî, û naskirineke sembolîk a berjewendiyên rewa yên Îranê û statûya wê ya li siyaseta Rojhilata Navîn cih bigirtana. Heger rêveberiya Obama, serera baweriya Obama ya bi çareseriyên dîplomatîk, ev yek neceribandibe, heta dereceyekê ji ber hêviya Samore û wan rawêjkarên din bû ku dixwastin çareseriyeke dîplomatîk a wisa li ser Îranê dasepînin ku mirov dikare wê çareseriyê, bo kurtedemekê jî be, wekî serkeftineke dîplomatîk a li hember Îranê bibîne. Lê belê, Samore'ê ku yek ji mîmarên pêşniyara El Baradeyî ye, herwiha bawer dikir ku diviya rêveberiya Obama teklîfên wisa bidana pêş Îranê ku berjewendiyên wê [Îran] yên siyasî û aborî yên mezintir jî di nav xwe de bihewandana. Rêveberiyê hemû bal û hewla xwe da ser pêşniyareke wisa ku ti îmkanên birêvebirina muzakereyên li ser bingehê "bide û bistîne"digel Îranê nedihiştin. Bêguman, meyla wê siyaset û pêşniyarê ya ku dixwast hemû tiştî bi lez û bez bi rêk bixe û bigihe netîceyan, hevkat atmosfera siyasî ya navxweyî, ku pir di bin karîgeriya lobiya rast-gir a îsraîlî de bû, nîşan dida. Netîce, girtina deriyê aştbûn û rêkeftineke muhtemel a digel Îranê, û berêxwedana nav dalaneke dirêj û tarî ya bi navê "qebû û berhelistîkirin" bû.

**Werger ji fransî**
**Ergîn Opergin**

www.arsivakurdi.org

PIŞTÎ DEH SALAN DDR

# Bî rastî jî Komara Demokratîk ya Almanya hebû?

BERNARD UMBRECHT*

Meha gulanê, pêşbazîyeke netewî ku ji aliyê Parlamentoya Almanya hatibû sazkirin bi dawî bû û ev pêşbazî ji hemû hunermend û mîmaran re vekirî bû. Mijara vê pêşbazîyê ew bû ku berhemeke netewî bihataya pêkanîn ku bibûya sembola "yekîtî û azadîyê." Rewşeke karesat bû, lewre pêncsed pêşniyar hatin kirin, lê belê yekê ji wan jî mirov qane nedikir. Enzo Traverso'yê ku me li Berlînê dît û li wira, somestreke perwerdehîyê li Zanîngeha Azad pêk dianî, destnîşan dike ku *"dijwarîya peydakirina semboleke yekîtîyê, pirsgirêka Almanyayê ya dîrokî ye."* Ev dîroknas gava ku behsa Almanyayê dike, dibêje *"welatekî mezin, bi çandeke mezin, welatekî ku di dîrokê de roleke mezin lîstiye, lê belê ne xwedan mîtên erênî ye û tim bêgav maye ku xwe bi awayekî neyinî bide naskirin. Gava ku Almanyayê xwe bi erênî da naskirin, wê ev yek di warê dernete- wîbûnê de pêk anî. Ev jî dibe lêgerrîna helwêsteke nasnameyî ku ne etno-kulturel be û di nava welatpa- rêzîyeke destûrî de be."* (1)

Trasso dibêje ku ew lê ecêb dimîne, ji ber *"navkokîya eşkere ku li Berlînê diyar dibe û di nava du rêyan de maye: înada vejîna pêşeroja Almanyayê ya cihû û, di ber re, daxwaza ecêb ya jêbirina paşeroja Almanyaya Rojhilat, ya Komara Demokratîk ya Alman-ya."* Ev dubendîya di bîra almanî ya civakî de ye, herweha di nava van herdu waran de, li Berlînê jî diyar dibe: li alîyekî bîranîna Holokostê, ya mezin û ecêb, ku nîşan dide ku Almanya naxwaze wê qirkirinê ji bîr bike; û li alîyê din jî, cihê mezin û vala ku Qesra Komarê ya KDA [Komara Demokratîk ya Alman] maye." Ji hêlekê ve, hewil didin ku qulleke bîrê –redkirina Holokostê- dagirin; ji hêla din jî qulleke din di wê bîrê de çêdikin, yan bi rêya rakirin û xerabkirina ji binî ve, yan jî, weke ku Régine Robin dibêje, bi "muzekirinê" (2) ve.

Gelo di van bîst salên dawîn de bi awayekî "şerrekî bîrê yê sar" hate lidarxistin. Yan jî, gelo ev ji tevgereke mezintir nayê, ji adeteke gellekî kevin ya Almanyayê ya paqijkirina demên bihurî? Li gora Rubin, rast e ku li vî welatî adeteke "damnatio memoriae" (3) heye. Lê belê bandora wê li gora waran diguhere. *"Dema ku Almanya dixwaze qesra komarê xerab bike, ji hêla din ve jî ji bo kûpaya cîhanê ya futbolê, stada nazîyan ya lîstikên olîmpîyadan restore dike."* Lê, nivîskara Kebekî (Quebec) destnîşan dike ku *"ev ne xem e. Ew bi vî awayî lembederên Albert Speer (4) –mîmarê Adolf Hitler- li bajêr diparêze, weke ku di rewşa pirranîya avahîyên nazîyan yên ku neketine ber bombeyan de dike, lê belê bi awayekî sîstematîk ew, li ser Alexanderplatz'ê bin jî, avahîyên ku di dema KDA'yê de hatine avakirin dide xerabkirin. Bi vî awayî KDA ji binî ve tê redkirin. Tê xwastin ku ew bibe parantêzek di dîroka Almanyayê de, şermeke weke ya Reich'a Sêyem. Tiştek divê jê nemîne: sirûd, ala, amblem, leheng, navên kolanan, avahî, pirtûkên dibistanan, kursîyên zanîngehan, hemû divê ji holê bên rakirin."*

Zehmet e. Heger xeta ku ji dîwar maye ji bo bîranîna ketina wî hatiye diyarkirin, çawa mirov dikare ji bîr bike bê çi li paş wî bû? Ew ê rojekê xelk ji xwe bipirsin ka bê çima dîwar hatibû avakirin. Û ew ê bi bîra xwe bînin ku xelkê ku serî hilda dabû dû xewneke din, ne xewna Coca-Cola û supermarketan.

Li paş wî dîwarî... Ji bo hivdeh milyon niştecîhan, jiyanek li wira hebû. Ev yek bi carekê ve nayê jê-



birin, û tew gava ku ew bibînin ku alternatîfa ku li wan hat pêşnîyarkirin li ber çavên wan têk diçe. Kesek vegera KDA'yê hêvî nake; lê, weke ku anketeke li ser hebûna "Ostalgie" yê (Ostaljî tê xwendin) nîşan dide, pirranîya wan, bîst sal bi şûn ve jî, bi awayekî erênî wê bi bîr tînin. Ji bilî vê, % 63'ê almanên Rojhilatî di wê bawerîyê de ne ku cudahîyên di navbera Rojhilat û Rojavayê de ji wekhevîyên wan xurttir in. (5)Di nava mîmaran de jî li ser wendabûna alavên berbiçav yên Komara Demokratîk helwêsteke protestoyê dest pê kiriye. Weke kesên mîna Philipp Oswald'ê birêvebirê Fondation Bauhaus'a Dessau'yê ku li dij derket ku navenda Berlînê, di navbera Spree û Alexanderplatz'ê de, bi projeyekê –li gora awayê qirna navîn- ji nû ve bê sazkirin. Pêwîst e ku mirov bibêje ku li wê deverê hê jî peykerê Karl Marx yê navdar û yê Friedrich Engels heye ku hin hişmendîyên kevnar nikarin debarî van bermayîyan bikin.Bi munasebeta salvegera pejirandina Destûra Almanyaya Federal ya 1949'an, li Martin Gropius Bau'ya muzeya kevn ya hunerên dekoratif, meha gulan û hezîranê, pêşengehek bi navê "60 sal – 60 berhem" hate lidarxistin ku ev pêşengeh ji aliyê beşekî çapemenîyê ve weke "hunera biserketîyan" (6) hate binavkirin: Hemû berhemên wêneyî û peykerî ku ji dema KDA'yê dihatin ji binî ve ji nav derxistibûn. Revîzyon bi hilbijartina berhemên wênesaz Wolfgang Mattheuer ve gihişt asta xwe ya herî bilind: bi tenê berhemên wî yên piştî 1989'an hilbijartibûn û bi vî awayî berpirsên pêşengehê dixwast nîşan bidin ku ew heta piştî ketina dîwar jî nebûbû hunermendekî "rasteqîn", digel ku ew gellekî berî wê jî bûbû. 60 berhem bi armanca nîşandayina xala destûrê ya 5.3 ku digot "huner azad e" hatibûn pêşkêşkirin. Dersa exlaqê ku dihat dayin eşkere bû: di bin dîktatorîyan de afirandinên hunerî nikarin pêk bên.

Ji bo nivîskar Christophe Hein'ê ku bi awayekî eşkere vexwendnameya pêşengehê red kiriye, ev pêşengeh sembola rewşa îroyîn ya "yekkirina navalman ya xwedêgiravî" bû. Li ser pirsa yekkirinê, ew dibêje: *"Şaşîyek tê de heye. Bi tenê xelkê Rojhilatê ev dixwast. Ji bo yên Rojavayê, sînorê Almanyayê heta çemê Elbe'ê bû ku li cem wan ew ne sînorê beşekî Almanyayê yê din bû, lê belê sînorê Rûsyayê bû. Almanên Rojavayê wê ji yekîtîya bi KDA'ya ku di derheqê wê de bi tiştekî nizanin bêtir, yekîtîyeke bi Toscane'ê an jî Giravên Baléares'ê re bixwastaya."* Li ser pirseke di derheqê zehmetîya ku Alman ji bo peydakirina semboleke yekîtiyê didin xwe, Christphe Hein hêrs dibe: *"Herçî semboline yekîtîyê ne, ji wan zêdetir tişt tuneye. Ev pêşengeh jî yek ji wan e. Rapora li ser xizanîya Almanyayê yeka din e, bê hempa ye! Cudahîya di navbera meaş û kar û teqawîtîyê de, ev hemû sembolên xurt in!"*

Mirov dikare bi hêsanî vê lîsteyê dirêjtir bike û bi awayekî eşkere nimûneyên wê bidin – beyî ku bê jibîrkirin ku mafyayê bi şaxê Calabreyê ve bandora xwe heta bi Erfurt, Leipzig û Eisenach'ê jî anîye (7).

Fîlmê Thomas Heise yê nû, Material (8) (alav), dîmenên ku ji dawîya salên 1980'î li KDA'yê û heta orta 2008'an li Almanyayê hatine girtin dide ser hev. Navê wî herweha karîbû bibûya 'Yê ji ber maye': *"Bermayî tim di bala min de ne. Ev dîmen bê rawestan dikevin nava peywendîyên nû. Ew tim di nava tevgerê de ne. Alav bi dawî nebûye. Ew ji yên ku min parastiye hatiye avakirin. Dîmena min."* Ev herweha hewleke derxistina raporeke bîst salên dawîn e.

Di nava karê xwe de, Heise ev hevok nivîsandiye: *"Mirov dikare dîrokê weke rêyeke zirav û dirêj bihesibîne. Lê belê, ew dibe bênderek."* Ev jî awayeke ku mirov bibêje ku dîrok ne bi tenê berêyek û piştêyek e, lê herweha pêşîyek û paşîyek e jî, jor û jêr in jî, yê berbiçav û yê veşarî ye jî. Ev dokumentera ku bi belgeyên orjînal ve hatiye dewlemendkirin, weke dokumentereke bi şiroveyeke vegotinî nehatiye avakirin. Derhênêr hiştiye ku dîmenên beş bi beş bikevin nava hevdu û li bin guhê hev bikevin. Xwendina nava rêzîkan ji temaşevanan re hatiye hiştin. Hemû civatê çawa xwe fêrî vê kiribe, ew jî weha. Hema hema di hemû fragmanan de axaftin ji xwe heye. Weke mînak, axaftinên di navbera mahkûm û gardîyanan de li ser efûyeke giştî, an jî di navbera mîlîtanên Partîya Komûnîst ya Almanya Rojhilat û birêvebirên wê de.

Heise dixwaze li dijî *"heçî tiştên pûç yên vegotina"* bûyeran derkeve. Ew, weke mînak, bi bîr dixe ku gava ku xwepêşandêrên ku siya Tian'anmenê li ser wan bû diqêrîya û digot, *"em milletek in"* ne weke ku bi dû re hinan hewl da ku îspat bikiraya wan berê xwe dabû Almanya Rojava, lê belê, wan berê xwe dabû polîsên ku dora wan girtibû. *"Ya ku dixwazin bidin jibîrkirin, ev rastî bi xwe ye, wê dema ku xelk rabûbû ser lingan ku behsa xwe bike. Kes wê bîranînê naxwaze. Em ketina dîwar pîroz dikin, lê em guh nadinê ku milletekî li hember desthilatdarîyeke westîyayî serî hilda û bi dest xist, û em bi bîr naynin ku piştî wê jî, yek-*

* Rojnameger

www.arsivakurd.org

*kirin pêk nehat, lê pêvekirin pêk hat, bi şikandina xeyalan ve ji nû ve disîplînek hat bicihkirin. Komara Federal nikarîbû qebûl bikiraya ku li beşekî Almanyayê miletek desthilatdar e; wê ê nikarîbûya xwe li ser lingan bigirtaya. dîwar hate vekirin, da ku rê li ber şoreşê were girtin.”*

Lê belê, jêbirin ne bi tenê ji bo siyasetê, çandê û sembolan e: Hemû dezgeh û avahîyên endustrîyel, teknîkî û zanistî yên wî beşê Almanyayê hatin hilweşandin. Aborîzan Edgar Most hê jî bi hers e û hê jî dixe stûyê Helmut Kohl û dibêje ku wî bi zanebûnî ji *wê bi kêrî çi bên? Dewlet û civat? Gelo bi kêrî şîrketan û karan tên? û herî dawîn jî, bi çi awayî bi kêrî banqeyê tên? Bi kapîtala taybetî, nirx ji binî ve diguherin: pirsa bingehîn ew e ka gelo banqe bi kêrî çi tê?”*

Sala 1990’ê, wî dixwast ku zû bi zû biryar nehatana dayin: *“Hemû tiştên ku di dema KDA’yê de hatin avakirin danîn hêlekê. Birêvebirî ket destê Rojavayê. Karmendên ku şandin jî bêkêr bûn. Li zanîngehan, mamosteyên rojavayî ketin hemû kadroyan (10), Akademîya Zanînan hate girtin. Hemû hêza zanistî ya KDA’ya berê ku karîbû bi hêsanî*




*bibûya raqîba zanistîya Rojavayê ji holê hat rakirin. Kesekî tu carî hewl neda ku van bûyeran binirxîne û raporekê di derheqê wan de derxe.”* Yên Rojavayê her der bi dest xistin. Mirov bi hêsanî fahm dike bê çima xelkê vira weha hîs kir ku reftara xelkê sinifa duyem li wan hate kirin.

Digel ku ew di wê bawerîyê de ye ku KDA êdî di ser derfetên xwe re xerc dikir jî, banqevanê me li dij derdikeve ku mirov bibêje ku KDA’yê di dawîya salên 1980’î de nikarîbû meaş bidana. Ew dibêje ku Fransa amade bû ku kredî bidaya wê. Most ji binî ve bêrîya dema berê nake, lê belê, weke gellek kesên ku di warê aborîyê de dixebitin, ew jî di wê bawerîyê de ye ku rastîya nuha berê jî pêk hatibû. Herkes dibêje ku dawîya KDA’yê di sala 1972’an de bi desthilatdarîya Erich Honecker ve dest pê kiriye. Honecker hemû şîrketên piçûk û mezin û bazarên piçûk jî di nav de bi dewletê ve girê dan û hewl da ku”yekîtîya polîtîkaya aborî û civakî” xurt bike ku ev yekîtî ne li gora rastîyê bû. Berpirsê ku wî danîbû ser vî karî, Günter Mittag, li ser navê Partîyê tev digerrîya û bi awayekî bêberpirsiyarî, weke ku razînêrên kapîtalîst dikin, bi heman zextan mudaxaleyî şîrketan dikir.

Birêz Christian Wegerdt tu otobiyografî nenivîsandine; lê, gava ku mirov lê guhdarî dike, mirov dibêje ku gerek ew jî bicerribîne. Ew muhendîsekî pisporê fîzîka alavan e û behs dike bê çawa ji birêvebirîya şîrketeke sosyalîst veguherîye û bûye razînêrekî kapîtalîst, ku ev war ji bo wî biyanî bû. Me ew li Dresdeyê, li navenda şîrketa wî ya analîza alavan, IMA Deresde, dît. Sed û şêst karkerên wî yên ku bi pirranî muhendîs in li ser karê alavên veguheztina hewayî (airbus) dixebitin, lê belê karên endustrîya otomobîlan, ya trênan, ya enerjîya bayî û ya dermanan jî dikin. Dera Saxe’ê ya aborî ji bo karê wan ne ya herî baş e. Ev herêma ku yek ji mezintirîn herêma endustrîyel ya Almanayayê ye, herweha pir difiroşe derve jî, lê belê ji yên din bêtir derbên qeyrana aborî xwarine. Piştî perwerdehîya di warê metalurjîyê de, Wegerdt di şîrketeke dewletê ya mezin de ku bi wezareta aborîyê ve girêdayî ye û karê endustrîya kanê û ya siderurjîyê dikir, bûye birêvebirê zanistî û teknîkî û bi dû re jî bûye birêvebirê lêkolînan.

Li KDA’yê, heger pêwîst bûya, mirov karîbû carekê karê cîgirîya wezaretê red bikiraya, lê mirov nikarîbû du caran weha bikiraya. Hatiye serê wî û ew di nav de fêr bûye. Weke ku surgun bûbe, di dawîya salên 1980’î de tayina wî rabûye enstîtuyeke zanistî û teknîkî ku nehsed pisporên lêkolînerîya korozyonê tê de dixebitin û nuha berpirsê wê ye. Bi dû re dîwar hilweşîya. Gelo mirov çi bike? *“Ez li seranserê Almanyayê gerrîyam, kesî guh nedida me. Di 1990-91’ê de, çarsed kes ji kar hatin derxistin. Treuhandê (11) dest pê kiribû: yan wê şîrket bibûya taybetî, yan jî wê berî 1992’an bihataya girtin. Me çar hevalan pişta xwe da hev û me şîrket kirrî.”* Weha bi ser ketiye.

Pozbilindîya Almanyaya Rojava *“ya ku digot qey em ne bi hesaban dizanin û ne jî em dizanin bi kêr û çetelan xwarinê bixwin”* bandor li wî kiriye. Li gora wî, wê dema kirt ya ku tê de nîqaşa li ser mafên civakî dihat kirin *“bi biryarên ku ji derve dihatin reng werdigirt û ew biryar bi ideolojîya reqabetê, bi pêşbazîya bidestxistinê, carinan bi hişmendîya dagirkerîyê, carinan bi dilpakîyê, lê belê bi qurretîyek û bêvilbilindîyeke bêhiş dihat ki-rin.” Birevebirîya temamê aborîya Almanya Rojhilatê ya ji aliyê Treuhandê “ji şiklekî din yê berdewamîya aborîya navendî pê ve ne tiştek bû.”*

Di sala 2001’ê de, di konferanseke de ku wî axaftina xwe ya wira da me, vî birevebirê şîrketê digot: *“Neheqîyeke mezin e ku kara sermayeyê roj bi roj ji kara karkirinê zêdetir û giringtir bibe. (...) Gava ku sosyalîzm hê bi vê dinyayê re diket reqabetê, em jê ditirsîyan, û vê tirsê em radiwestandin. Nuha êdî ev tirs nemaye û tu tişt nikare me rawestîne.”*

Bê guman, heçî kesên ku daye ser heman rêyê, serkevtinek bi dest nexistiye û têk çûne. Lê belê, niherîna wan kesên ku di vî warî de bi ser ketine wê gellekî balkêş be, lewre niherîna wan rengê têkçûyinê wernegirtiye.

Bi alîkarîya kurê xwe yê ku cigirîya wî dikir û bi dû re jî bû şaredarê bajêr, Birêz Elmar Faber li Leipzigê weşanxaneya Faber û Faber damezirandiye. Wî xwendina xwe di dewreke gellekî baş de kiriye ku kesayetîyên mîna Ernst Bloch û Hans Mayer, ev bi tenê yên herî navdar in, li Zanîngeha Leipzigê ders didan, û ji ber wê, ew naxwaze dev ji vê mîrasa xwe berde. Berê, Birêz Faber li Weşanxeya Aufbau Verlagê edîtor bû û ev navdartirîn weşanxaneya KDA’yê herweha weşanxaneya Berthold Brecht û Thomas Mann jî bû. Wî bi xwe pêvajoya taybetîkirina wê bi rê ve biriye.

Taybetîkirin an jî girtin, ev bû alternatîva ku yekîtîyê datanî ber şîrketên dewletê û jê pê ve çare tunebû. Pêvajoya wê jî ji aliyê Treuhandê ve dihat kontrolkirin û divîya piştî veguheztinê jî şîrketan nîşanî wê bidaya ku dîroka wan li gora qanûnan paqij e. Serê Birêz Faber ji ber wê ketiye belayê: *“Gazî min kirin Treuhandê. Di dosyeya min de kaxezek kêm bûye. Li birêvebirîya karmendan, belgeyek bi navê ‘daxuyanî’ nîşanî min dan. Divîya min ev tekst îmze bikiraya: ‘Ez didim zanîn ku ez tu carî ji bo Stasîyê (12) nexebitîme.’ Min got ku ez ê îmze nekim, lê belê ez dikarim daxuyanîyekê bidim. Min ev tekst îmze kir: ‘Ez didim zanîn ku min tu carî ji bo ku ez li ser karê xwe bimînim tu tişt îmze nekirine, ne di sîstema kevn de û ne jî di sîstema nû de.’ Ev bûyer saet di 10:30’an de pêk hat. Saet di 13:30’an de ez ji kar hatim bidûrxistin.”*

Birêz Faber di wê pêvajoya bi lez û bez ya piştî ketina dîwar de gellek serêşî dîtine: *“Ew ne dewreke poetîk bû. Pirtûkên baştirîn nivîskarên KDA’yê, herweha weşanên Heinrich Mann, yên Leon Feuchtwanger, yên Arnold Zweig, yên Anna Seghers, bi tonan pirtûk, avêtin çopan û rakirin. Ji bo pirtûkên li ser çêkirina xwarinan, pirtûkên şîretên pirhêl û ji bo rêberên tûrîstîk cih di refikan de ji wan re lazim bû.”* Kuştina birevebirê Treuhand Anstaltê ya sala 1991’ê rewş bi temamî guhert. Detlev Rohweedder di wê bawerîyê de bû ku mirov karîbû beşekî potansîyela KDA’yê ya endustrîyel biparastaya, bi taybetî jî Weşanxaneya Aufbau Verlagê. Ev weşanxane di serî de ji aliyê bazirganekî emlaqan hat kirrîn, bi dû re jî, piştî topavêtina wê, ji aliyê karsazekî berlînî, Matthias Koch, hate kirrîn. *“Piştî mirina Detlev Rohwedder ya trajîk, bêhişîya sîstemê gihişt asta bilind. Weke mînak, rojekê şefê karmendên Treuhandê piştî ku bi awayekî xurt li ser fikirîye û avêtiye aqilan, gi-*

www.arsivakurdi.org




*Yek dîwar, yek milet, du dewlêt...*

*hiştiye wê bawerîyê ku weşanxaneya me di eslê xwe de ji Marks û Engels pê ve tiştekî din çap nekiriye."* (13)

Li gora edîtorê Leipzigê, pêvajoyeke "a-dîrokîkirinê" dest pê kiribû: *"Xwastin ji bîr bikin bê me çima Almanyayeke din dixwast."* Li gora wî, ev jî baş eşkere dike bê çima nîqaşên dema me guh nadinê û hewl didin ku dîrokê ji dawîyê bidin destpêkirin û nivîsandin. Pişta xwe dispêre Gramsci û dibêje: *"Heger birêvebir ji xelkê ku bi rê ve dibe bêhiştir be, dawîya wê felaket e. Li KDA'yê jî weha bû. Îroj jî heman rewş heye, lê bi tenê cudahîyek di nava wan de heye. Vê carê bêhişîya xelkê jî tev li ya çîna polîtîk bûye."*

Diyar e ku Deutsches Hygiene Museum'a Dresdeyê ne cihekî weha ye ku mirov bikare pêşengeheke li ser xebatê lê bibîne, digel ku navê wê Muzeya Mirovahîyê ye. Têhega "xebatê" ne têgeheke hêsan e, bi taybetî jî heger em qebûl bikin ku wateya karî jî tê de heye, lê belê bi temamî nabe kar. Pêşengeha ku xebatê bi hîpoteza ku ew veguherîneke cîhanê ya bi hewla mirovahî be şirove dike, fikrine nû jî dide mirov. Ew herweha azadîyeke bêhempa dide mêvanan ku bikarin pêşniyarên pêşengehê rexne jî bikin. Pêşengeha ku navê wê "Arbeit Sinn und Sorge" e, xebatê bi têgehên têgihiştin *(sinn)* û xemê *(sorge)* re girê dide. Sorge herweha bi wateya ku Bernard Stiegler di kataloga pêşengehê de bi kar tîne dibe haydarî jî.

Di *sorge*'a almanî de, wateya xem, tirs û taswasê ("ez ji bo dikevim taswasê") bêtir rengekî neyînî dide vê peyvê. Lê belê, wateyeke din ya haydarîyê jî heye ku bi fikra li xwe û li yên din miqatebûnê ("li xwe miqate be") tê bikaranîn. Daniel Tyeadellisê fîlozof et berpirsê pêşengehê dibêje: *"Li gora me, giring e ku me di navê pêşengehê de rengekî erênî jî bidaya. Pirs li ser wê ye bê mirov li çi miqate ye. Qiymetê tiştê ku em lê miqate ne çi ye? Gelo ew tişt şexsî ye an em dikarin jê biwêdetir jî bifikirin? Bi çi awayî mirov dikare bibe xwedî hîssekê li hember tiştekî ku ji şexsîbûnê derketiye?"*

Piştî ketina dîwar, di warê xebatê de gelo çi pêk hat? Bi awayekî îstatîstîk, rajeya bêkarîyê bilind bûye, lê belê awayê karên demkî di ber re zêdetir bûne û belav bûne. Di nav hev de du fikrên cuda pêk hatin. Li aliyê Rojhilat, hîssa têrbûna li hember xebatê xurt dibû, lê belê di ber re, bi awayekî dijber, xemên pisîşîk jî girantir dibûn (14). Li gora Sosyolog Wolfgang Engler, rektorê Dibistana Bilind ya Şanoyê ya Ernst Busch ya Berlinê, *"ew ê nakokîyeke xapînok be ku mirov bikeve bawerîya ku li Rojavayê xebat berî meaşî dihat û digel ku li Rojhilatê meaş berî xebatê dihat."* Ew di wê bawerîyê de ye ku xelkê *"KDA red kir, lewre li gora wan, digel ku navê wê kar û xebat bû jî, sîstemê zêde qiymet nedida daxwaza wan ya pêkanîna tiştekî."*

Çend sed metreyan ji muzeyê bi wê de, di avahîyeke nuh û ji camê de, navê wê yê "febrîqeya caman" jî jê hatiye, hawara şîrketa Volkswagenê ya dawîn heye. Katedraleke ji bo serfirazîya Xwedaya otomobîlê. Heçî kesê ku Phaeton'ekê bikirre, dikare bi zindî pevxistin û pakkirina erebeya xwe bi çavên xwe bibîne. Di reklama danasînê de, Volkswagen nîşan dide ku ew dixwaze weke avahîyên Dresdeyê bike û erebeyê weke berhemeke Richard Wagner nîşan dide! Cihê wê rengê navendeke çandî, ya pêşengehên tabloyan û ya defîleyên modayê dide, opera jî lê çêdibin. Lê, dîsa jî, karker karê xwe dikin. Digel ku mirov dibîne ku karker li derdora mekîneyên pevxistinê yên otomatîk, weke ku ji xwe re temaşe bikin diçin û tên jî, peyva "febrîqe" mubalexe ye.

Volkswagena ku Mîrekîya Qatarê % 17'ê wê nuh kirrîye jî eynî weke Porsche, Opel û Mercedesê beşekî wê "utopyaya" Rojavayî ye ku ji binî ve alman e û têk diçe. Engler dibêje ku *"Almanyaya Federal ya kevn tim demokrasî û pêşketina aborî bi şîrketên mezin ve girê dida. Digotin qey heta dawîyê jî ev herdu wê bi hev re bin. Lê belê, ezmûna aborî ya ku derketiye pêşîya me û herweha wendabûyina çend kelehên bîra me ya hevpar yên dawîn îroj demokrasîya me jî dicerribîne."*

Gelo ew ê karibe ji vê ceribandinê bi saxî derkeve? Ev xema li ser paşeroja demokrasîyê li cem hemû mêvanên vê nivîsê hebû. Li ser pirsa ka gelo gava ku ew li KDA'yê difikire ew herî zêde bêrîya çi dike, nivîskarê Dresdeyê Ingo Schulze, weha bersivê dide: *"Ya ku ez bêrîya wê dikim ew e ku me statuko bi awayekî aşkere rexne dikir. Bi pirsa li ser têgihiştina xwe ya paşerojê, di eslê xwe de me xwe û têgihiştina xwe eşkere dikir. [...] Îroj, gava ku mirov behsa paşerojê dike, mirov dikeve tirsa xerabbûyina rewşa me ya nuha. Divê em ji nû ve fêr bibin ku em dikarin tiştan biguherînin."*

**Werger ji fransî**
**Îbrahim Seydo Aydoğan**

---

(1) Têgeha Jürgen Habermas e. Heger dijberê wê nehatibe gotin, bersivên nivîskar ji hevpeyvîna wî hatine wergirtin.

(2) Nivîskara Berlin Chantier (Stock, Paris), Régine Robin herweha hevkomsêra pêşengeha "Berlîn. Wendabûna şopan" e ku wê ji 21'ê Çiriya Pêşîn heta 31'ê Çileya Pêşîn li Muzeya Dîroka Hemdem ya Hotel des Ivalides'a Parîsê (Fransa) li dar dikeve.

(3) Damnatio memoriae: biryara piştî mirinê ku li Senatoya romayî dihat dayin, da ku hemi şopên civakî yên siyasetmedarekî ji holê bên rakirin.

(4) Ji alîyê Dadgeha Nurembergê ve bi bîst salên zindanê ve hate cezakirin.

(5) Li gora Renate Köcher, Birêvebira Institut Allensbach. Deutsche Presse-Agentur, 28 Îlon 2009.

(6) Weke mînak, heftenameya Die Zeit'ê (Hambourg) ya 30'ê Nîsana 2009'an weha maşet avêtibû: "Yên ku bi ser ketine dişibin vê."

(7) Die Zeit, "Mafia li vir e", 13 Tebax 2009.

(8) Vî fîlmê ku xelata mezin ya Pêşbirka navnetewî li Festîvala navnetewî ya dokumenteran a Marsîlyayê wergirtiye, wê di çarçoweya Berlin, Berlin(s) de were nîşandayin. Mois du film documentaire 2009, 26 Çiriya Paşîn 2009, saet di 18'an de, li Pirtûkxaneya Netewî ya Fransayê (petit auditorium), 11 quai François Mauriac, 75013 Paris.

(9) Berpirsê aborîya polîtburoya Partîya Komunîst ya Almanya Rojhilat.

(10) Christophe Hein dibêje ku li hin enstîtuyan ji bilî xizmetkaran ji KDA'ya kevn tiştek jî nemaye.

(11) Treuhand Anstald dezgeha bazirganîyê ya fermî bû ku di dema hilweşîna KDA'yê de karê wê birêvebirina firotina şîrketan bû.

(12) Polîsê siyasî yê KDA'yê

(13) Di eslê xwe de, ev ji binî ve çewt bû. Weşandina berhemên Marks û Engels ji aliyê Weşanxaneya Partîya Komunîst ya Almanya Rojhilat, Dietz Verlagê ve dihat kirin.

(14) Heyecana almanên Rojhilat dîsa jî hêdî hêdî sivik dibe.

www.arsivakurd.org

BIRÎNÊN NASNAMEYA NIŞTIMANÎ YA SÛRIYEYÊ

# Çawa li Sûriyeyê pirsgirêka “biyaniyên Tirkiyeyê” peyda bû?

MIHEMED CEMAL BARUT*

*Di pêvajoya ku di dîroka Sûriyeyê de wek pêvajoya “cudabûnê’’ tê naskirin de, Hikûmeta Sûriyeyê di 05.10.1962’an de, serjimêriyeke awarte bo niştecîhên Parêzgeha Cizîrê (Hesekê), pêk anî. Di encama vê serjimêriyê de, nêzîka % 28’ê niştecîhên Hesekê ji mafê hemwelatîbûnê hatin bêparkirin. Ev kes di destpêkê de, wek “Biyaniyên Tirkiyeyê” hatin binavkirin, pişt re li jêr benda “Biyaniyên Hesekê” hatin kategorîzekirin. Mebesta hikûmetê ji serjimêriyê, sezadana “Qaçaxên Kurd” bû ku bi dizî û bi rêyên qaçax û nerewa ji başûrê Tirkiyê derbasî Parêzgeha Cizîrê bûbûn.*

*Dibistana dîroka Sûriyeyê heta niha ji tu dokumentên akadîmîk û babetane ên di derbarê vê pêvajoya “Tunekirinê” de ku li jêr navnîşaneke yasayî û bêlayen “Serjimêriya Giştî” bi rê ve çû bê par e, ev pêvajoya. Êdî, bi tenê dimîne “dokumentkirinên” îdeolojîk ku ew jî herçend di warê nêzîkahiyên sosyolog û antropologan de ji bo naskirina rewşa raya giştî kêrhatî bin jî, bi kêrî nêzîkbûna rastiya pirsgirêkê û rêveçûna wê nayên.*

*Projeya “Sûriye 2025” yekem heyet bû ku nêzîkahiyeke pir eşkere û li gel dokumentên zanistî ji bo vê pirsgirêkê pêşkêş kir. Wê di rêya xwe sipartina rexneyî re daxwiyaniyên dokumentkirî yên projeyê bi dest xistin. Ev gotar ku kirtiya lêkolîneke berfirehtir û mezintir e, hewl dide ku nêzîkahiyeke nû pêk bîne ku xwendina pirsgirêkê di rêveçûna derketina wê, pêkhatina wê, zelalbûna wê û destnîşankirina encamên wê re, wek bingeh digre.*

Di dawiya Tebaxa 1962’an de, yan di dawiya pêvajoya ku di edebiyata dîrokî de navê “Serdema Cudabûn”ê (cudabûna ji Komara Erebî ya Hevgirtî) lê tê kirin, û li ser bingeha qeyraneke kûr, kêşedar û aloz Hikûmeta Beşîr Ezime ya çepgir û yekîtîparêz a ku di şerê Erebî yê sar di navbera Riyad û Qahîre de (16 Nîsan-13 Îlon 1962) bêlayan ma, hat hilweşandin û Xalid Ezim hikûmeta xwe ya nû damezirand (17 Îlon 1962-7 Adar 1963) ku di qonaxa “cûdabûnê’’ de hikûmeta pêncem û ya da-wîn bû.

Xalid Ezim di siyasetên xwe yên civakî de konservator, lê di warê bikaranîna desthilatiyê de despotîk bû. Xalid Ezim li çavdêrî û xwedîderketina Amerîkayê digerriya û ji dayina deynên xwe yê zêde yên ku li gel faîzên wan digihîştin 430 hezar lîreyên Sûriyeyê direviya ku dewletê ew ji bo “Banqeya Sûriye û Diyaspora” garantî kiribûn (1). Ev wêne cuda ye ji wêneyê paşayê klasîk ê ronakbîr ê yekem Ezim (1940-1950) damezirênerê yekem yasaya hevdem ya ji bo hevkariya li tevahiya dewletên Erebî, û hewldana damezirandina dewleta nûjen; herwiha bi tundî cuda ye ji wêneyê Ezim ê dûyem an wêneyê “Milyonêrê Sor” yê di salên 1950’î de, nemaze di nîveka wan de ku Ezim bi pêngava xwe ya dîrokî ya îmzekirina peymana hevkariya aborî û teknîkî ya li gel Yekîtiya Sovyetê û di zîrveya Şerê Sar de, sertac kirin.

Hikûmeta Xalid Ezim di 05.10.1962’an de, hê sê hefte di ser desthilatdariya wê re derbas nebûbûn “Serjimêriyeke Giştî bo nîştecîhên Parêzgeha Hesekê” pêkanî; berî vê, Wezareta Navxweyî ji felcbûna Hikûmeta Beşîr Ezime ya ku ji dawiya Tebaxa 1962’an ve wek hikumeteke îstîfakirî dihat hesibandin qels ketibû. Ew hikumet di nava stresên mezin û tund de bû; li dijî wê hin tevger hebûn ku ji aliyê Riyad û Odeya Bazirganiya Şamê û wekîlên şîrketên petrolê û eniya kevnenûneran a bi serokatiya Xalid Ezim, `Îsam El-Ettar û Ekrem El-Horanî dihatin kirin. Di nava vê rewşê de di Îlona 1962’an de wezareta navxweyî biryar da ku vê serjimêriyê pêk bîne. Wezaretê biryar da tevahiya Tomarên Rewşa Civakî yên berê yên girêdayî nîştecîhên Hesekê, ji holê bên rakirin û serjimêriyeke giştî ya nû ji bo nîştecîhên Sûriyê û “biyanî” yên parêzgehê, bê çêkirin. (2)

Pêvajoya serjimêriyê ji xwe re pîvaneke sereke ya di tespîtkirina nasnameyê de wek bingeh girt: Herkesê di tomarnameyên Rewşa Civakî de berî sala 1945’an de tomarkirî bû û ji wê demê heta cîbicîkirina serjimêriyê li Sûriyê rûniştî bû, hevwelatiyê Sûriyê tê hesibandin. Wezareta Navxweyî dem da herkesê navê wî di tomarnameyên Rewşa Civakî de hebû ku di nava mehekê de wêneyekî ji tomara xwe û malbata xwe bi dest bixin û nîşanî karmendên serjimêriya nû bidin da ku nasnameya xwe tespît bikin (3). Armanca vê cudakirina di navbera nîştecîhan de dorpêçkirina nîştecîhên Hesekê yên navên wan di tomarnameyên Rewşa Civakî de nehatine tomarkirin bû, ji ber ku hejmara nîştecîhên Sûriyê yên tomarkirî di Tomarên Rewşa Civakî de naskirî û çespandî ye.

Lê, pîvana tomarkirinê di tomarnameyên Rewşa Kesayetî de ne realîst bû; ji ber ku diyardeya -Mektûmîn- an yên ne tomarkirî him di nava kurdan de û him jî di nava ereban de jî belav bû wê çaxê; û ev diyarde ma bi rêjeyeke kêmtir di nav desthilatên piştî dema Serjimêriya Awarte, û heta îro jî bi rêjeyên hinekî zêdetir di parêzgehên navçeya rojhilatê Sûriyê de belav bûye.

Eşkere ye ku armanca serjimêriyê ne belgekirina tomarkiriyan, lê belê belgekirina yên ku wek “qaçax” hatin wesifkirin bûn ku wek “Biyaniyên Tirkiyeyê” hatin naskirin lê belê piştî xweacizkirina Tirkiyeyê, êdî weke “Biyaniyên Hesekê” hatin binavkirin.

Desthilatiyên serjimêriyê pêdagir bûn li ser naskirina nasnameya etnîkî ya “Mektûman.” Belgekirin û tomarkirin li gor awayê peywendiyên desthilatdarî û civakî yên wê demê û herwiha bi rêya karmendên dewletê, mufrezeyên polîsan û mufrezeya Şaxê Siyasî li gel giregir, “eyan” û serokeşîrên ku berjewendiyên wan li dijî hev derdiketin dihatin cîbicîkirin.

Serjimêriya Awarte ji serî heta binî, û ji pêşî heta dawî li jêr çavdêrî û kontrola “kirîvê” rast Parêzgerê Cizîrê Seîd El-Seyid de birêveçû. El-Seyid di kitêba bîranînên xwe de wiha behsa xwe dike: “Erebekî neteweperestî tund, sosyalîst lê ne bi tundî, bo pêkanîna yekîtiya erebî ku di jiyanê de tek armanca wî ye û hêviya wî ya herî mezin e, bi hemû hebûn, îmkan û hêza xwe kar dike”(4)

Seîd El-Seyid birayê Celal El-Seyid ê ku yek ji damezirênerên Partiya Baasê bû lê zû jê cuda bû ji ber hewesên wî yên sosyalîst û helwesta wî ya pirsa yekîtiya li gel Îraqê, lê Seîd ne Baasî bû. Ew nêzîkî nifşê netewperestî resen bû ku hinek endamên vî nifşî di bin bandora fikrên netewî yên tund û şovînîst de mabûn.

Nerînên El-Seyid roleke girîng di warê biryargirtina encamên serjimêriyê û akamên wê de lîstin, ji ber ku navenda dest-

** Lêkoler û ramanvanekî ji Sûrîye ye, xwediyê zêdeyî 15 pirtûkan e. Li rêxistineke ser bi NY wek pispor kar kiriye. Rêveber û damezrênerê serekî yê projeyên “Fêrkirin û Pêşvebirina Mirovî” û “Projeya Sûriye 2025” û “Koça Derveyî ya Nêvdewletî ya Sûriye” û “Avakirina tora NGO`s a taybet bi geşepêdanê li Sûriyê” û”Rapora rewşa niştecîhên Sûriyê di sala 2008’an.” Niha lêkolerê Peymangeha Fransî bo Rojhilata Nêzîk IFPO ye.*

www.arsivakurdi.org

hilatdariyê Parêzgeha Cizîrê bi her awayî girtibû destê xwe.

Di encamên Serjimêriya Awarte de, di rojekê de 85 hezar "nîştecîhên" Parêzgeha Hesekê wek "Biyaniyên Tirk" hatin tomarkirin, pirraniya wan "biyaniyan" kurd bûn û bi derbaskirina sînorên Tirkiyê ya qaçaxî û hatina Sûriyeyê ve dihatin tawanbarkirin. Lê jimara nîştecîhên ereb û suryaniyên (5) ku ketin ber "bêparkirina ji nasnameyê" kêm bû. Rêjeya jimara van "Mektûman" ku tomarnameyek taybet bi wan hat pêkanîn nêzîka % 28'ê tevahiya jimara niştecîhên parêzgehê yên tomarkirî bû. Nifûsa Hesekê wê demê 302 hezar dihat texmînkirin ku li gor encamên îstatîka giştî ya sala 1960'an pêk hatibû û ev jî yekemîn îstatîstîka giştî ya li Sûriyê bû ku li gor pîvan û yasayên zanistî pêk dihat (6).

Encamên Serjimêriya Awarte û kategorezekirina nû jimara kurdan û rêjeya wan li gor grubên çandî-etnîkî yê din guvaşt; û kurd ji pêvajoya milkdarî, siyaset û hilbijartinan derxistin. Herwiha, encamên Serjimêriya Awarte kurd û serokatiyên wan bi giştî qels û lawaz kirin. Ew di warê hevsengiyên hêz, desthilatî, saman û dabeşkirina etnîkî li gora hevrikên wan ên tund û bihêz "aşûrî" de qels ketin. Di sedsala bîstan de, di salên 1933-1936'an de, li gor peymaneke Fransî û Îraqiyan li jêr fînans û çavdêriya Netewên Yekgirtî (niha NY) û piştî qirîza wan li Îraqê, pêleke Aşûriyan a nû li Cizîrê bi cih bûbû.

Jimara niştecîhên Cizîrê wê demê ne ewqasî zêde bû, ji ber ku ew di rêveçûna qonaxên pêşkeftina demografîk a civaka Sûriyeyê de hê di pêvajoya "hevsengiya nêgatîv" de bû, yanî ew pêvajoya ku tê de pêşveçûna niştecîhan sifir e, ji ber newekheviya rêjeya mirin û jidayikbûnê. Lewma jî di dema ku navçeyên din ên Sûriyeyê derbasî qonaxa pêşveçûna bilez a niştecîhan dibûn, jimara niştecîhên Parêzgeha Hesekê kêm bû.


Lewre wê demê di nav parêzgehên Sûriyê de, Hesekê di warê jimara niştecîhan de, parêzgeha şeşan bû digel ku rewşa wê rewşa pileya sêyem bû. Ji ber ku şoreşa çandiniyê li wira hatibû destpêkirin û ji ber berfirehbûna projeyên avdanî û reforma zeviyên çandinê (heta gihîşt radeyekê ku ew navçe wek "California'ya Rojhilatê" dihat naskirin), planên pêşvebirinê hemûyan nîşan dida ku Cizîrê dikare jimarên zêde yên niştecîhan hembêz bike. Ji hemûyan zêdetir, bilezkirina rîtma kar a ji bo avakirina bendava Firatê ku jê re hatibû pêşbînîkirin ku mesaheya avdankirî ji zeviyên qabil bo çakkirinê, hilberîn û çandiniyê dû caran berfirehtir bike û ji hemuyan grîngtir dîtina petrolê a li navçeyê û îmkana firoştina wê, ji nav faktorên zêdebûna giringîpêdana bi navçeyê, bêtir ber bi çav diketin.

## Jinûve pênasekirina navçeya Cizîrê

Ji dawiya salên 1940'an ve, herdem Navçeya Cizîrê di rêya dîtin û têgeheke çandinî de dihat pênasekirin ku jêdera sereke ya dahatiya tevahiya Sûriyeyê pêk tîne; lê belê dîtina petrola giran ku dikare bê firoştin a di sala 1962'an de û vedîtina petrolê li navçeya Cizîrê şîrketên petrolê yên Ewrûpî û Amerîkî xistin nava hevrikiya ji bo hilberîna wê. Ev bû çavkaniyeke din a bingehînî ku ji bo Navçeya Cizîrê bi awyekî din bê naskirin, an jî pênasekirina wê di riya giringiya petrolê de hat. Êdî, her pênc hikûmetên Sûriyeyê yên li pey hev di serdema (Cudabûnê) de bi tevahî gihîştibûn vê baweriyê ku Sûriyê êdî dikare bibe bo berhemhênerekî "piçûk" yê petrolê.

Ev danasîna Navçeya Cizîrê a wek navçeyeke bi petrol faktoreke girîng bû di vê nerîna Hikûmeta Ezim de. Hikumetê digot: "Pêvajoya derbasbûna bi dizî ya kurdên ji Tirkiyê bo Sûriyeyê planek e û armanca wê jî bicihkirina hinek grûbên xeynîereb li sêgoşeya petrolê ya li Sûriyeyê ye"(7) û hikûmet jî bi nêt e ku hêlên boriyan di navbera kêlgehên petrolê li Cizîrê damezrîne û rafîneriya petrola Banyas û dû rafîneriyên nû jî ava bike."(8)

Lê ev bi wê girêdayî bû ku Hikûmeta Xalid Ezim di danûsitendinên li gel şîrketa "Concordia" ya Almanî re bi ser biketaya ku ji bo hilberîna petrola Sûriyeyê ya giran a li kêlgehên li jêr çavdêriya "Concordia" ya Swêdî an jî di kêlgehên Heyeta Giştî ya Petrolê li Qereşokê re dihatin kirin.




Rıza Topal, (.

Paradoks ew bû ku pêvajoya serjimêriyê ne kêmî % 28'ê niştecîhên Parêzgeha Hesekê ji nasnameyê bêbeş kirin û ji hemû mafên wan bêpar kirin û pirsgirêka têkçûna hevsengiya demoxrafîk hinekî din zêde kir. Ev bûyer di demeke weha de pêk hat ku pêşvebirina Cizîrê ya li ser bingehên çandinî û projeya bendava Firatê aliyekî, û lialiyê din jî dîtin û hilberîna petrolê, pêwîstiya wê ya bi meşandina siyaseteke berfirehbûnê a li ser bingeha zêdekirina jimara niştecîhên Cizîrê û misogerkirina karkerên pêwîst bo projeyên nû di rojevê de bûn.

## Rola hêzên ewlekarî û serkirdayetiyên kurd di vê bextreşiyê de

Hincet û behaneyên "serweriyê" bi tenê perdeyeke îdeolojîk bû ji bo cîbicîkirina pêvajoya bêbeşkirina % 28'ê niştecîhên Parêzgeha Cizîrê ji mafê hemwelatîbûnê û xistina wan di qrîzekê de ku êdî cîhê wan di dewletê de nemîne. A bi vî awayî, polîtîkayên dewleta navendî rêjeyek zêde ya hevwelatiyên xwe malwêran dike, lê wek ku Joseph Strair dibêje: "Zinhar û hezar zinhar bo wan kesên ku dewleta wan tune."(9) Pêvajoya bêbeşkirina wan ji nasname û mafê hemwelatîbûnê, ew marjînalîze kirin, bi sedemê ku pirraniya wan cotka-

www.arsivakurdi.org



v) - Efekt LMD kurdî

rên feqîr û nexwende bûn û bindestên serokeşîr, giregir û malmezinên kurdan bûn. Di destpêkê de, qurbaniyan hest bi wate û nîşanên "Serjimêriya Awarte" nekirin, lê piştî derbasbûna demeke kurt çavê xwe li ser bextreşî û karesata "serjimêrî", yan jî li gor gotina Strair li "waweylê", vekirin.

Seîd Seyid "kirîv" an bavê ruhî yê rast ê pêvajoya Serjimêriya Awarte bû, û berpirsiyariya dîtina behane û hincetan girt ser milê xwe. Piştî çespandina encamên serjimêriyê ew hincet anî ku: "Koça kurdan ji Tirkiyeyê metirsiyeke mezin li ser saxlemiya erebîtiya Sûriyeyê pêk tîne."(10) Seyid bi van îddîayan dixwest raya giştî ya Sûriyeyê gur bikiraya. Tu peywendiya Hikûmeta Ezim ne ji dûr û ne ji nêzîk li gel îdeolojiya nasyonalîst a tund a Seyid tune bû, lê ew di wê qonaxa ku tê de bi her awayî li çespandina "cudabûnê" digerriya li jêr navê parastina "Kiyanê Nemir" bo çekkirina desthilata xwe ya bi amûrên îdeolojî yên zêde, ew bi kar anî.

Ji aliyekî din ve, faktorekî din ku rola wî di vê pirsgirêkê de hebû, zêdebûna çalakiyên Partiya Demokrat a Kurd li Sûriyê (Partî) bû, ku desteya serkirdayetiya wê ya yekem di 14'ê Hezîrana 1957'an de ji elîteke sînordar a ronakbîrên gêncên kurd pêk hat û gelek tê de neçû ku bû navendeke kişandina cemawerên cotkarên hejar û binpêkirî. Herçiqas nerînên van cemaweran ne bi temamî wek yên partiya nû bûn jî, wê demê Partî hêza Kurdî ya rêxistinkirî ya bi tenê bû. Pirraniya serkirdeyên Partiyê kevnekomunîst yan jî nêzîkî Partiya Komunîst a Sûriyeyê bûn û sûd ji tecrubeya Sovyetê wergirtibûn. Partî di Sibata 1962'an de, di qonaxa "cudabûn"ê de rastî hewildaneke parçebûnê hat, cemawerên Partiyê ewqasî zêde bûn ku rêxistinkirina wan ji destê qadroyên hizbê derketibû (11). Herwiha Partî zêdetir girêdayî bûyerên hundirê Îraqê û şoreşa kurdî bû ku Mistefa Barzanî di Îlona 1961'an de, li dijî rêjîma Evdilkerîm Qasim destpê kiribû.

Lê tu dokument tunene ku biçespînin ku Partî çalakiyên xwe yên provokatîv li dijî desthilata Sûriyê piştî kampanyaya desteserkirina Sibata 1962'an domandibin û bi vî awayî desthilat mecbûr kiribin ku di îlona eynî salê de biryara cîbicîkirina "Serjimêriya Awarte" bide. Lê belê şer û nakokiyeke tund di navbera serkirdeyên kurd ên tradîsyonel û dîrokî û Partî de li dar bû, di çarçova şepêleke cemawerî ya netewî ya kurdî ku seba şoreşa kurdên Îraqê germ û gurtir bûbû. Dibe ku ew serkirdeyên kurdên tradîsyonel di çarçova dîtineke berteng a berjewendiyên taybet de desthilat li dijî çalakiyên Partiyê sor kiribe.

Seyid bi zîrekî û jîrî fêde ji vê rewşê dît û fişar xiste ser hikûmetê biryara pêkanîna serjimêriyê zû bide. Gava Hikûmeta Ezime felc bû û karûbarên xwe radestî Xalid Ezim kirin, derfet bo Seyid peyde bû. Ezimê ku di warê hizrî û siyasî de kal bûbû û guherînan ew li paş xwe hiştibûn, kete nav lîstika wan. Di bingeh de, lîstikeka aloz a Seyid bû, di navbera wî û xwedî milkên mezin ên kurd ên ku yasaya Reforma Çandinî li xwe digirtin û milkdariyên wan ketibûne ber metirsiya dest li ser danînê, loma bo parastina berjewendiyên xwe amade bûn ku hertiştî bikin ku di nav de bêparhiştina hevzimanên xwe a ji mafê hemwelatîbûnê jî hebû û bi vî awayî îmkan û desthilatiyên xwe jî di paşerojê de ji dest didan. Mînaka vê çîroka malbata Nizameddîn e, ku di heman demê de yek ji motîvên serjimêrî û qurbaniyên wê jî bûn.

Jîrî, zîrekî û pragmatîka Xalid Ezim di tevlêbûna lîstikê de ew bû ku dixwast Yasaya Reforma Çandinî li jêr navê Çakkirina Navçeya Cizîrê hilweşîne, loma bi hemû hêza xwe û bi navê çakkirinê daxwaza hilweşandina wê dikir. Ezim bi eşkereyî daxwaz dikir cotkar ji nav zeviyên axa û xwedî milkên mezin bên derxistin û koçberkirin.

## Rastiya sergirtî: Reforma Çandinî

Tevlihevbûna berjewendî û desthilatdariyê li dirêjiya dîroka Sûriyeyê ya nûjen gelek caran qewimiye, bi awayekî ku dewlet kiriye keştiyeke ji bo serdest û xwediyên berjewendiyan. Bi taybetî, di Serdema Cudabûnê (Cûdabûna Misir û Sûriyê) de, dema ku Cemal Evdilnasir hinek derbên dîrokî yên mezin li xwediyên hêz û karîgeriyê xistin û rê li pêşiya berfirehbûna beşdariya "xelkên ji rêzê" a di sazkirina biryara siyasî de vekir, ev tevlihevî zêdetir bû.

Evdilnasir rê neda ku xelkên ji rêzê bandora xwe li ser wî bihêlin, ji ber ku wî siyaset di çarçova desthilatê de qeyd kiribû. Lê ji aliyekî din ve, kiryarên wî xelkên ji rêzê dehif didan ku li gel qurbanî û zehmetiyan jî, îmkan û hebûna xwe tekez bikin. Balkêş e ku dema ku xelkên ji rêzê serî hildan, ew serhildan bi navê Evdilnasir bi xwe bû.

Ev mesele çîroka me vedigerîne destpêka peydabûna pirsgirêkê. Lewre pêvajoya çespandina nasnameyê di Serjimêriya Awarte ya taybet bi Parêzgeha Hesekê de, şertek danîbû ku hemwelatiyê Sûriyeyê ew kes e ku navê wî di tomarên Rewşa Civakî yên pêş sala 1945'an de hatibe tomarkirin. Herwiha diviya pêşî wêneyekî qeyda xwe û mala xwe bi dest ve bianiyaya û di dema bicihanîna serjimêriyê de ew pêşkêş bikirana. Lê belê ev merc bi xwe ji rastiyê dûr bû û nedibû delîleke bingehîn a ji bo îspatkirina nasnameyê, ji ber ku diyardeya "Mektûmîn-Kesên bêyî tu qeyd û navan" berê jî yek ji balkêştirîn taybetmendiyên civaka kurd û erebî a li Parêzgeha Hesekê bû. Lewma, yekalîkirina hisabên hêz, desthilatî û karîgeriyê faktorên sereke yên pêvajoya aloz bûn ku bi Serjimêriya Awarte bidawî bû.

Wezîfe yan jî erka pîvana bidestxistina nasnameyê (hebûna navan a di tomarên berî 1945'an de) di Serjimêriya Awarte de eşkere bû. Pîvan ji bo bêbeşkirina cotkarên kurd ên ku di dema Komara Ereb ya Hevgirtî de (Yekîtiya Sûriye û Misir 1958-1961) fêde ji zevî û erdên ku ketibûn ber pêvajoya Reforma Çandinî de dîtibûn, hatibû danîn.

Cemal Evdilnasir di çarçova Yasaya Reforma Çandinî de dest danî ser zeviyan û ew belav kirin. Wî tu cudahî nexist nav cotkarên kurd û ereb, ne jî di navbera Kurdên "resen" û yên "Qaçax: Ên ku li gor nerîna desthilatê bi dizî sînorên Tirkiyê derbaskirine û ji bo bidestxistina zeviyên Navçeya Cizîrê li wir bicîh bûne", lê Evdilnasir cudahî xist navbera derebeg û xwedî milkên mezin û cotkarên hejar. Di bingeh de, Evdilnasir ne li dijî Pirsa Kurd bû, lê yekem serokê ereb bû ku çand û mafên kurdan ên kulturî û netewî nas kiribûn û girove jî li ser vêya pêşkêş kiribûn (12).

Lê Hikûmeta Ezim raya giştî li dijî vê kirinê gur kir ku qazanckerên Yasaya Reforma Çandinî bi tenê "biyanî" û "qaçax"ên gumanbar in ku bi dizî derbas bûne bo dest deynin ser zeviyan. Li gora wî, ev kes gefê li ewlekariya Sûriyeyê, Erebîtî û serweriya wê dixwin. Ji 17'ê Nîsanê heta 13'ê Îlona 1962'an, yek gilîname jî ku bibêje hinek "biyaniyên" ku bi dizî derbasî axa welêt bûne û sûd ji Yasaya Reforma Çandinî li Navçeya Cizîrê wergirtine, nehat tomarkirin (13), li gel ku yasa di vê dema destnîşankirî de ji dema yekîtiya Misir û Sûriyê bileztir birêve diçû. Lê piştî ku Erebîstana Siûdiyê, DYE û Odeya Bazirganiya Şamê û şîrketa "Concordia" li hev kir û piştgiriya hewilên Xalid Ezim kirin û Hikûmeta Beşîr Ezime hilweşandin, ev derewa neditî ku di serdema Hikûmeta Ezime de qet nehatibû bihîstin, derket holê.

Çapemeniya Sûriyeyê qet behsa pirsgirêka Serjimêriya Awarte nekir. Herweha hêz û partiyên Sûriyeyê û di nav de Partiya Komunîst a Sûriyeyê ku kurd û suryaniyên Navçeya Cizîrê giraniya wê pêk tînin jî, dengê xwe dernexist. Rojnameyên Sûriyeyê bi hinceta ku wan pereyên zêde ji aliyê Serokwezîrê Sûriyeyê distendin, xwe kerr dikir (14). Li gor vê rewşê, hin rojnameyên Sûriyeyê texmîn kir ku jimara biyaniyên ku bi dizî derbasî axa Sûriyê bûne di dema yekîtiya Misir û Sûriyeyê de ku bi mebesta sûdwergirtina ji zeviyên Yasaya Reforma Çandinî pêk hatiye, digihîje 50 hezar kesan (15). Ev li dijî cotkarên kurd ên perîşan wek hincetekê dihat bikaranîn ku bi vî awayî bikarin erdên ku di serdema Komara Ereb ya Hevgirtî de li ser wan hatibûn dabeşkirin ji wan bistînin.

Bê guman, cudahiyeke mezin di navbera "Mektûm" û "Qaçaxan" de heye. Lê, Hikûmeta Ezim dabeşkirina zeviyan a li ser cotkarên "Mektûm" ji aliyê Komara Erebî ya Hevgirtî di serdema Evdilnasir de wek belavkirina wan a li "Biyaniyên gumanbar" bi nav kir.

Seyid bi eşkereyî armanca Serjimêriya Awarte da zanîn, dema ku got: "Dabeşkirina zeviyan ne hema hema û li ser çi çavnebarekî be tê kirin, lê li gor yasa û bingehên hûr û destnîşankirî, û tenê hemwelatiyên me li xwe digire; yek parçe erdê ku tên belavkirin dê nebe para biyaniyan."(16). Bi kurtî, ev bû naveroka vê çîroka tirsnak. Pirsgirêka gundê Girbawî (bi nave Ebû Rasên hatiye erebkirin) mînakek herî nimûneyî ya vê çîroka dirêj e, li vir hêja ye ku em ronahiyekê bixin ser vê meseleyê.

## Girbawî (Ebû Rasên): Derebegên kurd piştgiriya Hikûmeta Ezim dikin

Nûner û Wezîrê Berê-yê bihêz- di salên 1950'î de, Evdilbaqî Nizam, bi awayekî jixweber girêdayî Fraksiyona Xalid Ezim a parlamenê bû. Wek nûner û zilamê Ezim dihat hesibandin di hikûmetên ku di rêya lihevkirin û hevpeymanan de di çarçova lîstika siyasî-parlamenî de, pêk dianîn. Evdilbaqî Nizam wek mêrê ku ji milkdariyê têr nedibû dihat naskirin, û çavnebariya wî gihîşt cihekî ku wî îddia kir ku erdê ku dê dewletê Firokexaneya Qamişloyê li ser ava bikira, malê wî ye. Gilînameyek jî tomar kir lê bi serneket.

Sedema redkirina gilînameya wî digihîje demên dadweriya Sûriyeyê ên di nîveka pêşin a salên 50'î de. Berî avakirina dadgeha Efîf El-Bezrî ya siyasî û urfî ku bêrûmetî û "qehpetiyên" bêjimar de derheqê yasayê de kirin, rêz li dadweriya Sûriyeyê û biryarên wê dihat girtin û heta ew rêz gihîşt radeyekê ku dîktatorekî wek Edîb Şîşeklî dema ku desthilat di dest de bû jî, neçar bû rêzê li kiryar û biryarên wê bigire û di rêya wê de gilînameyekê li dijî dijberekî xwe tomar bike.

Evdilbaqî Nizameddîn xwedî gelek mal û milk bû. Lê, milkê wê yê herî giring, gundê Girbawî (Ebû Rasên) yê li Parêzgeha Hesekê kete ber Qanûna Reforma Çandinî. Wezareta Çaksaziya Çandiniyê di dema Komara Ereb ya Hevgirtî de dest danî ser erdên wî û ew li cotkaran belav kirin û li gor tapoyên fermî ew erd kirin milkê wan cotkaran, ango xwedîtiya zeviyan ket destê cotkaran. Nizameddîn li gel bira û merivên xwe li ser milkdariya wan a "tevahî"ya vî gundî wek ku di îddîayên wan yên yasayî de hatibû, ketibû nava navkokiyan.

Bi mebesta xilasbûna ji cotkarên ku fêde ji qanuna belavkirina erdên dewletê didîtin, Nizameddîn îddia kir ku ew cotkar ne "sûryeyî" ne lê "tirk"in û bi qaçaxî ji bo destdanîna ser erdan di bin perdeya qanûna Reforma Çandiniyê de, derbasî xaka Sûriyeyê bûne. Li gor idîaya wî, ji ber sedemên nasnameya wan, nedibû ku ew cotkar bibûna xwedî milk. Ji sedemên layikiyê, hikûmetê wê demê navê van cotkaran danî "Mektûm" lê ne "Qaçax: ên ku bi dizî sînor derbaskirine" lê mebest ji "Mektûmîn"an ew e ku ew ne Sûriyeyiyên tomarkirî, lê Tirk in (17).

Wiha, "peyman"eke ecêb di navbera Wezîrê Çaksaziya Çandiniyê di qonaxa Hikûmeta Demkî ya Mamûn El-Kezberî (Yekem hikûmeta piştî cudabûnê) Seîd El-Seyid û Nizameddîn de hate dirustkirin. Di rêya vê hevpeymanê de, Seîd El-Seyid hewil da ku zeviyên gundê Girbawî ji cotkarên li gor tapoyên dabeşkirina erdan fêdedîtî vala bike, ferq nake ew "tomarkirî" bin di qeydên Rewşa Sivîl de yan "Mektûm" bin, ji ber ku her çawa be ew bi tenê "tirk in!"

Paşê, pirsgirêka cotkarên gundê Girbawî di Sibata 1962'an de veguherî û bû yek ji pirsgirêkên herî girîng di Parlamena Sûriyeyê de, ev bi xwe jî nîşana vê bû ku her çiqasî rewş xirab be jî, sîstemên demokratîk çendî bi kêmasî bin jî, di warê parastina mafên sîtembar û kesên paşguhkirî de, baştir in.

Lê bi sedema bandora Nizameddîn a dîrokî ya di desthilatê de, Serokatiya Parlamena Sûriyeyê di dema cudabûnê de pirsiyara derbarê Nizameddîn ya nûnerê Helebê yê esil-kurd Nûrî Arif ku ji malbateke aristokrat a kurd bû lê xwe nêzîkî doz û pirsgirêkên cotkaran didît, di ser guhê xwe avêt.(18)

Wezîrê Reforma Çandinîê yê nû Bekrî Qebanî (Partiya Niştîmanî-Heleb), ku Helebiyekî "dirinde" bû, ket vê postê, da ku Qanûna Çaksaziya Çandiniyê ji holê rake, neçar bû –bi tenê ji derve ve –qedexe bike ku Nizameddîn zeviyên Girbawî cot bike û rê bide her neh malbatên "mektûm" ku bi awayekî yasayî tapoyên milkdariya erdan bi dest bixin, digel cotkarên qazancker ên din ne ji mektûman bûn (9).

Çîroka rastîn a Girbawî-Ebû Rasên-, çîroka erdên dewletê ye ku Nizameddîn dema ku di desthilatdariyê de bû, dest danîbû ser wan û li gor yasayê wek kirêdarê wan yê bi salê 3 hezar lîreyên Sûriyê hat hesibandin. Di hewildana wî ya dawîn de a ji bo ji nû ve destdanîna ser van zeviyan, Nizameddîn 40 hezar lîreyên Sûriyeyê ji Banqa "Sûriye û Diyaspora" qerz kir, da ku mafê xwe yê veberanîna erd û lê xwedî derketina xwe biçespîne.

Lê belê kampanya parlamenî ya ku hikûmet neçar kir ji biryara Seîd El-Seyid ya qedexekirina dabeşkirina zeviyên Girbawî li ser cotkaran paşve bikişîne, hîşt ew nema qerzê xwe bide, vêna jî dezgeha Çaksaziya Çandinî dehf da ku dest deyne ser tevahiya mal û milkên Nizameddîn û di nav wan de erdên ku ji mafê wî bû bo xwe bihêle.(20) Mezinê wî, Xalid Ezim rêyeke din hilbijart, wî gilînameyek li dijî hikûmetê bi mebesta ku deynê xwe nedaya tomar kir, ew jî xiste nav "strana şeytên" û bêyî ku deynê xwe bide koç kir. Ji ber ku piştî Hikûmeta El-Kezberî faîz ji ser deynên xwedî milkên ku deyn ji banqan kiribûn û hê nedabûn rakir, deynê Ezim gihabû 300 hezar lîreyên Sûriyeyê, lê deynê Nizameddîn ne zêdeyî 25 hezar lîreyên Sûriyeyê bû.

Rola Rêveberê Banqa "Sûriye û Diyaspora"ê wê demê Ednan El-Îta'yê alîgirê Evdilnasir bû û piştgiriya yasaya Reforma Çandiniyê dikir, pir girîng bû di warê fişarxistina ser Nizameddîn û Ezim. El-Îta herdû jî carnan dixistin bin çavdêriya polîsan.

## Encamên Tehl ji bo Derebegên Kurd

Evdilbaqî Nizameddîn yek ji mezintirîn "şeytanên" pêvajoya Serjimêriya Awarte bû. Dema ku Seîd El-Seyid Wezîrê Çaksaziya Çandiniyê bû, wî bi mebesta valakirina erdên xwe ji wan, di rêya kifşkirina metirsiya kesên "bi dizî sînor derbas kirine" de wefadariya xwe pêşkêşî dewletê kir. Nizameddîn bawer dikir ku Qanûna Reforma Çandiniyê bi dawî hatiye.

Herweha, di dema Hikumeta Beşîr Ezime de, hikumeta çepgir belavkirin û dabeşkirina erdan ya bêyî tu cudahiyên çandî, nijadî yan etnîkî bi awayekî bi lez domand. Di rastiyê de, Ehmed Evdilkerîm dest danîbû ser zeviyên xwedî milkên mezin ên ku heta berî çend salan jî li Sûriyeyê serdest bûn. Lê, di dema qelsiya Hikumeta Beşîr Ezime de projeya Serjimêriya Awarte bêyî gotûbêjên hikumî yên rastî hat derbaskirin. Serjimêrî bû pirsgirêka sereke ya Hikumeta Xalid Ezim, lê li jêr navekî nepixandî "Bernameya Reforma Navçeya Cizîrê."

Pêvajoya serjimêriyê, pêvajoyeke siyasî-civakî bû û tu peywendiya wê bi karûbarên teknîkî re, tune bû. Serokatiyên êlî, eşîrî û malbatî yên kurd ên mezin hingî di nava xwe de dabeş bûbûn, û pirraniya wan di yek eniyê de li dijî Partiya Demokrat a Kurd li Sûriyeyê, rawestiyan. Şer û nakokiyên tund ên li ser berjewendiyan bi hinek encamên nehesabkirî bi dawî bûn. Endamên eynî malbatê li ser biyanî, mektûm û hemwelatî hatin dabeşkirin. Malbata Nizameddîn bi xwe jî li ser milkdariyê parçe bûbû û şerê hev dikirin û pirsgirêkên wan gihîştibûn dadgehan jî û carna şerê destan jî. Di encamên ecêb ên Serjimêriya Awarte de, hinek endamên malbata Nizameddîn wek hemwelatî, û hinekên din jî



*Rıza Topal, (Bênav)*

wek biyanî hatin tomarkirin. Wekî din jî, nûner û wezîrê berê Evdilbaqî Nizameddîn bi xwe li gel birayê xwe Lîwa'yê xanenişînkirî Tofîq Nizameddîn ku di sala 1955'an de Serokerkanê Artêşa Sûriyeyê bû û hatibû teqawîdkirin û hê jî meaşê xanenişîniyê werdigirt, wek "biyaniyên parêzgeha Cizîrê yên ku ji Tirkiyê bi dizî derbasî axa Sûriyê" bûne, hatin jimartin. Gelek endamên din ên malbata Nizameddîn wek hemwelatiyên Sûriyeyê hatin qebûlkirin. (21)

Mesele ne encama siyaseteke sîstemkirî ya navendî ji aliyê Hikumeta Xalid Ezim ve bo qirkirina serokatiyan bû bi qasî ku encama şerê hevtunekirinê di navbera van serokartiyan bi xwe de bû. Tevlîheviya nakokiyê derfet da desthilatdariya Seyid ku zarok û neviyên Brahîm Paşayê Millî ku di dema Dewleta Osmanî de û heta dawiya wê serekên navçeya Cizîrê bûn û ne ji ber motîvên netewî yan niştîmanî lê ji bo parastina desthilatiyên xwe yên dîrokî yên mezin ku bi rastî jî yên wan bûn li dijî mandata Fransa şer kiribûn, ji nasnameyê bêpar bike. Lê, piştî ku demek derbas bû, Malbata Millî nasnameya xwe bi dest xistin.

> Çakkirina Cizîrê: Erebkirin, amadekarî û polîs û armanc "rûbarê zêr" e

Di destpêka meha 10'an a sala 1962'an, Hikumeta Ezim danîna Bernameya Çakkirina Navçeya Cizîrê temam kir û Parêzgarê Hesekê Seîd El-Seyid li gel Wezîrê Navxweyî Lîwa Ezîz Evdilkerîm forma wê ya dawî, li gora gotûbêjên wan ên bi wezîran re, saz kir. (22)

Di rastiya xwe de, Bernameyê Çakkirina Navçeya Cizîrê perdeyek bû bo çêkirina astengiyan li pêşiya cîbicîkirina Reforma Çandiniyê li jêr navê pûçkirina kompoloya gumanbar a kesên ku bi dizî sînor derbas kirine. Hêviyên pêşxistinê yên vê bernameyê bê wate û vala bûn. Ne di butçeya yasayî û ya hilberînê de para wî tune bû, ji bilî di hêla hêzên ewlekariyê de, ku armanca bernameyê ya rastîn bû. Li gora desthilatdariyê mijara navçeya Cizîrê ya di dema Hikûmeta Xalid Ezim de, tê wateya ku jimara herî zêde ya xwedî milkên mezin ên ku Qanuna Çaksaziya Çandiniyê li xwe digire, li wir bû. Jimara wan li Hesekê 1036 xwedî milk bû ku rêjeya % 32 bû, lewre tevahiya jimara xwedî milkên ku qanûn li xwe digire 3240 bû. Herweha, jimara mezin a erdên ku qanuna navbirî li xwe digire li Hesekê bû ku digihîşt % 37.6 ji tevahiya erdê ku qanunê li xwe digirt. Erdên avdankirî ji wan digihan rêjeya 20.7 ji tevahiya erdên avdankirî li seranserê Sûriyeyê.

Li gel vê jî, rêjeya erdên ku bi rastî dest li ser wan hat danîn heta hingê rêjeya herî mezin li Sûriyê ev bû: % 56,6 ji tevahiya erdan li gor rêjeya % 38 bo tevahiya Sûriyê û % 28,2 ji tevahiya erdên avdankirî yên ku qanunê ew li xwe digirtin li gor rêjeya % 15, 2 ji tevahiya Sûriyê. (23)

Vê rewş û tevlîheviyê derî ji çavnebarî û keysbazan re, li ser piştê vekir. "Rûbarê zêr" bû xewna çavê herkesî…"Strana Îblîs" a ku Seîd El-Seyid pêşniyar kiribû berdewam dibû û dihat gotin. Her 85 hezar perîşanên êvara wê roja dojehrengî, roja Serjimêriya Awarte, bûn qurbaniyên çavnebariya serokatiyên kurd û giregirên siyaset û desthilatdariya Sûriyeyê û xewna wan a vexwarina ji "Rûbarê zêr." Serjimêriya Awarte destpêka karên Hikumeta Ezim a herî mezin bû, û ev birîna hanê di cerga nasnameya niştîmanî ya Sûriyeyê de, çand (24).

Bi vî awayî, niştecîhên Parêzgeha Hesekê ku tu welat ji bilî Sûriyeyê wek welatê xwe nehisbandine, di cîh û warê xwe de hatin xerîbkirin di dawiya dema Komara Cudabûnê ku desthilatdarî ji bo berjewendiyên taybet ên xwediyên xwe hat bikaranîn. Îro, dem hatiye ku ev bextreşî bi yek carê bê bidawîkirin, bi rêya biryareke tenê ku giraniya wê li hember hêza plana duhêl ya Seyid-Ezim be ku ji bo îzolekirina wan ji dewletê û dûrkirina wan ji wê hat pêkanîn.

Zanista siyasetê me fêr dike ku mijara siyasetê hunerê derfetan e, lê belê armanca wê bi xwe, azadî ye. Êdî dem hatiye ku skandala Xalid Ezim û şirîkê wî Seîd Seyid ku dîroka çi dewletê be, dê wê li dinyayê rûreş û şermezar bike, bê bidawîkirin û dewlet bi rastî bibe ya tevahiya hemwelatiyên xwe.

---

(1) Bîranînên Xalid Ezim, Darûmutehede, Beyrûd 1973, beşê3. r.236

(2) Wezareta Navxweyî li pişt girtina vê biryarê bû. Ev biryara wezîrê me yê navxweyî di 6'ê Îlonê de şîrove dike ku bo cîbicîkirina serjimêriyê yasa derbixin, û piştre Wezareta Plandanînê di 9'ê Îlona 1962'an de biryara 57'an derxist derbarê dema cîbicîkirina serjimêriyê li Hesekê ku roja 05.10.1962'an hat destnîşankirin. Komîteyeke teknîkî bo cîbicîkirina serjimêriyê hat destnîşankirin (rojnameya fermî jimareya 48 sala 1962) ev biryar di demekê de hat sitendin ku hikûmeta Beşîr Ezime felc bûbû, bi hûrbînî çar rojan berî ew bi awayekî fermî biryara îstîfa ya xwe pêşkêş bike.

(3) Rojnameya El-Eyam 7 Îlona 1962.

(4) Beşa ser Seîd Seyid di: Corc Faris (Muhrir) beşê 1: Sûriye 1957. Mekteba Lêkolînên Erebî. Şam 1957.r.323

(5) Pirraniya niştecîhên Hesekê bi kurd û ereban ji eşîrên şarsitanî û nîvşarsitanî, bûn.

(6) Mihemed Cemal Barut (pirtûka sereke) rêveçûnên guherîna niştecîh û waran ên çaverêkirî di bîst salên bê de, Projeya Sûriyê 2025, bernameyê NY û Heyeta Plandanîna Dewletê, Şam 2007, r.402.

(7) Di serdema Hafiz Esad de, warê derbirîna nerazîbûnê derbarê encamên serjimêriyê û pejirandina vê nerazîbûnê berfirehtir kir, ev pêvajoya di sala 1985'an de geş bû û bi şîretnameyên serok bi xwe nasname ji bo 29 hezar û 682 kesên dokumentên xwe pêşkêş kiribin hat dayi. Derî ji bo dayina nasnameyê hatiye berfirehkirin, lê bi sedema zêdebûna xuristî jimara bênasnameyan pirr zêde bûye. Di nîveka pêşî ya salên 60'î de li Hesekê qonaxa geşkirina bi lez a niştecîhan li dar bû û jimara wan gihîştibû 100 hezar kesan û 35 hezar mektûm di dawiya sala 2006'an de (Jêderê Berê r.402-403).

(8) Raporek ser gotûbêjên Civata Wezîran derbarê Cizîrê. Rojnameya El-Eyam 06.11. 1962.

(9) Corc Faris rapora Mekteba Dokumentên Sûriyê û Erebî, ji 17-23.10.1962.

(10) Joseph R.Strayer: On the Medieval Origins of Modern State; Princeton University press: 2005.

(11) Daxwiyaniya Seîd Seyid, El-Eyam 06.11.1962.

(12) Evdilhemîd Hecî Derwêş, Hin Tîşk li ser Tevgera Kurdî li Sûriyê, Gulana 2005.

(13) Ji bilî dabeşkirina zeviyên ku li ser navê cotkaran bêyî cudakirina netewî ya di navbera kurd û ereban de zeftkirî, Evdilnasir di îzgehê de jî beşek bi zimanê kurdî vekir û pirr giringî dida ziman û kultura kurdan. Di serdema Evdilnasir de tu siyaseta cudahiyê li dijî kurdan nehat kirin. Binêre: Cemal Barut: Polîtîkayên Reforma Çandiniyê li Navçeya Cizîrê dema Yekîtiya Sûriye-Misir de, 2009.

(14) Hevpeyvînek li gel Wezîrê Reforma Çandiniyê yê Hikûmeta Beşîr Ezime de Ehmed Evdilkerîm di 15 temûza 2009an de.

(15) Ezim beşê 3. r. 348-349

(16) Corc Faris rapora Mekteba Dokumentên Sûriyê û Erebî, ji 17-23.10.1962.

(17) Daxwiyaniya Seîd Seyid, El-Eyam 06.11.1962

(18) Bekrî Qebanî Wezîrê Reforma Çandinî dibêje biryara gundê Ebû Rasên ji aliyê wezîrê berî wî hatiye sitendin, yanî Seîd Seyid.

(19) Nûrî Arif sê pirs pêşkêşî Dîwana Encûmenê Nûneran kiribûn, dîwanê bersiva dû pirsan da û pirsiyara sisêyan ya ku li ser bi mafên hinek cotkarên gundê Ebû-Rasêna ser bi Qamişlo ve bû, di ser guhê xwe re avêt. (Nûrî Arif rûniştina jimareya 12'ê di sibata 1962'an. Rojnameya fermî jimareya 19 sala 1962 r.519)

(20) Axaftina Bekrî Qebanî, rojnameya fermî, gotûbêjên meclîsa damezrîner 17'ê sibata 1962, r.569

(21) Di 23.09.1962'an de ji aliyê dezgeha reforma çandinî biryar hat sitendin ku dest deynin ser tevahiya zeviyên Evdilbaqî Nizameddîn li gel tevahiya amûrên çandiniyê yên di wan de.jiber navbirî pereyekî zêde deyndarê banqa (Sûriye û Diyaspora) yak u digihe 25 hezar lîreyên Sûriyê (rojnameya fermî, jimara 50 sala 1962)

(22) Hemî kat di dema rojekê de qediya û ewên ji hundir û derveyî malbatê dijminên Evdilbaqî bûn karîbûn wî ji nasnameyê bêbeş bihêlin. Yekser Seîd Seyid derfet ji dest xwe berneda û derbeyek li feodal û malmezinên kurd xist û gelek giregirên malbata Nizameddîn ji nasnameyê bêbeş kirin. Pilaneke ciddî hebû li wan rojan ku Seyid rola sereke dilîst. Di nav malbatekê de, hinek endam wek mektûm dihatin tomarkirin û hinek wek "biyanî" yan "hemwelatî" dihatin tomarkirin.

(23) Rojnameya El-Eyam 7 îlona 1962'an.

(24) Heta 15.01.1961 beyannameyên Mihemed Evdilmutewwelî. Beyrûd 1979, r. 438. Husnî Ezime bo vê lêkolînê amade kiriye.

www.arsivakurdi.org

PARTIYA KARKIR

# Heyfa mezin a çepê Îsraîlê

ZEEV STERNELL*

Drama bi rastî ya çepgirên karkir yên Îsraîlê -û ji ber wê jî ya tevahiya civaka Îsraîlê- bêhêziya wê ye. Sedemên vê yekê di bibinketina hilbijartinên 2009'an de jî tên dîtin, belê ev sedem ji yên derba dîrokî ku 1977'an li çepgirên karkir ketî ne bi gelekî cihê bûn. Hingî rastgir cara pêşî bûbûn desthilatdar. Ev sedem beriya her tiştî bi pêkhatina îdeolojîk a tevgerekê ve girêdayî ne ku jê nayê perspektîfeke paşerojê ji bo rizgarbûna ji du asêbûnan pêşniyar bike. Mijarên têde asê dibe jî neo-kolonyalîzm û neolîberalîzm in. Ji gelek Îsraîliyan we ye ku ew li ber serê nexweşekî giran in, heta li ber sere nexweşekî li ber mirinê ne.

Ev berjêrçûna ber bi dojehê ve, mirov nikare bi tesîra desthilatdarbûnê ve yan jî beridîna civakê ya giştî rave bike; lewra bêtaqetiya çepgiran, serê pêşî ji serketina Hezîrana 1967'an tê û paşê jî ji lihevhatinên dîrokî yên Osloyê yên sala 1993'an. (1) Dema bi vê erka dêw re rûbirû ma, çepê Îsraîlê ne bi tenê konformîzm (rihetîparêzî) û muhafezekariya xwe nîşan da, her wiha lawaziya xwe ya întellektuel û exlaqî jî.

Tevgera netewperest a cihû berê xwe hişk daye armanca ku Filistînê bi awayekî bêsînor bike cihê wargehên cihûyan, wê bike kolonî û di dawiyê de jî serxwebûnê jê bistîne. Di 1929'an de Berl Katznelson ev îdîa kiribû: *"Kar û emelê siyonîst, kar û emelekî dagirkirinê ye. Û ez dixwazim ku baş were fêm kirin, ji bo min terîfa eskerî ya vî karî, ne bi tenê hevokeke xîtabetê ye."* (2)

Ji bo ku vê dagirkeriyê rewa bike, tevgera siyonîst xwe spart mafên dîrokî yên cihûyan yên li ser welatê pêşiyên wan. Ji dawiya sedsala 19'an û vir ve, tevahiya tevgerên siyonîst bawer dikirin ku cihûyên Ewrûpayê li ber bobelatekê ne. Şerê Duyemîn ê Cîhanê wê ew mafdar bikira. Ji serketina 1948-1949'an re wê nîv sedsal amadekariyên gelekî zehmet biviya yên ku karkirên ji 1930'î ve desthilatdar ew bi rê ve birin.

Dengê teqîna guleya Hezîrana 1967'an veda: Çawa şîrove bikin û çi jê bikin? Gelo ev berhemên hesabekî şaş ê misriyan bû, ku ji tevgera karkir a Îsraîlê hat van berheman kom bike; erdên dagirkirî ji bo aştiyê weke pereyên hûr bi kar bîne, yan jî berovajî vê, ev encameke mantiqî ya şerê serxwebûnê bû? Gelo diviya ev weke derfeteke temamkirina karê di sala 1949'an de nehatî bi dawîkirin bihata dîtin, yan jî berovajî vê, li beramberî cîhana ereb bihata eşkere kirin ku siyonîzm di çarçoveya agirbesta 1949'an de gihîştiye armancên xwe, dagirkirina erdê û kolonîkirina wê ku heta avakirina dewletê ji bo man û nemanê diyarker bûn, êdî rawestiyane? Li ser serê cihûyan êdî banek hebû û dikarîn weke miletên din bibûna miletek.

Ji bo ku vê prensîba bi rastî jî şoreşgerane bi lev bikira û "xeta kesk" a 1967'an weke sînorê dawî yê erdên netewî qebûl bikira, diviyabû çepê Îsraîlê li ser koka nirxên gerdûnî heşîn bibûya, û ne bi tenê li ser taybetmendîparêziya çandî û siyasî ya neteweperestiyê. Û çend îstîsnayên kêm ne têde, elît û giregirên siyaseta karkir ne xwediyê wê hêz û kapasîteyê bûn ku li gorî vê prensîba gerdûnî tevbigerin.

Çend întellektuellen ku piştî 1977'an ji bo ku partiyê li ser hîmên nû ji nûve ava bikin, hewl dan bikevine nava siyasetê, neçar hatin hiştin ku îstîfa bikin, yan jî piştî şerê pêşî yê Libnanê (1982) dev ji siyasetê berdan. Li gorî dengqewînên tevgerê, ew ê tiştekî din ê nû neafirînin û bi şopandina riya ku du îdeologên çepê cihû yên sedsala 19'an, Aharon David Gordon û Berl Katznelson danî, razî bin.

Nîqaşa ku tevahiya hikûmetên karkir di navbera 1967'an û 1977'an de û paşê di salên 1990'î de kirî, ti carî armanca wê nebû sererastkirina doktrîna kevin a dagirkirina erdê, ne jî bû hewcedariya bi danîna hîmê paşeroja welêt êdî ne li ser mafên dîrokî yên cihûyan li ser erda Îsraîlê, belê li ser mafên xwezayî yên gelan hemûyan yên diyarkirina çarenûsa xwe bi xwe. Ev yekane nîqaş bû – û hê jî wisa ye – ku pêwendiya wê bi baştirîn şêwazê bikaranîna rewşa ji lawaziyan ereban pêk tê, heye.

Prensîba, ji bo ku em li beramberî hêzeke ji ya me mezintir, hindiktir bitirsin, em dev ji erdê bernadin, hê jî xurt e. Çêkirina wargehên cihûyan li nav erdên filistîniyan bi metodên îro dewam dikin, di bin desthilatdariya hikûmetên karkir ên di navbera salên 1967 û 1977'an de li ser hev hatî de dest pê kir: Çawa lê were, bi bahaneyekê erd tên desteserkirin, qanûn tên zîvirandin û qulibandin wan bi vir ve û wê de dibin û tînin, di navbera cihû û ereban de newekheviyê saz dikin. Tevî Lihevhatinên Osloyê jî, dema karkir hatin ser hukum di navbera 1992 û 1996'an û 1999 û 2001'ê de di pratîkê de ti tiştê esasî neguherî. Berovajî: Wan her tişt kir da ku bi hêrsa cihûyên wargehan û tevahiya rastgirên Îsraîlê re rûbirû nebin. Hêrsa van derdoran jî ji vê "xiyanetê" bû, ango li ser beşeke Filistînê li Rojavayê Urdunê qebûlkirina hin mafên ereban. Lê belê yekane rêbaza kêmkirin û hedinandina liberrabûna cihûyên wargehan û rastgiran hêsankirina dagirkirina erdê ye.

Di warê exlaqî û aqlî de karkirên ku bi kêra kêmkirina leza kolonîkirinê nehatin, belê ji wan hat bi lihevhatinên Osloyê re pêngaveke nû biavêjin. Îmzekerê lihevhatinan ê îsraîlî, Serokwezîr Îzak Rabîn, serketiyê şerê 1967'an, yê ku di 1995'an de ji aliyê neteweperestekî dîndar ve hatî kuştin, di nava nîv sedsalê de wê yekane lîderê siyasî yê ku ji fikr û ramanên dema xwe bihurî, bimaya. Lê ji bo wî jî diviyabû 20 sal derbas bibin û her wiha serhatiya 1982'an a li Libnanê di ser re bibihure, ji bo ku têbigihije, eger her du gel mafên hev ên netewî dualî qebûl nekin, dawî li şerê di navbera Îsraîl û filistîniyan de nayê.

Rabîn di vê gihîşt, lê berdêla wê jî bi jiyana xwe da. Lihevhatinên Osloyê ku nebaş li wan hatibû fikirîn û nebaş pêk hatin, dibû ku bi hebûna wî bihata sererastkirin: Ji bo bê şert û merc xwe bisipêre argumanên qalibgirtî ew zêde biaqil û pragmatîk bû: Mafekî milkaniyê yê sêhezar salî ku di yekemîn pirtûka mezin a nifşê mirovan de nivîsî.

Yek ji navdartirîn rojnamevanên Îsraîlê Yoel Markus carekê banga *"Obama, berê xwe bide Încîlê"* kir. Yoel Markus ev bêhtirî nîv sedsalê ye ku nêzî aliyê rast ê Partiya Karkir e. (3) Beramberî siyaseteke Amerîkî ku xwe li felaketa kolonîkirinê hindiktir radigire, wezîrê niha yê parastinê û yên nêzî wî hê jî bi ser prensîba li dijderketina cihûyên wargehan ve nebûne – tevî ku carinan hewl didin hin wargehên piçûk ên ji wan re "kovî" tê gotin xirabikin û carinan jî vê hewldanê bi ser dixin jî. Lê dîsa jî her cara ku mirov diwêrin behsa paşvekişîna artêşê ji erdên dagirkirî bikin, li hemberî gefxwarinên şerê navxweyî zû gava xwe paş ve diavêjin. Di destê wan de ji ferz û pêwîstiyên siyaseta navnetewî pêve tiştek namîne û navê vê yê din jî zextên Amerîkayê ne.

Bi qasî protestanên Alabamayê û cihûyên wargehan ên li Şerîa Rojava, kêfa Partiya Karkir a Îsraîlê ji serokê Amerîkayê George W. Bush û îdeologên wî yên neomuhafezekar re dihat. Lewra binketina Partiya Karkir a 2009'an ne siyasî bû, belê exlaqî û întellektuel bû. Û hilbijêrên çepê Îsraîlê xweş hîs kirin ku bi nebûna fikrekî nû, sedema hebûna partiyê nemaye. Lewra eger tişta ku fikrê Partiya Karkir pêşniyar dikir hemû bi zorê îstîhdamkirin û bibîrxistina dîrokê be, hingî ti sedem nîne mirov berê xwe bide kopiyeke bêreng, eger orjînal di şexsê Benyamîn Netanyahû de li ber destê mirovî be. Barak hêvî dikir xêr û bera "serketina" xwe ya piştî operasyona zivistana bihurî li dijî Xezeyê kom bike, û berdêla vê biryarê da.

Aliyê din ê pûç û kavilbûna îdeolojîk jî lê dihat: Siyaseta aborî û civakî. Ya rastî, Partiya Karkir, weke 'Mapaî' ya kevin a di 1930'î de hatî damezrandin (4), ti carî weke xwîşkên xwe yên ewrûpî nebûbû partiyeke sosyalîst. Şertên netewî yên li pêş, kirin ku ew hê di destpêka xwe de bibe saziyeke têra xwe taybet. Ew ne bi tenê dûrî parti-

** Dîrokzan, nivîskarê pirtûka* Koka Îsraîlê: Di navbera neteweperestî û sosyalîzmê de (Aux origines d'Israël: entre nationalisme et socialisme), *koleksiyona "Folio Histoire", Weşanên Gallimard, Paris, 2004.*

www.arsivakurdi.org

yên Léon Blum, Rudolf Hilferding (5) û marksîstên awusturyayî yên mîna Otto Bauer bû, ji Partiya Karkir a îngilîz a ku 1931'ê dest pê kir berê xwe da fitlonekeke ber bi sosyalîzmê ve jî dûr bû.

'Mapaï'yê, ya herî nerm jî têde, timî marksîzm li derveyî xwe hişt, kapîtalîzm û milkiyeta ferdî bi tenê li gorî pîvanên avakirina netewî, şîrove kir. Ji bo Barak jî, ji bo Şîmon Perez ê beriya wî jî modela mezin Antony Blair bû. Neo-muhafezekarên Amerîkî wî ji bo xwe weke model dibînin. (6) Û pêşengên Partiya Karkir bi rihetiyeke ku mirovan matmayî bihêle ber bi neolîberalîzmê ve şemitîn, ango ber bi fikra dibêje azadiya bazarê azadiya ferdî misoger dike. Armanca wê ya sereke ji destê dewletê azadkirina sermayeyê ye.

Hemin, karkir hemû prensîbên teorîk ên neolîberalîzmê qebûl nakin. Lê piraniya wan di pratîkê de wê erê dikin. Ji bilî hindikahiyekê, ew edaleta civakî weke yek ji xalên sereke yê azadiyê yên di destûra bingehî de nabînin. Ya rastî, tevahiya çepê Îsraîlê ji berê ve berhemên xirabe yê lipêşbûna mutleq a nirxên netewî kom dike, û ev yek jî xwe di çanda wan a siyasî de dide der: Îsraîlî hemû ji sê nifşan û vir ve fêr bûn ku nasnameya netewî û çandî timî li pêşiya berjewendiyên maddî ne.



*Cihû li sînagogê, Wien 1878, Tel Aviv Museum of Art, (Maurycy Gottlieb) - ILS. LMD kurdî*

Civaka Îsraîlê ne civaka pêşî bû ku ev fenomen dihat serê wê, lewra em ê grîngiya wê ya dîrokî nenepixînin: gelek komên civakî li ser navê nirxên netewî, çandî yan jî dînî dengê xwe li dijî berjewendiyên xwe yên aborî û çînî bi kar tînin. (7) Jixwe ev pîvan ji aliyê damezrênerên Îsraîlê bi xwe ve weke xala hevpar a tevahiya fatihên erda Îsraîlê -statûya wan a civakî çi dibe bila be- hat danîn: Dîroka wan, dînê wan û armanca wan a siyasî ya sereke; dewleta neteweya cihû.

Eger carekê berjewendiyên çînî li ser navê yekîtiya netewî hatin redkirin, tiştekî jê hêsantir nîne mirov yên ku li herî jêra pêlika civakî ne îqna û razî bike ku her başkirina asta jiyanê neçar bi azadiya bazarê mumkin e; taybetkirin û serbestkirina bihayan, mirov divê kêm- kirina baca hatina maddî jî ji bîr neke. Mirov bi vî awayî piraniya îsraîliyan razî dike ku kar jî bazarek e weke yên din e û "qayîşokîtî" jî sira serketinê ye.

Li beramberî van fikrên klasîk ên neolîberalîzmê, fikrê karkir ê Îsraîlê bêtaqetiya xwe dide nîşan. Beyî ku karibe rexneyeke gerdûnî li kapîtalîzma bazarê bigire, berê xwe dide hilbijêrên kal û bêmoral. Ev hilbijêr jî ne ji ber ku bawer dikin, lê belê ji ber ku weha fêr bûne dengê xwe didin Partiya Karkir. Bi demê re hejmara van hilbijêran jî weke bedeneke bi kul û janan jê kêm dibe, kêm dibe: Di Sibata 2009'an de dakete % 10'ê dengan, û di parlemanê de jî bi tenê 13 parlementerên wê hene. Ciwan ji partiyê reviyan. Filistînî, niha jî çînî û taylandî ev demeke dirêj e dikevin şûna karkerên ku berê dora wan ji aliyê sendîqe (Histadrout) û 'Mapaï'yê ve girtîbû. Di zanîngehan de êdî ti qîmeta milîtantiya karkiran nemaye.

Serkêşê berê Peres, dema ku sendîqevan Amîr Peretz ew di destpêka 2005'an de bir, dev ji partiya xwe berda û di bereya Kadîma de cihê xwe girt. Gelek hilbijêrên Partiya Karkir gihiştin wê encamê, eger piştî nîv sedsala di nava partiyê de, serokwezîrekî berê, hînê şev nequlibî sibehê, dikare cihê xwe di nav bereya dijber de bigire, hingî dev ji şerkirinê berdin, ev partî % sed ne xwediyê wan fikr û armancên stratejîk e ku hêja ye mirov ji bo wê deng bide. Dîsa jî di Adara 2006'an de Partiya Karkir % 15'ê dengan stendibû û 19 kursiyên di parle- manê de kiribû ku Peretz di hikûmeta Ehûd Olmert de bibe wezîrê parastinê – Olmert navendparêzekî ji Likûdê veqetiyayî û xelîfê Arîel Şaron bû, ji ber ku xwîn rijiya ser mejiyê wî ketibû komayê.

Berdevkê karmendên mûçeyê wan kêm û yên mûçeyên navî, nêzî civaka ku berê tevgera 'Aştî Niha' pêk dianî, yek ji şêniyên bajarê piçûk Sderotê, li beramberê Xezeyê, ji derdora ku fikrê Partiya Karkir qet nikarîbû bikeve navê, Rêzdar Peretz jinûve ruhberbûna hêviya sosyal-demokrasiyeke nû bû. Penaberên destpêka 1950'î ji Bakurê Efrîkayê hatî û nifşên li pey wan hatî, dikarîbûn xwe bi wî ji nû ve nas bikin. Ji Menahem Begin heta bi Arîel Şaron, ev mirov demeke dirêj heyranên figûrên mezin ên rastgirên netewperest bûn.

Piştî ku Serokwezîr Ehud Olmert red kir wezareta maliyê, wezareta ji bo siyaseta aboriyê ya hinekî din li gorî çepgiran, bide wî, Rêzdar Peretz wezareta parastinê qebûl kir. Çend hefteyan paşê, duyemîn şerê Libnanê ew malişt. Barak ê ku di vê navberê de bûyî karsazekî serketî cihê wî girt. Barak bi awayekî eşkere li salonên bakurê Tel-Avîvê rihettir e, ne li taxên xizan ê li başûrê bajêr, jixwe em li vir behsa bajarên piçûk ên dûrî navendên bajarên mezin nakin.

Binketina Partiya Karkir a 2009'an çi dibe bila bibe ji bo paşerojê elementeke erenî ye. Binketina partiyeke eskerên dewlemendbûyî serkêşiya wê dikin – roja piştî "serketina" Xezeyê ku gelek Îsraîlî ji ber wê şerm dikin – yan jî serketina Kadîmayê, pêkhatina ku jinek, canik Tzipi Livni serkêşiya wê dike (û ne hevrikê wê yê hişk, generalê berê Şaul Mofaz), îşaret bi aqlîselîmbûna gowdeyê hilbijêran dike: Eskerên xurt êdî bi awayekî otomatîk di hevrikiyeke siyasî de bi ser nakevin.

Pirsgirêkeke din heye ku her wiha partiyên sosyal demokratên Ewrûpayê jî dikeritîne: Nebûna serokatiyeke mezin. Ne- bûna hem fikr û hem jî mirovdewletên mezin ne nîşana hêviya siberojan e. Ev pirsgirêk ne ya Îsraîliyan bi tenê ye, lê belê ji bo wan ji her deverên din hindiktir dem maye.

**Nota wergêr:**

Di wergerê de karkir *(travailliste)* û *karker* (travailleur) ji hev hatine derxistin. Lewra li Îsraîlê berê Partiya Karker hebû û niha jî Partiya Karkir heye. Ji bo ku ev herdû ji hev werin derxistin, di wergerê di navên cihê hatin bikaranîn.

**Werger ji fransî**
**Lokman Turgut**

(1) Şerê 6 rojan û Lihevhatinên Osloyê.

(2) Di 'Zeev Sternhell, *Koka Îsraîlê: Di navbera neteweperestî û sosyalîzmê de (Aux origines d'Israël: entre nationalisme et socialisme)*, koleksiyona ''Folio Histoire'', weşanên Gallimard, Paris, 2004, rûpela 312.

(3) *Haaretz*, Tel-Aviv, 17'ê Tîrmeha 2009.

(4) Ji aliyê Ben Gourin û Golda Meir ve hat damezrandin, Mapaî – Partiya Karkeran a Eretz Îsraîlê – heta 1968'an desthilatdar bû.

(5) Sosyalîstê elman ê bi eslê xwe awusturyayî.

(6) Binêre li para wî ya di pirtûka *The Neoconreader*, di bin rêveberiya Irwin Stelzer de, New York Grove Press, 2004.

(7) Ji bo mînaka Emerîkayê bixwpine: Thomas Franck, *Ji bo çi xizan dengê xwe didin rastgiran (Pourquoi les pauvres votent à droite)*, Agone, Marsîlya, 2008.

www.arsivakurdi.org

ŞÎLÎ

# Tenê bi Bachelet'ekê bihar nayê

LIBIO PÉREZ*



*Bachalet, T- Ingrid Betancourt (Ben Heine) - Efekt LMD kurdî*

*"Ez jin, sosyalîst,bî û bê ol im. Ez çar gunehên mezin tînim cem hev. Ewçend jî bawerdikim ku emê bihevre karên baş bikin."*

Xanim Michelle Bachelet dema ku ji aliyê Serokkomarê Şîliyê Ricardo Lagos ve hatibû tayînkirin bi vê axaftinê silav li fermandarên artêşê kir. Ew di destpêka 2002'yan de bûbû wezîra parastinê. Ev meqam heta niha tu caran ji jinekê re nehatibû raspartin û ji dema hikûmeta Salvador Allende tu sosyalîst ev meqam bi dest nexistibû. Di adara 2006'an de, di nav heman rewşa ramînê de ewê were desthilatiyê, ku ji aliyê Concertation'a (lihevkirin) partiyan ve ji bo demokrasiyê hat anîn (concertación). Ev koalîsyona ku xiristiyan-demokrat, lîberal, sosyal-demokrat û sosyalîstan tîne cem hev, ji dema derbaseya demokratîk ve, sala 1989, Şîliyê birêdibe. Serokên berê Patricio Aylwin, Eduardo Frei û Ricardo Lagos ji wir dihatin.

Di dema desthilatiya xwe de, "Michelle'ê" (Mîşelê), -gelek Şîliyî ew wisa bi nav dikin- rêze bername û reformên arasteyî ji bo baştirkirina kalîteya jiyana gel danîn holê, bi sivikkirina bandorên modela aborî ya neolîberal ku di bin dîktatoriya General Augusto Pincohet de hatibû bicihkirin (1973-1989): Firehkirina sîgortaya tendurustiyê, piştevaniya zêdetirî milyonek kesî; avakirina toreke netewî ya zarokxaneyan (sê hezar û pêncsed heb heta 2010'an) ku bi encama vê zîndikirina tevlîbûna jinan a li bazara kar pêk hat...

Tevî vê yekê, di dused saliya serxwebûnê de, di Îlona 2010'an de, Şîlî wê nebe welatê "pêşketî" ku kevneserok Lagos ev soz dabû. Pêşbînî bêguman xwe dispart nîşaneyên ekonomîk ên salên 1990'î, û bi taybetî jî xwe dispart pêşveçûna navincî ya dahata hundurîn a brut (DHB), ku wê demê ji % 7,6 bû. Lê krîza asyayî ber li ev mezinbûna ekonomîk girt û di şeş salên desthilata Lagos de, DHB hema hema gihîşt ji % 4,3 (1).

Xanim Bachelet dema ku hat Qesra Moneda'yê ev rewş mîras girt. Di pêvajoya sê salên pêşî yên serokatiya wê de, DHB daket ji % 4,2 û temayûl daketinê didomîne: Krîza ekonomîk a gerdûnî bandor li ser daxwaz û bihayên paxirê (sifir, mis) jî kir, berhema bingehîn a Şîliyê di bazarên navnetewî de – ku nêzîkî ji % 50 yê îxracata paxirê ye.

Bi rasthatinî, hikûmetê tedbîrên hêvişîner girtibûn. Dema ku bihayên paxir di îxracatê de digihîşt fiyetên maksîmûm ên nedîtî - di serî de ji ber daxwaziyên Çîniyan –, wê ev dahat ji bo paşrojmendiyê veqetandin û zêdetirî 25,5 milyar dolar civandin. Banqeya navendî jî ji aliyê xwe de 24,2 milyar dolar rezerv qeyd dikirin. Destpêka 2008'an, dema nîşaneyên pêşîn ên lewaziya ekonomîk xwe dida hîskirin, serok (Bachelet) devê kîs vekirin. Ev e yek ji sedemên nasyariya wê ya mezin.

Wextê ku krîza gerdûnî bi cih bû, Xanim Bachelet, destpêka 2009'an, planeke bizavdarkirina kar (bêkarî ji % 10 derbas dibe), pakêteke piştgiriyên nû yên dewletî, programeke destekkirî ya veberhênanan arasteyî binesaziyan, tevî kapîtalîzasyona dezgeha dewletî ya paxir – Komeleya Netewî ya Paxir (Codelco) – di radeya 4 milyar dolar de, diyar kirin. Tedbîrên bergir ên ji bo "sînorkirina ziraran" bi mehan li dû hev dewam kir. Pejirandina alîkariyên nû, planên bizavdarkirinê yên di avakirinê de, programên arasteyî îstihdamkirina ciwanan.

Tevahiya van tenê digihîşt ji % 20'ên rezervên civandî yên wextê bilindbûna bihayên paxir. Lewra Xanim Bachelet karî projeyên "parastina sosyal" – arasteyî ji % 40 kesên herî xizan – û projeyên kêmkirina feqîriyê (di

* Rojnamevan.

www.arsivakurd.org

1989'an de ji % 38,6; îro kêmî ji % 13[2]) bidomîne. Hewldan, herwiha di warê perwerdehiya beriya dibistanê de jî hatin berdewamkirin, rêjeya xwendina li dibistanan ji % 16 derket ji % 36'î.

Wek serok, "Michelle'ê" ecêb kêfxweş e ji ber nasyariyeke derasayî ya di nav gel de – bi taybetî jî li herêmên bajarî (3). Bi îfadekirina vê piştgiriyê ku nayê guftugokirin, ew li gorî xwe binê tiştê ku taybetmendiya rêveberiya wê pêk tîne, xêz dike: "Nûjenbûn, ev tê wateya dabînkirina mafên sosyal ên domdar ji bo ku sererastkirina newekheviyan rasteqîn be di nav demê de. Ne mijara gotinê ye ku îro alîkarî bidî ji bo ku sibe wê paşve bigirî (4)."


Tu tişt wê ne hêsan bûya ji bo vê jinika ku di destpêka salên 1970'yî de ket nav Partiya Sosyalîst û bi coş tevlî Unîteya gel a Allende bû. Xwendina wê ya di beşa tibê de bi dawî bû ji ber derbeya dewletê ya 11'ê îlona 1973. Bavê wê, generalê artêşa hewayî Alberto Bachelet, hat girtin û piştî çend mehên di bin îşkenceyên giran de jiyana xwe ji dest da. Ew bi xwe jî – tevlî diya xwe Ángela Jeria – ji aliyê servîsên ewlekariyê ve hat revandin û danîn girtîgeheke nepenî ku ew li wir dûçarî şîdeta fîzîkî bû. Piştî bi awayekî çalak tevlîbûna wê ya berxwedana nepenî, wê mişextî nas kir li Komara Demokratîk a Almanyayê (KDA).

Bi vegera xwe ya Şîliyê, di salên 1980'yî de, ew tevlî têkoşînê dibe ji bo sazkirina demokrasiyê û bi buroyên parastina mafên mirovan re dikeve nava têkiliyan. Lê belê "fenomena Bachelet" wê di zivistana 2002'yan de çêbe, dema ku ew wezîra parastinê ye. Baranên pir zêde hingê taxên paytextê di bin avê de dihêle. Ew leşkerên artêşê dixe bin xizmeta dûçaran, bi xwe jî derdikeve ser tanqekê û çavdêriya xebatan dike. Ev dîmen bandoreke mezin li mirovan dike.

Ew di hilbijartina kanûna 2005'an de, ji bo serokatiya bloka Concertation'ê dibe berendam û derdikeve pêşiya du berendamên rastgir, karsazê kevneperest Sebastián Piñera û alîgirê Pinochet Joaquin Lavin, herwiha nûnerê çepgir ê derparlamenter Tomás Hirsch, ku ji aliyê endamên partiya humanîst û komunîstan ve dihat destekkirin. Ew di tûra duyemîn de bi girtina ji % 53,5 a rayan bi ser dikeve, ligel ku Piñera ji % 46,5 ray bi dest dixe.

Tevî vê yekê, Xanim Bachelet tu caran nebû favoriya elîtên polîtîk ên Concertation'ê; berendamiya wê berî her tiştî bi piştgiriya gel hat destekkirin. Bi zanebûna vê yekê, wê bi dayîna cihekî mezin ji bo tevlîbûn û şêwirmendiyên di warê polîtîkayên gel de pêşniyar kir welêt bi rê ve bibe; wê ekîbeke wezaretan ku di rêjeya jin û mêran de bihurmet, saz kir û di ekîbên xwe de "rûyên nû" bi cih kirin – hewldaneke ji bo nûkirina kadroyên rêveber.

Vê nêzîkahiyê şikberî û dijayetî derxistin holê. Di nav Concertation'ê bi xwe de jî, li ser kapasîteya wê ya rêvebirinê guman hatin bilêvkirin – gumanên dubarebûyî yên rojane ji aliyê mûxalefeta rastgir. Gelek faktoran rê li ber vê bîrbirinê vekir.



*Bachalet li Qesra Spî, (white house) - Efekt LMD kurdî*

Di destpêka desthilatiyê de, û li gorî krîterên sinifa polîtîk, tayînkirina hikûmeta wê zêde wext stand. Piştî du mehan berberiyeke xurt diqewime: zêdetirî yek milyon şagirtên hîndekariya navîn dirijin kolanan ji bo protestokirina asta lawaz a perwerdehiya gelemperî. Xwendekar, mamoste û malbatên şagirtan tevlî wan dibin. Bi qasî mehekê ew hikûmetê wek têkçûyî dinirxînin. Xanim Bachelet esasa xwestekên berberiyekê ku ne aîdê ajandaya wê bû û dibe sedema yekemîn ji nûh ve organîzekirina wezaretan, qebûl dike: Karmendên Wezareta Karê Navxweyî û yên Perwerdeyê tên guhertin.

Pirsgirêka hê mezintir, plana navgînên veguhastina gelemperî ya paytextê derdikeve holê. Ji aliyê hikûmeta Lagos ve sazkirî, wek Transantiago binavkirî û 9'ê sibata 2007'an merî bûyî, ev sîstema nû xetên otobusan, sixletiya wan, saziyên berpirs ên xizmetê diguherîne, û bilêteke elektronîk pêwist dike (5). Bi mehan, bi hezaran mirov mecbûr in bi saetan sebir bikin beriya ku karibin li otobusên qerebalix ku hejmara wan qet ne bes e li ber darêja rêwiyan, siwar bibin. Otobus dev ji derbasbûna ji taxên derdorî, û bi taybetî jî ji taxên şevnişîn berdidin, şêniyan neçar dihêlin riyên dirêj bi peyatî bimeşin ji bo gihîştina rawestgeha yekemîn. Ji kêfnexweşiya giştî wêdetir, xwepêşandan û pevçûnên carna bişîdet ên bi polêsan re, veberhênanên pêwist (di warê binesazî, mekîne, personelên nû û alîkariyên dewletî de) ji bo jiholêrakirina peyderpey a vê aloziyê wê bibin sedema zêdetirî yek milyar dolar lêçûnên ekstra ji bo dewleta şîliyî.

Xwestekên herêmî yên gel û qebîleyên Çermsoran, li Araucanía'yê, li başûrê welêt, di piştguh re hatin avêtin. Li vê herêma xizankirî, zêdebûna projeyên şixulandina daristanan û yên masîgiriyê xwecih û xwediyên biçûk ên çandiniyê veguherandin karkerên bimeaş ên demdemî, ku vê yekê berberiya sosyal zêdetir kir. Ji xeynî gelek binçavkirinên kêfî, du milîtanên ciwan ên çermsor *(comuneros)* di seferberiyên bi rêveberiya hikûmeta niha de mirin, hikûmeta ku teredut nekir qanûnên antîterorîst ên ji çaxa Pinochet bi kar bîne.

Wek encam, ligel pêşveçûnên bicihanî, Şîlî di warê newekheviyan de qeydkirina rekoran didomîne. Raporeke Programa Neteweyên Yekbûyî ya ji bo pêşketinê (PNYP), bi tarîxa 2005 (6) û qatjimara Gini'yê jî tê de – ku ew dereceya newekheviyê di belavkirina dahatan de dipîve – Şîlî danî rêza sed û dehemîn ku bi temamî sed û bîst û çar welêt hatibûn rêzkirin. Heman rapor diyar dike ku dahatên ji % 10 ên Şîliyî yên herî dewlemend 31,3 caran zêdetirî dahatên ji % 10 ên herî xizan in. Anketa li ser butçeyên malan a Enstîtuya Neteweyî ya Îstatîstîkan (ENÎ) a di navbera cotmeha 2006 û mijdara 2007'an de pêkhatî, derdixe holê ku di nav ji % 80 malên Santiago û yên berbajar de, dahat têrî nakin ji bo dabînkirina mesrefan, ku ew serî li krediya fermî û nefermî didin. Li herêmên herî hejar, dahata *per capita* (serê şexsekî) ya rojane hema hema zêdetirî 3 dolar e – ku nîvê wê diçe navgînên veguhastinê.

Pirsgirêkên sosyal ku Xanim Bachelet neçar ma rû bi rû bimîne, ne tenê mîrasa rêveberiyên berê bû. Bi binyatî, ew rehên xwe ji destûra bingehîn digirin, ku ev qanûn mîrasa dîktatoriyê ye û qezenc hatiye pîrozwerkirin wek motora sîstemê. Bi vî rengî, îslehata perwerdeyê ya ku ji aliyê xwendekaran ve dihat xwestin, rêveberiya dibistanan ên di destên piyasayê de û beşeke gelemperî ya demdemî û mehrûmên fonan dikirin armanc.

Ligel her tiştî, dema nirxandina çepa latîn-amerîkî mijara gotinê ye, popularîteya şexsî ya serokê, delaloka çapemeniyên biyanî – ku serokdewletê Brezîlyayê Luiz Inacio Lula da Silva jî xwedî heman pênasê ye –wê Concertation'ê zêde xelas neke. Concertation'ê yekemîn têkçûna xwe ya hilbijartinê di dema dengdanên şaredariyan de nas kir. Berendamê wê yê ji bo hilbijartina serokatiyê ya 13'ê Kanûna 2009'an, Eduardo Frei – serokdewletê berê (1994-2000) û xiristiyan-demokrat – wisa xuya dike ku zêde nikare piştgiriya ku Bachelet û Partiya Sosyalîst (PS) didin wî, mezintir bike. Li ser çepîtiya wî dijayetî derket holê, bi dorê ji aliyê Jorge Arrate (Bi hev re em zêdetir dikarin) û Marco Enríquez Ominami (serbixwe) (7) ve, ku ew herdu jî ji PS'yê veqetiyan.

Dibe ku kevneperest Piñera 13'ê kanûnê raya herî zêde bi dest bixe – lê bêyî ku bigihîje piraniyê. Frei, ku demeke dirêj wek raqîbê wî yê qethî dihat dîtin, dikare di tûra duyemîn a 13'ê çileyê de were şemitandin ji aliyê Ominami, ku vî li ser navê "navinceke çepgir a serbixwe" van mehên dawî quleke derasayî vekir. Encama dawî qet ne diyar e.

**Werger ji fransî**
**Aynur Bozkurt**

(1) Binêrin Fundación para la Superación de la Pobreza: www.fundacionpobreza.cl

(2) Bi nirxên navincî, li gorî Banqeya Navendî ya Şîliyê.

(3) Binêrin li anketa Centro de Estudios Públicos (CEP), tebax 2009: "Evolución de aprobación de gobiernos de Patricio Aylwin, Eduardo Frei, Ricardo Lagos y Michelle Bachelet".

(4) Binêrin li raporên Wezareta Plansaziyê: www.mideplan.cl

(5) Deh şîrketên mezin ên tîcarî şûna bi sedan şîrketên biçûk ên veguhastinê ku xizmeta gel dabîn dikir û ji bo hemû taxên derdorî şixul dikir, girtin.

(6) Programa Neteweyên Yekbûyî ya ji bo pêşketinê (PNYP), "Human Development Report 2005", New York, 2005.

(7) Kurê Miguel Enríquez, hîmdarê Tevgera çepgir a şoreşger (TÇŞ), ji aliyê leşkeran ve di 1974'an de hat qetilkirin.

www.arsivakurdi.org

PIRTÛKA MICHAEL CHRISTOFFERSON

# Dema ku Foucault piştgiriya "Felsefevanên Nû" dikir



*Rıza Topal, (Bênav)*

Michael Christofferson li zanîngeha Pennsylvania State University a Amerikayê profesorê dîroka hemdem e. Pirtûka wî ya bi navê "Les Intellectuels contre la gauche / L'ideologie antitotalitaire en France" (1973-1981, Agone, Marseille, 2009) nîşan dide, ka çawa teşhîrkirina totalîtarîzmê dibe pirek di navbera nivîskarên xwedî bîr û baweriyên cihê yên siyasî de. Rikdariya wan a li hemberî komunîzma Sovyetîk wisa li wan kiribû ku Bernameya Yekîtiya Çepgiran wekî sepandina şeşkoşeyî ya komunîzma Sovyetîk bibînin.

Di dîroka rewşenbîriya medyatîk a fransî de, sala 1977'an "Fîlozofên Nû", berî herkesê jî ya Bernard-Henri Levy û André Glucksmann bû. Wan êrîş bir ser bîr û bawerîyên şoreşger û pêşkevtîxwazên çepgir. Pirtûkên wan li serê lîsteya pirtûkên pirfiroştî de bûn. Pirtûka BHL a bi navê "Barbarie à visage humain" di nav du hefteyên destpêkê de 37 hezar hat firotin... Pirtûka AG a bi navê "les Maîtres Penseurs" jî di nêzîkî mehekê de 30 hezar hat firotin. Her yek ji van pirtûkan di nava salekê de 80 hezar hatin firotin. Serkeftina wan bû destpêka dewra antî-totalîtarîzma Fransî.

Rexneyên "Fîlozofên Nû" yên li ser îdeolojî û siyaseta çep, her çiqas pirolekirî be jî, di demeke taybetî de hatin kirin. Destpêkirina "Felsefeya Nû" li jêr pênîşandera Gulana sala 1977'an di demekê de hat ku di nav refên Yekîtiya Çepgiran de qeyraneke giran dest pê kiribû. Serkeftina Partiya Sosyalîst (PS) û Partiya Komunîst a Fransayê (PCF) di hilbijartinên şaredarîyan yên 12 û 20'ê Adara sala 1977'an de rêkeberî û duberkî di nav rêzên Yekîtiya Çepan de peyda kir, ji ber ku heta radeyekê di hilbijartinên giştî yên sala 1978'an de herkes li benda serkeftinê bû... PCF'ê daxwaz ji PS'ê kir ku Bernameya Hevbeş nû bikin... Partiyên hevpêyman li ser Bernameya Hevbeş dest bi gotûbêjan kir... Lê van hevdîtinan roja 23ê îlona sala 1977'an de bi şikestinê bi dawî bûn.

Di bihar û havîna sala 1977'an de "Fîlozofên Nû" bala çapemenîyê kişandibûn ser xwe. Ji ber ku wan behsa vê qeyranê dikir û pêşniyara awayekî gengeşekirinê yê din li wan dikir. Li her derê li ser "Felsefeya Nû" gengeşîyan dest pê kir û gihîşt radeya navenda siyasetê.

Bernameya televîzyonê ya bi navê "Apostrophes"ê ew derxistin ser sekoyê rojevê û mijara xwe " gelo fîlozofên nû çep in an rast in" bi nav dikir. Kovara *Le Nouvel Observateur* ji bo texmînên li ser hilbijartinên sala 1978'an di nav rûpelên xwe de beşek bi navê "Objectif 78" ê terxan kir û di wir de li ser "Fîlozofên Nû" gengeşî hatin kirin.

Rojnameya *Le Monde* jî li ser helwesta wan a siyasî hevpeyvîn li gel wan dikir. (1) Rewşenbîrên navdar piştgiriya "Felsefeya Nû" dikir û beramberî wê xweşbîniya xwe nîşan didan. Ji ber ku, wan ew ji aliyê siyasî ve erênî didîtin. Reaksiyona entelîjensîyaya nekomunîst li ser fikra ku totalîtarîzm berhema nerevîn a diskursa şoreşger e, di ahengek tewaw de bû. Bi taybetî jî wê dema ku qala dayîna roleke sereke ji bo dewletê dihat kirin û ji ber Yekîtiya Çepgiran Fransaya 1977'an jî di nava wê mijarê de bû.

Em nikarin serkeftina " Felsefeya Nû" bi tenê dewra mezin ku, çapemenî li nav jiyana rewşenbîriyê dîlize ve sînordar bikin. Rast e edîtorekî wekî Grasset, rêveberekî çapemeniyê yê wî beşî (Bernard-Henri Levi) hewil ji bo serkeftina nivîskarên xwe dan. Lê çewt e ku bawer bikin ku ji aliyê çapemenîya ji derveyî gorepana rewşenbîriyê ve li ser zemînê jiyana fikrî kargerî durust bûye. Berevajî, ev bîr û bawerî ji aliyê rewşenbîrên bi nav û deng û ên ku otorîta wan hebûn ve hatin niqaşkirin û berz hatin nirxandin. Ew hatin nav gorapana rageyandina çandî û siyasî, ji ber ku bîr û baweriya "Felsefeya Nû" dengvedanek siyasî dabû.

Pêwîst e ku mirov vê yekê jî bibêje, wekî mînak: Hewlên Roland Barthes yên ji bo piştgiriya "barbarie à visage humain"; yên Jean-François Revel yên ji bo "Felsefeya Nû" ... bi giştî. Bart-

hes xwe nêzîkî tespîtên Levî yên di derheqa "Qeyrana serdest a dîrokî" de didît û ji awayê wê yên nivîsînê "kêfxweş." (2) Revel li dij "Yekîtiya Çepan" piştgiriya "Felsefevanên Nû" dikir û destnîşan dikir ku ew piştgiriya şiroveya wî ya li ser "Bedhewlên Totoliter" dikin. Lê, dewra du kesayetiyên dî di vê pêvajoyê de sereke bûn.. Michel Foucault pesnê *Maîtres Penseurs* dida; Philippe Sollers jî bi kovara xwe a bi navê *Tel Quel* ve bû hevpeymanê

## Bernard-Henri Levi û "Felsefeya Nû..."

Foucault di kovara *Le Nouvel Observateur*'ê de gotarek belav kir û tê de piştgiriya xwe ya bê merc û jidil ji bo *Les Maitres Penseurs* nîşan da û pesnê wê dida. Foucault bikaranîna pirtûka xwe, ango Folie et Déraison a ji aliyê Glucksmann ve qebûl kir. Glucksmann di pirtûka xwe, *(La cuisiniére et le mangeur d'hommes)* de di nabeyna "Gulag " û "dîlîtiya mezin" a serdema kevin de paraleliyê dibîne. Piştgiriya Foucault ji bo Glucksmann bû sedema rexneyên gellek tûj ên Claude Mauriac û Gilles Deleuze. Li cihê ew dîsa li ser piştgiriya xwe ya ji bo Glucksmann bisekine, peywendiyên xwe ên dostane ligel wan birrî. (3) Têgihîştina Helwestên ku Foucault wergirtibûn weki ramanên Glucksman asan nebû. Bi taybetî konsepta Glucksman a li ser desthilat û hiş ligel analîzên kûr û hişk ên Foucault biyanî bûn. Glucksmann desthilatê bi dewletê ve girê dide û hebûna pleb (çîna rêza duyemîn) pêşbînî dike, ku beşek mezin ji vê çînê li jêr bandora Herdû saziyan derdikeve. Lê Foucault, di hîpotezên xwe de nûxwaz e û desthilatîyê berbelav dibînî.. Têgîna wî ya mîkrostrukturê bi şeklekî vekirî li dijî rêmana serweriya tîrbûyî ya di destê dewletê de ye. Ji bilî vê Glucksmann bi tewawi hiş (felsefî û Hegelî) û zanist ligel serdestiyê wekehev dike. Ev gavên Glucksmann ji secera Foucault re biyanî ne.


## Dijminatiya kevn a li dij dewletê û komunîzmê

Eger em bixwazin bizanin ji bo çi Foucault piştgiriya Glucksmann dikir, bê guman divê em li ser bikaranîna wî ya medyayê ya ji bo stratêjiya xwenasandina wî rawestin. Foucault di nav salên 1960'an de navdariya xwe a zanîngehê, di cîhana mezin a çandî de bi rêya kovarên rewşenbîrî û çapemenîya çandî ve navûdengtir kir. Di demeke kurt de wî bi riya çapkirina pirtûka *Les Mots et les Choses* ve gihişt statûya superstarê rewşenbîrîyê. Li ser pirtûka wî gellek hat gengeşekirin û di havîna 1966'an de pirtûka wî bû best-seller. Vê navûdengîya rewşenbîrî roleke mezin lîst û bû faktoreke giring ji bo hilbijartina Foucault a sala 1970'an a ji bo Collège De France.

Di salên 1970'yî de Foucault tîbûna xwe ji bo nasîna xwe li ser gorepana rewşenbîrîyê nîşan dabû û çalakiyên xwe geş kiribûn. Pirtûk li ser mijarên bi taybetî hemdem dinivîsîn. Her çiqas Glucksmann ramanên Foucault deforme dikirin, lê hevpeymanekî baş bû ji bo pêvajoya nasandina Fouccault. Di vê navberê de Pirtûka Foucault a bi navê *La volonté de savoir* li sala 1976'an kêmtir pêşwazî lê hate kirin, ku wekî wî hêvî dikir. Glucksmann di pirtûkên xwe ên baş dihatin firotin û ji aliyê rageyandinê ve bir germî pêşwazî lê dihate kirin de pesna bêsînor a Foucaultî dikir. Li gor Glucksmann piştî Marx, Foucault yekem kes e bi şeklekî sîstematîk "li ser orjîna herî aktuel a Dinyaya hemdem" difikire. (4)

Her çiqas Foucault ji bo xizmeta reklama xwe piştgiriya Glucksmann dikir, lê wî ev kar ji bo sedemên siyasî dikir. Wekî antî-komunîstekî serhişk, Foucault xwe bi beşek ji tevgera 1968'an didît. Li gor wî guherîna hikumetê nikare wan pirsgirêkên ku tevgerê anîne rojevê çareser bike. Foucaul berambERî îhtîmala serkeftina çepgiran şayîşdar bû. Wî digot *"pêwîst e ku şeklekî bikaranîna desthilatê ya din bibînin ku kesî netirsîne..."* Pêş hilbijartinên giştî yên sala 1978'an ji bo bîr û raya xwe li ser çepan bîne zimên Foucault ji ragehandinê ve hatibû vexwendin. Bersiva wî: ne pêwîste ez mil bidim wan, di nav 15 salên vê dawiyê de min û hinek kesên din siyaset ji nû ve tarîf kir. Pêwîst e ku çep xwe adapteyî vê siyasetê bike. Michel Foucault yek ji wan rewşenbîran bû, ji bo bervêdana PCF, piştgiriya wan kesan dikir, ji partiya navbirî diqetiyan.

Di dawiyê de Foucault piştgiriya Glucksmann kir. Ji ber ku nivîskarê Les Mots et les Choses bi vî awayî karibû nakokîya ku di salên 1970'an de de konsepta



Rıza Topal, (Bênav)

wî ya desthilatî û pratîka siyasî de hebû, çareser bike. Di vê pêvojoyê de Foucault dikaribû ramanên xwe bi dujmintiya xwe a kevn li dijî dewletê, li dijî saziyên navendî yên dî û rika xwe a li dijî komunîzmê ve girêbide. Ji bo Foucault, pirsa serekî ya sedsala 20'an a desthilatî ye. Li gora wî, ev pirsgirêka di pêşerojê de şaş hatibû fêmkirin. Di dawiyê de encamên kujende jê peyda bûn. Ji ber ku, pirs wekî pirsa dewlet û serweriyê hatibû fêmkirin, ne ku wekî pirsa rêzdarî/dîsîplînê... Ango rûçika desthilatî û zanînê kirde pêktîne. Li gor Foucault ji bo têgihîştina formên desthilatî û karanîna piçek kontrol li ser wan, pêwîst e ji tixûbê rêmanbûna serweriyê derbiçin.

Têgihîştina aliyê zorkerî ê desthilatî, bes nîne ji bo têgihîştina naveroka wê. Ji ber vê yekê jî pêwîst e dubare û bi temamî li ser wê bifikirin. Lewre desthilat hem berbelaw e û hem jî berhemdêr e, (di nav cestê me hemûyan de desthilat/hêz heye) Rehenda wê ya dîsîplînî dikare li dijî wê be ku Foucault jê re dibêje hewla secereyî. Ew wê bi awayekî zelal şîrove nake. Foucault li ser babeta navborî wisa dibêje: "Ew mîna şîrketeke weha ye ku ji bo bêresenkirina zanyarîyên dîrokî, wan azad dike, ango ew dikarin rêkeberîyê bikin, li dijî zordariya dîskursa teorîk, yekgirtî, formel û zanistî derkevin. (5)

Foucault, li ser vê babetê di sala 1977'an de gumanê dibe ser taybetmendîyeke xwazyar a şoreşê. Çepgiran nikaribûn ew sozên ku dabûn xelkê cihbicih bikin. Ji ber ku ew bêyî ku ji dîsîplînê guman bikin, li ser serweriya siyasî kanalîzebibûn. Ji wê jî zêdetir, siyaseta navbirî ji destpêkê ve şikestin xwaribû. Desthilata serwer nikare li ser dîsîplînê kargerîyeke mezin bike. Wekî Glucksmann, belku ji wî zêdetir giringîpêdana li desthilatê dîsîplînî li gor desthilatê serweriyê, Foucault pêşniyar dike, ku car û bar di demên xemnak de bikaranîna desthilatî li Rûsyaya pêş şoreşê de, dikare li gel bikaranîna desthilatî li Ewrûpaya Rojava bête hevberkirin.

## Nêzîktiya Gulagê û "Dîlîtiya Mezin"

Foucault di pirtûka xwe ya *Surveiller et Punir* de Gulagê dide ber saziyên dîsîplînê yên Ewrûpayê û yên Ewrûpayê bi "Dûrgeha Girtîgehê" bi nav dike. Di cîhekî din de, ew dibêje ku bikaranîna psîkanalîzmê a bi armanca fişarê a li Yekîtiya Sovyetê "dûrketina ji armanca psîkanalîzmê nîne" û ev "bernameya wê ya bingehî" ye. Wê dema Foucault destpêdike li ser nêzîktiya "Gulag" û "Dîlîtiya Mezin" dinivîse, ditirse ku hinek kes vê hevberkirinê bi kar bînin û hemû şiklê çewsandinê tev li hev bikin, PCF û Çepgiran têxe nav rewşa xweparastinê û bibe sedama xwe nûnekirinê. Ji ber yekê jî Foucault di çapa nû a *Surveilller et Punir*'ê de pêyva "Dûrgeha Girtîgehê" bi kar neanî. Foucault wisa difikirî ku *La Cuisiniere et le Mangeurs d'hommes* nakeve nav kemîna siyasî. Wî bi xwe li ser peywendiyên Gulag û dewletê lekolîn nekiribûn. Lê wî di nav rûpelên *Les Maîtres Penseur*'ê de bi navê kesên perawêzkirî, ku ew roleke sereke ya siyasî dide wan, rexneya li dijminên xwe didît. (Komunîstan, îdeolojiyên totalîter û dewletê) Bêguman ji ber vê yekê jî wî pesna pirtûka navborî dida. (7)

**Werger ji fransî**
**Alîxan Serhedî**

(1) Le Monde , 27 mai 1977

(2) Roland Barthes, "Letres à Bernard Henri Levi", Les Nouvelles Littéraires, 26 mai 1977. Faut-il bruler les nouveaux philosophes? NEO, Paris, 1978, p. 89-90.

(3) Michel Foucault "la grande colére des faits" et "Pouvoir et stratégies" dans Dits et écrits 1976-1979, Gallimard, Paris, 1994, p.277-281 et p.418-428. Claude Mauriac "il ne faut pas tuer l'esperance", Le Monde, 7 juillet 1977. Gilles Deleuze contre les "nouveaux philosophes", Le Monde, 19-20 juin 1977. David Macey, Michel Foucault, Gallimard, Paris, 1994, p. 394-397.

(4) Niilo Kauppi, French İntellectual Nobility: İnstitutional and Symbolic Tranformations in the Post- Sartrians Era, State University of New York Press, Albany, 1996, p. 134-136; David Macey, The Lives of Michel Foucault: A. Biography, Pantheon, New York, 1993, p. 189, Andrê Glucksmann, Les Maitres Penseurs, Grasset, Paris, 1977, p. 237

(5) Michel Foucault, "Pouvoir et savoir", "Cours du 7 janvier 1976" et "cours du 14 janvier 1976", dans Dits et écrits" op. Cit, p. 400-401, 160-174, citation p. 167, 175-189, citation p. 181.

(6) Michel Foucault, "Non au sexe roi", "cours du 14 janvier 1976" et " Enfermement psychiatrie, prison" dans Dits et écrits, op. Cit., p. 266-267, 189 et 335; Michel Foucault, "Surveiller et Punir": Naissance de la Prison" Gallimard, Paris, 1975, p. 305.

(7) Michel Foucault, "Cours du 7 janvier 1976", Michel Foucault, Crimes et chatments en URSS et ailleurs" "Pouvoirs et Stratégies" et " Questions a Michel Foucault sur la geographie" Dits et écrits, op. Cit., p. 166-167, 69, 418-421 et 32.

www.arsivakurd.org

BÎRMANYA

# Hilbijartina di bin siya lûleyên tifengan de

LOUIS ANDRÊ BOUCAUD*

Beramber fişar û handanên "civaka navnetewî", cûntaya leşkerî ya Bîrmanyayê hewl dide vegere demokrasiyê. Rezbera 1998'an, derbeyeke leşkerî, ew destûra bingehîn ladabû ku ji 1974'an ve welat pê dihate birêvebirin. Piştî du salan, cûntayê qebûl nekir encamên hilbijartinan, ku hîç ne bi dilê rayedarên leşkerî bûn, binase. Lê belê, ji hingê ve soz daye ku wê welatî demokratîze bike û bi wê mebestê jî "nexşerêyek" (road map) daye ber xwe, ku ew nexşerê ji aliyê fermandar Khin Nyunt ve, şefê servîsên îstixbaratê yên bihêz ku sala 2003'an bû serokwezîr, hatibû duristkirin…

Bêguman li gorî vê pîlanê biryar ew bû ku kongreyeke netewî bê berhevkirin ji bo darîştina destûreke nû, lê belê, pêkhênerên vê kongreyê –delegeyên bi piranî ji aliyê desthilatê ve destnîşankirî- kir ku muxalefeta demokratîk wê boykot bike. Her wê heyamê, Cotmeha 2004'an, fermandar Khin Nyunt ji ber reqabet û azweriyên şexsî yên du reqîbên xwe yên serekî anku fermandar Than Swhe û Maung Aye ve ji hikûmetê hate derkirin. Lijneya Dewletî ji bo Aramî û Geşedanê (State Peace and Development Council, SPDC), organa biryarder a sîstema dîktatorî, bi vî awayî xwe ji mirovekî wisa xelas kir ku bi rêya şaxvedana gelek torên di hemû alî û warên rêveberiyê de bi rastî bûbû dewleteke rasteqîne di nav dewletê de; û herwekî hemû selefên wî, ew jî bi gendelî, bi belavekirina bertîlxwariyê û bi rêkxisitna çeteyan dihate tawanbarkirin.

Lê belê, ne vesazkirinên li dû hev ên SPDC'yê –ji ber paqijkariyên ku hizbên dijber li dijî hev bi rêk dixistin- ne jî derkirina Khin Nyunt û bêdesthilatkirina servîsên wî yên îstixbaratî "nexşerê" binax nekir. Herwiha, ne jî tesîreke veguhastina paytextê îdarî ji Rangounê bo Naypyidawê, li navenda welatî, di mijdara 2005'an de, çêbû li ser vê meseleyê. Destûra nû, axirî di gulana 2008'an de, bi referandûma ku bi tenê li jêr serperiştiya SPDC'yê de bi rê ve çû hate pesendkirin.

Çend roj berî referandûmê, sîklona Nergisê başûrê Bîrmanyayê dêris kiribû, bi taybetî deltaya Irrawaddy'ê, depoya birinc ya vî welatiye, xistibû bin tesîra xwe; lê belê, tevî ziyaneke bêhed mezin ku digel netîceyên mirovî –zêdetir ji heştê hezar mirî û pênceh hezar winda- du beramber giran bûbû, Than Shwe biryar girt ku, bi tenê ji bilî li çend herêmên wêran, referandûm di berwara diyarkirî de bê birêvebirin. Dixwast bi vî awayî nîşan bide bê ka heta çi dereceyê rexne û şermezarkirinên nûnerên civaka nevnetewî piştguh dikirin –jixwe tehqîra wî ya beramber xelkê eyan bû-, û herwiha dil dikir biryardariya xwe nîşan bide û biçespîne ku tu tişt nikare rê li ber prosesa demokrasiya "çarçovekirî", ku wê meşrûiyet bidaya desthilata heyî, bigire.

Çaverê ye ku hilbijartinên 2010'an, wê heyama "têperrînê" bi dawî bikin ku piştî hilbijartinên sala 1990'an dest pê kiribû û Bereya Netewî ya Demokrasiyê (BND) û hevpeymanên wê bi rêjeyeke bilind serkeftibûn. Di hengava van du dehsalan de, stî Aung San Suu Kyi, Sekretera Giştî ya BND'yê ku bûye kesayeteke sembol ji bo beşeke mezin a gelê welatî, çardeh salan di bin çavdêriya hêzên dewletê de jiya. Nîsana 2009'an, emerîkiyek bi awayekî seyr çû di mala wê de; cûntayê ev yek bi hincet zanî û çavdêriya li ser stî Suu Kyi'yê bo hejdeh mehan dirêj kir.

Stî Suu Kyi'yê bizava xwe teşwîq kir ku wê prosesa hilbijartinan a layengir red bikin û doza sererastkirina destûrê kir. Li ser vê yekê, serê pêşî muxalefet bi yekdengî kete nava hewl û bizavê. Bi tenê çend kesan ji nav Committee Representing the People's Parliament (CRPP) (1) –bi taybetî Sekreterê Giştî Aye Thar Aung- û çendekan ji BND'yê, bêyî ku li ser navê rêxistinekê bang bikin, doza beşdarîkirina di hilbijartinan de kir.

Digel vê hindê, herçend şika kesî li wê hindê nebe ku netîceyên hilbijartinan, herwekî referandûma borî, wê di berjewendiya rejîma totalîter de bin, bîra beşdarîkirina di hilbijartinan de cihê xwe peyt dike di nav refên muxalefetê de, bi taybetî ji nav layengirên BND'yê û ji Konseya Mînorîteyên Etnîk (Ethnic Nationalities Council - ENC), ku mînorîteyên ji her meylekê di nav refên xwe de dihewîne. Lê belê, nebûna zanyarî û pêşbîniyan sebaret bi prosedûra hilbijartinan nahêle ku di wê bîra xwe de bi rihetî biryara xwe bigirin. Çend meh mane bo berwara hatî diyarkirin, lê belê cûntayê hêj jî tu şert û rêzikên prosesa hilbijartinê, ne derheqê navnûsiya [tomar kirin-serlêdan] partî û berendamên wan de û ne jî derheqê birêveçûn û serperiştiya dengdanê de, eşkere nekirine.

Herçi deqa destûra nû ye, bi taybetî pir kêm hate belavkirin: Bi tenê çend numûne hatine derxistin û ji meha Reşemeya 2009'an ve li piyaseya Rangounê têne firotin. Lê belê, bi bendên wê destûrê qedexekirî ye ku her çi kesê ku digel derveyî welat peywendiyan digire bibe berendam di hilbijartinan de; herwiha, dîsa di bendên destûrê de diyar dibe ku serdestiya artêşê teqezkirî ye û serfermandarê artêşê xwediyê hêz û desthilata fesxkirin û belavkirina parlamentoyê ye beramber her çi rûdaneke ku tê heye bibe gef û xeter ji bo asayîş û yekpareyiya welatî. Bi wê benda navborî pêwîst e ku rol û pileyên serokdewletî û serfermandariyê ji hev bêne cudakirin; bêguman, Than Shwe bi xwe zêde ne razî ye bi vê gorankariya muhtemel, lewre halêhazir ew her- du wezîfeyên serekî di destê wî de ne û statuko bêtir bi kêrî berjewendiyên wî yên şexsî tê.

Lê gelek fermandarên din ên ku xêrê ji qedîmîbûna xwe dibînin û sûdê ji çerxa sîstemê digirin, gir û dijminatiya xwe ya beramber SPDC'yê venaşêrin ji ber wî mercê jixwekirina ûnîformaya leşkeriyê ji bo qebûlbûna nav qada siyasetê, ku di destûra nû de hatiye. Lewre gava ku li parlemanê, an jî ji wê xerabtir li saziyeke sade ya herêmî rûdinine ser kursiya xwe ya wezîfeyê, hingî hêz û îmtiyazên ku îro fermandeyên wan didine bin hukmê wan wê ji destên wan derkevin. Herwiha, dizanin ku ew hemû nikarin kursiyekê di Konseya Netewî ya Ewleyî û Bergîriyê (KNEB) de, ku wê şûna SPDC'yê bigire, "rizgar" bikin: ev yek ne tenê wê bibe sebebê windakirina qudret û leza wan belku wê gelek bi kêrî leşkerên pile-nizm ên di artêşê de were.

Bi mebesta berbendkirina bilindbûna nerihetiyeke wisa, Than Shwe daxwaz ji çend layengirên xwe yên dilsoz kir ku post û pileyên xwe bi cih bihêlin da ku ji yên din re bibe numûne. Bi vî rengî, heşt wezîr, ji wan wezîrê rêl û jîngehê, fermandar Thein Aung, Wezîrê Endûstriyê, Fermandar Aung Thaung -ku bi awayekî pir çalak beşdarî kir di tepeserkirina keşeyên bûdîst de di rezbera 2007'an de- mecbûr man îstifa bikin. Heman tişt hate serê Fermandar Aung Thein Linnê Şaredarê Rangounê jî, ku li bajarê xwe murîdên bûdîst yên herî hişk û dilsoz serkut kirin û ber li xwepêşandan û çalakiyên wan girt.

Parlemana dahatû, -ku wê bi du meclis be- wê şeşsed û şêst û çar nûneran bihewîne, ku çaryekê wan leşkerên tayînkirî ne. Lê belê KNEB'ya ku wê li ser meseleyên bingehîn ên welatî baladest be, wê bi tenê ji yazdeh endaman pêk bê: serokdewlet û du wekîlên wî, serfermandarê artêşan û duyem fermandarê artêşan, herwiha hejmareke wezîrên (piranî kevne-fermandar) berpirs ji karûbarên navxweyî, karûbarên derekî, bergîrî, darayî, herêmên tixûb û rêl û jîngehê. Û gava herdu meclis serokkomarî destnîşan dikin û hildibijêrin, teqez ew wê serfermandarê artêşan be; êdî çi hêj li ser wezîfeya xwe be –di halekî wisa de divê ji wî postê xwe îstifa bike- çi berê serfermandarî kiribe. Xaleke dawî jî ew e ku yek ji wan du wekîlên serokkomarî, ku ji aliyê herdu meclisan têne tayînkirin, divê ji mînorîteyeke etnîk bê hilbijartin.

Bi wê merca dawî, dîktatorê bîrmanî girîngiya van mînorîteyan dipejirîne; lê belê, her mîna berê, dîsa li dû wê yekê ye ku rê û dirban peyda bike ji bo ber-

*Rojnamevan.

www.arsivakurdi.org



*Keçên Birmanî, (Ruth Schranz) - Efekt LMD kurdî*

bendkirina seng û karîgeriya wan di qada siyasetê de. Ev helwêsta wî di hengava gelek danişînên Konseya Netewî de baş eşkere bû, lewre hemû daxwaz û dawekariyên ku ji aliyê nûnerên wan mînorîteyan ve hatibûne dariştin û pêşniyarkirin, bi awayekî sîstematîk hatibûne redkirin.

Digel vê hindê jî, cûntayê pêdivî bi sazûmanên siyasî heye da ku wê di hilbijartinan de temsîl bikin û bi vî rengî baweriya raya navnetewî bi dest bixe. Serê salên 1990'an, Than Shwe bi wê amancê rêxistineke cemawerî ava kir bi navê Union Solidarity and Development Asso- ciation (USDA). Îro, ev kevne-serokê xizmetên psîkolojîk têgihiştiye û dilniya ye ku ji bo dabînkirina meşrûiyeteke demokratîk bo sîstema heyî, tu tişt bi qasî wan partiyên nûnerên mînorîteyên etnîk kêrhatî nîne, ku bo demeke dirêj şer û dijayetiyeke serhişkane bi rê ve birin li dijî hêza navendî.

Destûra nû bi tenê statûya Herêma Xwedanê Rêveberiya Xweser (Self-Administrated Division, SAD) dide "herêmên taybet", hejmar 1, 2 û 4 –deverên mînorîteyên etnîk ên hevtixûbên Çînê-, lewma rewş gelek aloz bûye li sertaserê tixûbê "navxweyî" ku du ji wan herêman, herêm numare 2 û 4, ji Bîrmanya ya mayî cuda dike.

Sala 1989'an, piştî herifîna Partiya Komûnîst a Bîrmanyayê (PKB) ku Çînê piştgirî didayê û yekîneyên wê hemû ji çiyayiyên ji cemawerên mînorîteyan pêk dihatin, bi pêşengiya Fermandar Khin Nyunt hindek danûstandinên teqezkirina agirbestê hatine kirin. Van grûban, bi amanca vegera bo nav cemawera netewî û jiyana giştî ya li welatî pêşniyar kir ku çekên xwe ragirin û herêmên xwe yên jeografîk, "herêmên taybet" ên binavbang, bi awayekî azad bi rê ve bibin heta ku proseseke nihayî ya lihevhatinê digihe netîceyên teqez û qebûl kirin ku gava ew roj hat ew beramber aştî û aramiyê çekên xwe daynin û sazûmanên xwe yên siyasî ava bikin.

Lê belê, ev çend salên dawî ne artêşa Bîrmanyayê –bi tesîr û dehfdana Fermandar Maung Aye, ku her ji serî ve û di binî re li dijî siyaseta agirbestê bû- berdewam zext li van grûban kirine da ku çekên xwe daynin bêyî ku beramberî çekberdana wan mafên zêdetir ji wan re bêne misogerkirin.

Ji Kanûna 2008'an ve, rûdan û aloziyên li herêmê çend beramber zêdetir bûne, ji ber ku artêşa bîrmanî her zêdetir hewl dide ku bi amanca îzolekirina wan grûban têkeve nav goşe û deverên di navbera van herêmên jeografîk de. Bersiva Wa'yên herêma 2 di cih de hat: ji rexekî re hêzên piştgiriyê yên United Wa State Army'yê hinartine herêma 4 ji bo alîkirina grûbên Akha, Lahu û Shanên Sai Lin'ê, ku hevalbendên wan ên serekî ne; amanc ji vê yekê hem ragirtina têkiliyeke erdî/deverî bû û hem jî teqezkirina parastina bajarê Mong La, çariyana stratejîk a vê herêmê, bû; di rexê din re, qedexe kirin ku di dan û demên diyarkirî de di ser ew çend pirên çeman re hatûçû bê kirin. Ji rexê xwe ve, artêşa bîrmanî qederê çar-pênc hezar leşker bi cih kirin li qeraxên rûbarê Salweenê û bircên pir qewî û mezin ava kirin raserî pira Tai Pingê, li ser rêya Mong Layê. Axirî yekîneyên Sai Linê wekî tedbîrên parastinê kend û kûrik kolan û binkeyên kontrolê bihêz kirin.

Serê sala 2009'an, dubendiya di navbera wan herdu hêzan de aloztir lêhat. USWA'yê li Taweungiengê, li devera Monghsuyê, avakirina pireke li ser rûbarê Salweenê, ku wê rêya têketina nav erd û herêma Wa'yê pir hêsantir bikira, da rawestandin; herwiha, gava Ye Myintê Serokê Îstixbarata Leşkerî ya Bîrmanyayê li Panghsangê, taxeke giştî ya Wa'yan, seredaneke resmî dikir, hêzên USWA'yê çekên eskorta wî jê standin û bi vî rengî kend û brîneke kûr vedan di laşê hêza rêveberiya navendî de.

Artêşa bîrmanî bi berdewamî numayîşa hêza xwe kir, bi taybetî li welatê Shanê, ku li wê derê Fermandar Kyaw Phyoyê berpirsê fermandeya li Kengtungê binecihbûyî, car bo carê ber û lûleyên tank û topên xwe yên li Çînê çêkirî bilind dikirin. Meha nîsanê, SPDC'yê eşkere kir ku bi destûra nû re hemû hêzên leşkerî wê êdî di bin desthilata artêşa bîrmanî de

bêne yekxistin. Lê belê, fermandar Ye Mint meha hezîranê pêşniyar li kevne-grûbên komûnîst kir ku xwe biguherînin û bi şêweyê tabûrên parastina serhedan di bin fermandeya berpirsên bîrmanî de xwe bi rêk bixin. Grûbên navborî, pêşniyara hikûmetê bi cemawerî red kir; li ser vê hin- dê, cûntayê nema karî qebûl bike ku avrûyên wê bêne hetikandin û rûmet lê bê şkandin, lewma her bi hêsanî hinek hincet dane pêş û çîniyên Kokangê li herêma 1 tawanbar kirin û êrîş birine ser wan.

Artêşa bîrmanî li wê derê her ji berê ve amade bû ji ber birreke şer û dubendiyên navxweyî ku hejdeh meh in hejma- reke serokeşîran, ku milîsên wan hevkat hêzên leşkerî yên bi navê Myanmar National Democratic Alliance Army'yê (MNDAA) pêk tînin, berhingarî hev dike û rewşa li herêmê aloz dike. Hevpeymaniya milîsên Kokangê, berev dawiya meha tebaxê bi vî rengî hate bêtesîrkirin û belavkirin; û herêmê şahidî li dubarebûna rûdanên sala 1993'yan kir, lewre heman aqûbet bû: Derkirina Rêveber Pheung Kia Shin piştî serkeftina artêşa bîrmanî. Li ser vê "rûdana" biçûk, Çînê xwe qet tev neda.

Hemû vedigere ser berxwedan û rika ku fermandarên bîrmanî wê bidin ber xwe di têkoşîna li dijî grûbên çekdar de, herwiha şert û mercên ku wê çarçova hemleyên dahatû daynin jî dîsa gelek girîng in di diyarkirina rewşa herêmê de. Shan State Army South (SSA-S) ya Serheng Yord Serk, ku binke û kampên wê xwe li tixûbên Taylandê, başûrê eyaleta Shanê, didin, her zêdetir leşkeran digire û perwerdeya kadirên xwe berfirehtir dike. Berxwedana Shana ku her digel muxalefeta demokratîk hilbijartinên dahatû boykot dike, mezintirîn hêza çekdar e ku hêj jî têdikoşe li dijî cûntayê, û karîgerî û hukmê wê li welatê Shanê ewqas fireh bûye ku êdî digihe ji sêyan du beşên herêmê, lewre bi berdewamî çalakiyên xwe yên teblîxê bi rê ve dibe li wê derê.

Lê belê, tevî alozî û dubendiyên şedîd, hêj baş ne diyar e bê ka rewşa navçeyê wê vegere ser milmilaneyeke giştî: ne tenê ji ber ku menfaeta hîç yek ji layenên heyî di wê yekê de nîne ku hemû hêzên xwe rakêşine meydanê da şerê heta dawiyê bikin, belku bi taybetî ji ber ku "biragewre" Çîn tu caran nahêle ku li ber deriyê wê şerek biqewime û menfaetên wê yên aborî û stratejîk têk bide. Divê herwiha neyê jibîrkirin ku Çîn xwedanê karîgeriyeke gelek mezin e li ser wê beşa cîhanê. Çîn, bi dengekî berz û bi eşkereyî radigihîne ku bi tu awayî desttêwerdanê di karên navxweyî yên Bîrmanyayê de nake; û herçend bi rengekî nerasterast piştgiriya wan mînorîteyên etnîk ên cîranên xwe bike jî, di meydana navnetewî de Çîn, ji bo meseleyên leşkerî, dîplomatîk û aborî, hevalbendê serekî yê rejîma dîktator ya Bîrmanyayê ye.

Çîn bi vî rengî yariyeke durexî dike di navbera desthilata Naypiydaw û mînorîteyên wê de; girr û nerihetiyên di navbera layenan de, li gorî pêdivî û berjewendiyên xwe yên wê gavê, car gurr car aşt dike. Durist berî Yariyên Olîmpîk ên Pekînê yên 2008'an, Çînê bi hemû layenan dabû zanîn ku bi tu awayî rê nade rûdanên tundrew li dorûberên sînorên xwe.

Bîrmanyaya ku bi xwe jî xwedanê samaneke girîng e –kan û rezervên wê yên xazê di binê behran de-, bûye dergehê serekî ji bo îxracata ku ji Yunnana Çînê tê kirin. Herwiha, Bîrmanya dirbek e ji bo gihiştin û kelkwergirtina ji deryayên germ –bêyî ku xwe li zehmetiyên li avtenga Malaccayê bidin-, dergehek e ser bi Rojhilata Navîn û petrola wê, û ser bi Efrîqayê… Helbet çav û dêna Hindistanê jî li ser samanên xwezayî ye û herwiha bazara potansiyel ku Bîrmanya ji bo bazirganên Hindistanê dinimîne hoyeke din a çavçiliya Hindistanê ye. Lê belê, fermandarên li îktidarê jî bi rexê xwe ve gelek çak dizanin bê ka çawa dikarin nirx û sengê xwe ragirin di vê reqabeta di navbera hêzên wekî Çîn, Hindistan… û Rûsyayê de.

Pekîn jixwe gelek beşdariyê dike di veberhênanê de, di duristkirina binesaziyê û bernameyên geşepêdana çandiniyê de li Bîrmanyayê. Herwiha ji bo têkoşîna li dijî bazara tiryakê ku li serê wan bûye bela, rayedarên Çînî ev sê sal in hewl didin ku bernameyeke çandiniya alternatîf bi cih bikin li şûna çêkirina tiryakê. Bi mebesta qanihkirina xelkê herêmê da ku dest ji çandina xaşxaşka afyonê bikêşin, rayedaran îstifade ji betilîna rêlan [deforestation] a li herêmên 2 û 4 kirin û çandina darên kaûçukê handa. Ev bernameya hanê bi rêvebirina wan şirketên hikûmetî tê bicihkirin ku pavana xwe li ser sektorê danîne û beramber vê yekê hemû lateksa tê hilberîn ji cotkaran dikirin. Şêniyên hemû gundan dest avêtine vî karî û çandiniya daran dikin li ser zemînê bi hezaran hektaran, li ser çiyayan ku qasî bînahiya çavan hukmî lê dike şitlên kaûçukan lê diyar in.

Lê belê, herçend rast be ku karkerên xwecih gelek zêde û mişe ne, bi sedan hetta bi hezaran karkerên çînî jî, ku şirketên Hong Yu û Nong Chan tînin, dest û mil didin vî karî. Rê û rêbazên çandiniya kevn li vir kevn bûne, lewre rêbazên avdana otomatîk û pêşketî hatine bikarxistin da ku mezinbûna daran û berhemdariya wan teqez bikin: boriyên li ser hezaran kîlometreyan ku bi pompeyên ceyranê têne bikarxistin, avê ji rûbarên li nîveka newalê re hildikêşin. Lê belê, gelek gundî jî hene ku pir nerihet in ku bi çavê xwe şahidiyê li firotina erdan bo şirketên çînî dikin (bo numûne li herêma 4, nîvê erdên çandiniya darên kaûçukê yê rêveberê herêmê Sai Lin û yê din di bin hukmê şirketa Hong Yu de ye) û ku dibînin ku ew bi xwe bi tenê bûne rêncberên sade li ser zevî û zemînên berdar ên welatê xwe. Bi heman rengî, ev bernameya çandiniyê rêyê xweş dike ji bo pêla koçberiya çîniyan ku her zêdetir dibin li eyaleta Shanê û eyaleta Karen jî tê de li Bîrmanyaya mayî.

Çîn her bi vê hindê qayîl nabe. Lehiya berhem û malzemeyên xwe yên firotinê radike li bazara bîrmanî û bêşermane madeya xam a vî welatî talan dike. Îxracata dara tîkê [dareke pir biqîmet ku li wê herêmê pir e], ku qedexekirî bû, di 2008'an de ji eyaleta Kachinê re dîsa dest pê kir; herwiha, karbona ku ev çend salên dawî ne li eyaleta Shanê ji kanên komirê tê derxistin, piranî dibe para Çînê. Bi heman rengî, Çîn, bi taybetî li eyaletên Kachin, Shan û Karenê, razemeniyê di avakirina bendavên hîdroelektrîkê de jî dike; qet dudiliyê jî nake ku cihê Taylandê bigire gava ku Tayland (beramber kêmasî û astengên darayî yên ji ber qeyrana aborî ya cîhanî) xwe ji hindek projeyan, wekî projeya avakirina bendava Ta Sangê li ser çemê Salweenê, vedikêşe.

Bi mebest û vîzyona teqezkirina rezervên mezin ên enerjiyê ji xwe re, Pekînê di 2005'an de hemû rê dane ber xwe da ku xaza bîrmanî ji nav lepên Hindiyan derxe û niha pîlan kêşaye ku hêleke lûleyên veguhastina xazê û yeke neftê ava bike ku gava ew hêl di 2012'an de tewaw dibin, wê wan xaz û petrolan ji termînalên ji avên kûr ên lengergeha Kyaupyuyê, li ser dûrgeya Rameeyê li rasta Arakanê, veguhêze heta Kunmingê, li Yunnanê.

Pragmatîzm û vîzyona wê ya dûredemî dike ku Çîn tu rewt û pêkhateyeke siyasî li Bîrmanyayê piştguh neke da ku bikare xwe li her çi guherîneke di rejîmê de biguncîne. Lewma gelek caran, li şûna ku bi tenê şandeyên wan qebûl bike, ew bi xwe qasidên xwe dişîne seredana nûnerên meylên cihê yên muxalefeta demokrat û mînorîteyên etnîk. Dîsa, herçend pêwendiyeke taybet û cuda rabigire jî digel grûbên serekî yên ku agirbest îmze kirin, Çînê van heyamên dawî elaqeya xwe ya sebaret bi berxwedana çekdar a Shanê nîşan da (2).

Çîn wê ji niha û pê de qedrê mînorîteyên etnîk bigire û digel wan danûstandinan bike, lê belê ne ji ber rejîma dîktator ya Bîrmanyayê lê ji ber hindek sebebên din. Di rexekî re jî nakokiya Bîrmanyayê pir eşkere ye: Tevî ku hikûmeta navendî hêj jî naxwaze behsa serxwebûn an jî hema berfirehkirina otonomiya mînorîteyan bibihîze, wê tu carî evqas pêdivî bi van mînorîteyan nebûbû ji bo meşrûkirina ragirtina desthilatê.

Bi ya berpirsekî muxalefeta demokratîk ku zanyariyên xwe ji çavkaniyeke nêzîkî desthilatê wergirtibûn, endamên ekîba ku wê di hilbijartinên 2010'an de bi ser keve, her ji niha ve diyarkirî ne: fermandar Than Shwe wê bibe serokdewlet, û du layengirên wî yên serekî, Kevnewezîrê Endûstriyê Aung Thaung û rêveberê herî karîzmatîk ê mînorîteya Pa-o'yê Aung Kham Hti (3) jî wê bibin wekîlên serokê dewletê. Her çi rayedarê rêza duyê yê niha Fermandar Maung Aye ye, para wî serfermandarî ye û Fermandar Thura Shwe Mannê layengirê dilsoz ê Than Shwe, ku gelek caran wekî xelefê wî behs lê tê kirin, wê wekîliya wî bike. Heke ev senaryo bê bicihkirin û ev proses bi vî rengî bi dawî bibe, cûnta hem wê îstiqrara artêşê biparêze û hem jî wê cih û pozîsyona xwe ya serokatiya dewletê peyt û saxlemtir bike.

**Werger ji fransî**
**Ergîn Opengîn**

(1) Ev meclis, wan hemû nûnerên hilbijartî di bin banê xwe de dicivîne ku piştî ku cûntayê encamên hilbijartinên 1990'an qebûl nekiribûn dabûne ser rêya sirgûnê.

(2) Dawiya 2005'an, Çînê, bi rêya rayedarên Kunminganê, ku fişar birine ser Pangshsana herêma giştî ya Wa'yan, mudaxile li başûrê eyaleta Shanê kir da ku brakujiya di nava cemawera Wa'yan de bide rawestandin.

(3) Ev keşeyê bûdîst ê ji miqamê xwe yê dînî dûrxistî û kevne serokê serhildêrên Pao National Organization (PNO), di salên 1990'an de pişta rejîma dîktator girt.

**Bi kirtî Bîrmanya**
**Zemîn:** 676.578 kîlomêtre kare.
**Paytext:** Naypyidaw.
**Nufûs:** 48.137.741
**Nufûsa aktîf [yên ku kar dikin]:** 27.916.632
**Nufûsa ku li jêr darezînga xizaniyê dijî:** 32,7 % (30,7 % li Laosê, 25 % li Hindistanê, 10,1 % li Taylandê)
**Hasilaya Nesade ya Navxweyî (HNN):** 55,1 milyar dolar (37,4 milyar euro) di 2008'an de.
**Rêjeya mezinbûna aborî:** 1,1 % di 2008'an de.
**Pişka sektorên karî di HNN'yê de:** çandinî (40,9 %); xizmet (39,2 %); endûstrî (19,8 %)
**Bazarên serekî:** Tayland (52,6 %), Hindistan (12 %), Çîn (9,2 %), Japonya (4,4 %).


**Çavkanî:** *bes heke çavkaniyeke din nehatibe diyarkirin*
The World Factbook,
Central Intelligence Agency (CIA).

LI KÊLEKA ÇEPGIRÊN KU LI AMERÎKAYA BAŞÛR DESTHILATDAR IN

# Zapatîstên kevnemode...

Hikûmeta Meksîkayê, 13'ê di Tebaxê de, bi rêya dadgeha bala ya dadweriyê, 20 ji wan milîsên ku di Kanûna 1997'an, li Acteala herêma Chiapasê, çil û heft tzotzilên binkî (endîjen) kuştibûn, serbest berda. Bi şêwazeke bêtir nepenî, fişar berdewam e li dijî Zapatîstan ku hêj jî "li binî û li dijî çepgiran" ber xwe didin. Diyar e ku Zapatîst li herêmê "otonomiya" xwe bi rê ve dibin, lê belê li ser sehneya siyasî ya Meksîkayê hinekî veder û îzolekirî mane.

BERNARD DUTERME*



*Jîna Zapatîstî, (Shepard Fairey)*

*Hûn ketine nav erdê Zapatîstên serhildêr. Li vir gel fermanan dide û hikûmet rîayet dike."* Lewheya mezin a hesinî ku derbasbûna nav deverên asiyan îlan dike, herçend zer û jengî bûbe jî, hêj jî xweş diyar e. Li Oventicê, li herêma Chiapasê, ev qederê panzdeh salan e ku "otonomiya fiîlî" li kar e. Vê carê bi biryardariyeke zêdetir, lewre şorika xwe xwaribûn ji meşa xwe ya 2001'an a bi ser Meksîkoyê de û lewma, piştî destpêka sedsala XXI'an, Zapatîstan biryar girt ku pê de pê de berê stratejiya xwe bidin ber bi deverê ve. Bi piştgiriya zêdetir ji milyonek layengirên ku darijiyabûne navenda bajarî, çûbûn – bi bêhûdeyî– doza wê reforma destûrî bikin ku di çarçoveya peymanên San Andrés de hatibû destnîşankirin. Ev peymana navborî, di 16 Şubat 1996'an de digel hikûmetê hatibû îmzekirin (1).

Heyameke paşvekêşiyê da dû, ku ev yek serê pêşî şaş hate famkirin li bal "zapatîzant"ên Meksîka, Amerîka û Ewrûpayê, û paşî, wisa hate şîrovekirin ku tevger bêhêvî bûye ji bidestxistina guherînê bi rêya siyaseta yasayî û dev ji wê rêyê ber dide. Lê belê, ev hewla avakirina "cîhaneke din", bi duristî li wî cihê ku ji ber marjînalîzasyon û dîskrîmînasyonên di 1 Çile 1994'an de bi hezaran gundiyên Maya bi çekan serî hildan, cewhera fiîlî ya rastiya vê serhildana derasayî pêk tîne.

2003'an, nêzîkî çil şaredariyên zapatîst hatine dabeşkirin di nav pênc caracole'an (herêmên otonom) de: Oventic, Morelia, La Garrucha, Roberto Barrios û La Realidad. Hind jî lijneyên hikûmeta baş *(juntas de buen gobierno)* hatine damezrandin ji bo rêvebirina wan. Delegeyên komalan *(cemaet)* –jin û mêr– bi dorê berpirsiyan hildigirin û her dewreke berpirsiyê qederê yek an du heftiyan dikêşe: kargêriyeke kolektîf, ufqî [asoyî] û rotatîf [zivirok]. Bi ya Marcosê wekîlê serfermandarî, ku hêj jî berdevkê tevgerê û serokê eskerî yê Artêşa Zapatîst a Azadiya Netewî (AZAN) ye, ev baştirîn rê ye ji bo xweparastina ji dek û dawên hêz û desthilatê, wekî gendelî û dûrketina ji xem û kêşeyên rojane… Gelo serkeftî bûne?

Ev şaredariyên otonom nebûne biheştên li ser erdî, lê belê rêjeyên neçûna dibistanê, kêmasiyên xurekî û mirina zarokan –ku berî 1994'an herî zêde li vê herêmê hebûn– dadikevin. Bi xêra sepandina deqîq a "yasaya ziwa" *(ley seca)*, ku pêkhateya jin a tevgerê doz lê dikir, rêjeya alkolxuriya zêde –nexweşiyeke berbelav heta hingî– herwiha tundiya xêzanî û bedreftariya digel jinan ku bi navê herêmê re bûbû yek, gelek kêm bûne.

Di warê dadweriyê de, çûna berev bi usûlên gelêrî –herçend ji eşîrgeriya edetî azad bûbe jî– ne bêbela ye û dibe sebeb ku rewşên aloz ên "pirseriya dadwerî" rû bidin. Lê belê, digel hinekên din, antropolog Mariana Mora diyar dike ku êdî li caracol'a Moreliayê, ji bo çareserkirina kêşeyên xwe yên erdî, dizî û hevberdanê, bi qasî melez û binkiyên zapatîst ewqas jî nezapatîst *"ji saziyên fermî bêtir berê xwe didin dadgehên otonom."* Bi baweriya ku yên duyem *"dadmendtir"* û *"kêrhatîtir"* in.

Aliyê aborî bêguman pir aloztir e. Li nav komalên otonom, torpîl û asîstansîalîzma [ew alîkariyên dewletî ku hevwelatiyan dikin bendeyên xwe] li hemberî dewletê ji 2003'an ve qedexekirî ne, lê belê vê rewşê rê li ber bendeyiyeke din vekir: bendeyiya ji bo alîkariyên ji hevgirtina ne-hukmî, navxweyî û navnetewî. Herçend hevaheng be jî digel dînamîk û pêşaniyên Zapatîstan, ev hevgirtin nikare wê pergala bêqaîde û bendeya alîkariyê hilweşîne. Herwiha, yên ku heqê têketina halxweşan a di nav sîstema aborî ya netewî û cîhanî de didin, hêj jî gelê binkî yê gundewarên herêma Chiapasê ye. Koçberiya ku tesîreke mezin li komalên asî jî dike delîla vê yekê ye. Zapatîst an na, binkiyê chiapasî dizane ku li Cancùnê (Meksîko), li DYA'yê an jî li cihekî din dikare zêdetir qazanc bike ji xwegirêdana bi zeviya xwe ya bêber ji bo çandina genimokan, ku xêr û bêra wê jî nemaye ji cerga ku Peymana danûstandina azad a bakurê Amerîkayê (Pdaba) rê li ber mişe- berhemiya agro-endûstriya [endûstriya çandiniyê] amerîkan vekir.

## Çermesorên Chiapasê yên balkêş

Chiapasa dewlemenda serkaniyên xwezayî, bêguman warê veberhênanê ye; lê belê, halêhazir çi di warê çandiniyê de be, çi di yê petrol, xaz, daristan û madenan de be ev potansiyela herêmê piranî bi kêrî sermaye- darên Amerîkî, kolombî, spanî û yên din tê. Rûyê herî radîkal –lewre rûyê herî aşkera- yê vê talanê, birêkxistina bazara tûrîz- ma herêmî ye. "Balkêşiya Çermesorên Chiapasê", "raza" wê ya pêş-Colombî, "mişetiya xwezaya wê ya parastî/desttênedayî" herêm veguherandiye xewnewarek ji bo geştiyarên li dû averêbûneke kultûrî ya dilrihetkirinê, ji bo yên li dû sehneyeke egzotîk a mirovan û têkiliyeke razîmend digel cîhanê… Digel vê hindê jî, sûdwergirên pêşî yên vê dewlemendiyê çend şirketên navnetewî yên geştiyariyê ne bi *"formûlên xwe yên ekotûrîstîk ên hemû mesref daxil"*, lê ne Maya ne, ku sedî 70'ê wan duçarî kêşeya kêmxurekiyê ne.

Di ser vê yekê re, pareke biçûk ku asiyên Zapatîst "bi şêwazeke tewaw deryasayî" ji wan geştiyaran distînin ku serweta rojane ya gerokekî heyran û heyirî dimezêxin li wir, ji hewleke kêmşans a veguherandina meyla serdest bêtir wekî derbirîneke sembolîk û bêzerer a daxwazeke rewa ya verêkxistin û vebelavkirinê tê ber çavan.

Bi gotina fermandarên asî, gefên sereke yên li ser projeya wan a otonomîparêz û *"netîceyên wê yên hander di warên tenduristî û aboriyê de"*, stratejiya dij-serhildanî ye ku di van çend salên dawî de rayedarên Meksîkoyê xerîk in bi cih dikin. Stratejiyeke pirhêl ku, ji ber newêrîna dana bedelê siyasî yê jinavbirina eskerî ya AZAN'ê, an jî, bi pêçevane, ji ber muzakereyên neserkeftî, ji sala 1994'an ve zal e li ser mandîtiya gelê asî û her bêtir dibe sebebê bêzarbûna fîzîkî û psîkolojîk a komalên otonom.

Gemaroya eskerî ya deverên asî –sed û hejdeh binke an padîganên artêşa federal, ji wan pênceh û heft li ser erdên komalan bicihkirî-, gef û warguhêziyên bi darê zorê, "destekkirina" komên paramîlîter, birrîna elektrîk û sabotajên muxtelif, pîjkirina dubendî û nakokiyên di navbera rêxistinên gundiyên

* Dîrektorê Centre tricontinental (Cetri), Louvqin-la-Neuve (Belgique), www.cetri.be

www.arsivakurdi.org

binkî de, bi taybetî bi rêya bexşandina unwanê xwedantiyê li ser erdên ku Zapatîstan vegirtine... Ev hemû, rewşa heyî xerabtir dikin. Heftiyek jî derbas nabe bêyî ku lêkdaneke kêmzêde tund neqewime û devereke cawa civakê ji bo demeke dirêj nedirriyê.

Endamên rêxistinên ne-hikûmî (RNH) yên lokal û nêzîkî komalên asiyan hêj jî geşbîniya xwe diparêzin. -Herçend *"AZAN bi xwe jî nekare bi deqîqî piştgiriya li dû xwe bipîve, lewre hinek tevgerê diterikînin hinekên din digihinê"*, çalakvanên van rêxistinan qebûl dikin ku hejmara Zapatîstan *"li çav deh sal berê kêmtir bûye."* Lê belê baweriya wan her tekûz e li ser vê hindê ku tevgera wan *"tevgereke dijsîstemî"* ye, *"nayê serkutkirin"*, *"ji hergavê zêdetir biryardar"* e û *"dozeke demdirêj dike." "Her digel sîstemên perwerde û tenduristiyê, kolektîfên çandiniya ekolojîk hêza jiyanê didine otonomiyê."*

Digel vê hindê jî, vederiya wan a siyasî li herêmên din ên Meksîkoyê, rewşa asiyan naziktir dike. Marcos bi xwe dipejirîne ku: *"Modeya Zapatîzmê buhurî."* Û gelek dengên ji eniya çepgir a Meksîkoyê berpirsiya wê yekê dixine stûyê şexsê wekîlê serfermandarî bi xwe. Ji tesîrên misoger ên her çi rûdaneke medyatîk û tengasiya mecbûrî ya mobîlîzasyoneke civakî bêtir, stratejiya netewî û navnetewî ya rêveberê AZAN'ê ye di xeterê de.

Sebebên dûrketina tedricî ya rêxistin, roşinbîr û tevgeran ji Zapatîzmê gelek bin jî, hilbijartinên giştî yên 2006'an ev derz pir firehtir kir. Ji "Kampanyeyeke cuda" ku ji aliyê Marcos ve li kêleka kampanyaya hilbijartinê ya fermî hatibû birêxistin, ji bo mobîlîzekirin û bilindkirina têkoşînên "li binî û li dijî çepê", herî zêde "dij-polîtîzma" [antî-polîtîzm] wî ma di bîran de, û bi taybetî, êrîşên bênavber ên li dijî Andrés Manuel Lopez Obradorê berendamê favorî yê eniya çep. Helbet ev yek bêsebeb nebû –li Chiapas û herwiha li Kongreya Meksîkoyê, pêkhateya wî ya siyasî, Partiya Şoreşa Demokratîk (PŞD), gelek caran "xayîntî" li doza zapatîst kir: carinan lêkdanên xwînî li Chiapasê di navbera binkiyên zapatîst û layengirên PŞD'yê de diqewimîn; di 2001'an de dengdana PŞD'yê ji bo qebûlkirina



*Zapatîst (Ezra Niesen) - Efekt LMD kurdî*

"yasaya binkiyan" ku bi vê yasayê, peymana San Andrés bi awayekî qetî dihate redkirin; menfaetxwaziya siyasî û gendeliya di nava partiyê de; nezelaliya bernameya aborî ya M. Lopez Obrador...

Rexneyên hişk ên wekîlê serfermandarî jî têra xwe çepgirên Meksîkoyî nerihet kirin ku bi piranî û bi hemû cihêrengiya xwe li pişt berendamê PŞD'yê bûne birc û beden. Aciziya li hember Marcos gelek zêdetir lêhat gava piştî hilbijartinan hat û berendamê çepgiran ji ber hîleyên ku serkeftina wî ji dest wergirtibûn îtiraz kir –serokdewletekî ji rastgirên muhafezekar û neolîberal, Felipe Calderon, serokatiya Meksîkoyê bi dest xist.

Ji bilî "ezamet" û "zîgzagên wî yên siyasî", rexne li Marcos têne girtin ku Zapatîzm ji sehneya Meksîkoyî û navnetewî der kiriye bi biçûkdîtina dînamîkên din ên şoreşger li Amerîkaya Başûr, bi gunehên xwe yên ji ber qurretiyê, bi destnîşankirina rêya tevgerê ji her gavê hişktir di gavekê de ku nejidiliya xwe ya rêbertîkirina li pêvajoyê her derdibirrî... Aşkera ye, lew wekîlê serfermandarî hinek xeletiyên hilsengandinê qebûl dike. Lê belê, herçend peşîman be jî, bi taybetî ji ber zêde-şexsîkirina AZAN'ê di hengava qasidiya xwe ya bihêz de, Marcos bi mafdarî heyirî ye li pêş bêbawerî û bêîtibariya sebaret bi xwe li bal wan kesên ku heta duhî ew wekî berdevkê bêqusûr ê serhildanekê dihebandin ku bêyî wî, serhildanê wê ji çil û heşt saetan zêdetir bala cîhanê nekêşaya ser xwe.

## Lîman herêmî, îdeal gerdûnî

Vederiya Zapatîstan, ku rastî ye, pêdivî bi destnîşankirineke deqîq heye. Di fermiyetê de, AZAN'a ku bi "kampanyayeke cuda" welatê ku li pey mînorîteyên asî –civakî, etnîk, cinsî, neslî...- ye hejand, hêj jî bi rikeberî bawerî bi "pêkaniya tevgereke netewî ya dij-kapîtalîst a çepî", ufqî, bingehî û derveyî her çi temsîliyet, qasidî an jî saziyeke siyasî tê. Serê 2009'an, bi helkefta 15'emîn salyada raperînê civîneke nû ya navnetewî pêk hat li Chiapasê: Festîvala hêrsa birûmet. Bêguman, biçûktir bû ji "civînên bêhed mezin" ku ji sala 1996'an ve dihatine birêkxistin, lê belê vê "helkeftê" dîsa jî bijareyeke baş a roşinbîr û siyasetmedarên latîn-Amerîkî, tevgerên binkî û gundî yên netewî û navnetewî, ji wan Via Campesina, gihandine hev (2).

Bi herhal, her çi biqewime jî ji vê serhildana serhedên Meksîkoyê, hêjayiya wê di wê yekê de ye ku ji binkeya xwe ya deverî giyan daye îdealeke etîk û polîtîk ku êdî gerdûnî ye: rêvebirina doza bernameya vebelavkirina erdî digel doza bernameya hatin-naskirinê. Pêşî, bi rêya hilgirtina çekan, paşî bi rêyeke aştiyane, li gor şert û mercan, li gor hevsengiyên hêzê û bi rêya adaptekirina stratejiyên xwe yên xwemalî. *"Em dixwazin yeksan lê cihêreng bin"*, dubare dikin fermandarên wan di nav kulikên [kumê rûpoş] xwe de ku bûye sembola seyr a pesendkirineke nasnameyî.

Herçend piştî serhildana 1994'an a ji bo *"demokrasî, azadî û dadweriyê"* negihiştibine armanca xwe ya vesazkirina Destûrê, azadkirina saziyan, demokratîkkirina welatî, hêj jî berdewam karîger in li ser biryarên civakê di Meksîkoyekê de ku di warê siyasî de asê bûye û bi temamî vekirî ye bo bayên serdest ên ekonomiya globalbûyî.

Zapatîzm bi vî awayî tevkariyeke mezin li wan tevgerên çermesoran dike ku li Meksîko, Bolîwya û li cihên din, diçespînin –li ser zemîneke nazik- ku naskirina cihêrengiyan nayê wateya veguherandin û deformekirina nasnameyan an jî "şoka medeniyetan", û ku ew dikare hevaheng be digel têkoşîna ji bo dadweriya cemawerî û dewleta mafparêz.

Bi qewlê sefheya yekem a guftûgoyan ev reforma destûrî bi maf û kultûrên gelê binkî ve dadiket. Ji ber pêknehatina sepandina wan, sefheyên din ên guftûgoyan -bi taybetî yên li ser dawakariyên sosyo-ekonomîk ên AZAN'ê- pêk nehatin. Tevgereke navnetewî Via Campesina ji cerga avabûnê, sala 1993'an, ji bo mafê ewleyiya xurekî û ji bo rêzgirtina li gundiyên biçûk û navîncî têdikoşe.

**Verger ji fransî**
**Ergîn Opergîn**

(1) Ev reforma destûrî, ji bo merheleya yekem a gotûbêjan, bi maf û kultûrên gelê binkî ve dadiket. Ji ber pêknehatina sepandina wan, merheleyên din ên gotûbêjan –bi taybetî yên li ser daxwazên sosyo-ekonomîk ên AZAN'ê- pêk nehatin.

(2) Tevgereke navneteweyî Via Campesina, ji cerga avabûna xwe ya di sala 1993'an de, ji bo mafê ewleyiya xurekî û ji bo rêzgirtina li gundiyên biçûk û navîncî têdikoşe.

www.arsivakurdi.org

BIRÎNÊN ŞÎLIYÊ HÊ JÎ VEKIRÎ NE

# Doza dîktatoriyekê

NIRA REYES MORALES*

General Augusto Pinochet, 16'ê Cotmeha 1998'an, bi pêşengiya dozgerê spanî Baltazar Garzón, di encama peywireke navnetewî de li Londrayê tê girtin. Ew mecbûr e bersivê bide li hemberî sûcên ku di salên dîktatoriyê de pêk hatibûn (1973-1989). Ev bûyereke ne mimkun bû, ji bo wî kesê ku hê berî bi çend mehan jî serokê fermandariya giştî ya artêşa Şîliyê bû û difikirî di detayên herî biçûk de jî ew ê xwe ji cezayan mûaf bigire. Dîsa, ev bûyereke nemimkun bû, ji bo qurbanên zordariyê ya ku ji aliyê vî generalî ve hatibû pêkanîn. Ev general di 11'ê Îlona 1973'yan de, bi saya derbeya leşkerî, serok Salvador Allende qelibandibû û hatibû ser desthilatiyê. Ev bûyer bûbû jêderka sê pirtûkên Jac Forton, Xavier Montanyá û Martha Helena Montoya Vélez.


Nivîskarê gelek pirtûkên li ser dîktatoriya Şîliyê û mîlîtanê mafên mirovan Jac Forton pêvajoyê ji nû ve tîne ziman; Pêvajoya ku dikaribû General Pinochet û çardeh leşkerên din ên şîliyî bişîne ber edaleta fransiz, da ku ew hesabê bidin ji ber jiholêrakirina çar mîlîtanên çepgir ên fransiz a di dema dîktatoriyê de (1). Prosedura hiqûqî li dû piştî girtina Pinochet a li Londrayê dest pê kir û di sala 2007'an de jî, bi talîmata şandina ber Dadgeha Sezayên Giran bi dawî bû. Îca ji ber ku dîktator beriya wê bi çend hefteyan mir, ew ê êdî ne li Fransayê, ne jî li Şîliyê karibe were darizandin. Lê belê hemsûcên wî yên hê sax dikaribûn li Parîsê bihatana darizandin. Mehkeme pêwist bû di gulana 2008'an de were pêkanîn, lê ev bi awayekî demnediyar hat taloqkirin. Îca niha derengmayîna edaleta fransiz û fetlanekên prosedurên navnetewî bûne mijara edaletê ji ber daxwaza malbatên qurbanan.

Ji bo hin kesan, tenê şerê çekdarî dikaribû ji heqê zordariya dîktatoriyê were. Di sala 1986'an de, Eniya Welatparêz Manuel Rodríguez, ku milê çekdar ê Partiya Komunîst a Şîliyê bû, biryar da General Pinochet ji holê rake. Rojnamevanê katalan Xavier Montanyá serboriya hin kesên vê hewldana sûîqestê, ku Pinochet bi awayekî ecêb jê xelas bûbû (2), radixe ber çavan. Ev kesên ku piştî sûîqestê hatibûn derdestkirin, îşkence li wan hatibû kirin, cezayê mirinê li wan hatibû dayîn û di girtîgeheke pir biewle de dihatin girtin, di Çileya 1990'î de gihîştin miraza xwe û ji girtîgehê reviyan. Ev bûyer çend roj beriya teslîmkirina desthilatiya Feneral Pinochet pêk hatibû. Pinochet desthilatî teslîmî Mîrza Patricio Aylwin kiribû, ku vî camêrî jî bi awayekî demokratîk hatibû hilbijartin. Lê belê Şîliya "derbaseya demokratîk" nexwest efûyeke giştî derxe û wan kesan azad bike. Piraniya wan mecbûr man welêt biterikînin – hin ji wan jî hê jî bi tehdeya mehkemeyan re rûbirû ne.

Martha Helena Montoya Vélez, ji bo ku utopyaya şoreşa aştîxwaz a Salvador Allende bibîne, hatiye Şîliyê. Ew wê demê xwendekareke ciwan a kolombî bûye. Di ser hatina wê re hê zêde wext derbas nabe û ew ji ber *derbeya leşkerî* (3) bi zeptûrept tê derdestkirin. Di îlona 1973'yan de ew bi qasî mehekê di stadyûma netewî ya Santiago'yê de girtî dimîne. Ku ev stadyûm wek navenda îşkenceyê dihat bikaranîn. Bi saya xîreta konsolosê Kolombiyayê, ew tê azadkirin û bi dilekî şikestî vedigere welatê xwe. Bi piştgiriya diya xwe ew bi ser xwe ve tê û li ser wan hefteyên wek xewnereşkê, bêdengiya xwe diparêze. Heta ku wê *"wan birînên xwe yên di bin kirasên curbicur de veşarî (4)"* karî ji dilê xwe derxe, bi qasî bîst sal derbas dibin. Çîroka wê ya ku bi forma rojnûsên kirt û bibandor hatiye sazkirin, xwendevanan dixe nav vê "labîrenta êşê." Di wê labîrentê de jin bi ser hev de hatibûn komkirin, heqaret li wan dihatin kirin, îşkencekaran dest diavêt wan û ew mecbûr dihatin hiştin ku rûxîna mêr û hevalên xwe temaşe bikin. Çîrokeke dojehê, bê kîn û tijî mirovatî.

**Werger ji fransî**
**Aynur Bozkurt**

* *Rojnamevan.*



*General Augusto Pinochet (çizgisel) - Efekt LMD kurdî*


(1) Jac Forton, *Pinochet, le procès de la dictature en France (Pinochet, doza dîktatoriyekê li Fransayê)*, Editions Toute Latitude, Paris, 2009, 189 rûpel, 17,80 euro.

(2) Xavier Montanyà, *Les derniers exilés de Pinochet. Des luttes clandestines à la transition démocratique (Mişextiyên dawîn ên Pinochet. Têkoşînên nepenî yên di derbaseya demokratîk de)*, Agone, Marseille, 2009, 220 rûpel, 18 euro

(3) Derbeya dewletê.

(4) Martha Helena Montoya Vélez, *Rompre le silence. Je t'accuse Pinochet (Dawîlêanîna bêdengiyê. Ez te sûcdar dikim Pinochet)*, Elytis, Bordeaux, 2009, 207 rûpel, 19 euro.

www.arsivakurdi.org




*"Qîmeta perê xwe bizanibin", Gazeta Mercantil*

EURO

# Piştî deh salan çi encam?

Dehemîn salvegera euroyê (1), ku dikeve nav vê qeyrana cîhanî, bû mijara şîroveyên pir kêmtir pesnder li gor wê lehiya pêşbîniyên pozîtîf ku sala 1999'an çaxê derhatina euroyê ji bo destpêka euroyê rabûbû. Wê çaxê, takepereyê hevbeş wekî sertackirina avahiya aborî ya Ewrûpayê dihate tesewurkirin û hizra serdest ew bû ku gorankariya navborî wê herwiha rêçika entegrasyona siyasî dabîne, wê bibe helkefta li-hev-nêzîkkirina aboriyên dewletan berev modêleke mezinbûna aborî ya biteraz û pêbawer, û dawî, alava reqabetê beramber Dewletên Yekgirtî û dewletên di geşedanê de.

Aborînas Otmar Issingê bavê doktrîna Banka Navendî ya Ewrûpayê (BNE), ku berî bibe serokê Navenda Lêkolînên Darayî li zanîngeha Frankfurtê endamtiya Dîwana Bundesbankê kiribû, paşî bûbû endamê Lijneya Rêveber a BNE'yê, hîç hewl nade ji bo rewa-nîşandana biryarên ku di hengava destpêkirina euroyê de û di heyama wî ya rêberiya li BNE'yê de hatibûne girtin: Krîterên konverjansa aborî [krîterên ji bo nêzîkkirin û yeksankirina sîstemên aborî yên dewletên ku dibin pişkdarên euroyê], rika dij-enflasyonîst ku bi destê desthelateke hişk a rêziknameyan dihate sepandin, redkirina belavkirina zebtên lijneya rêveberan [organê serekî yê biryargirti-nê di BNE'yê de], polîtîkaya dowîzê ya ku zêde guh nedida encamên euroyeke bihêz, hwd (2). Lê belê heke em meseleya tetmîna takekesî li rexekî bihêlin, kîjan îşaret teşxîsa "serkeftin"ê rewa didêrin? Ji hemûyan girîngtir teraz û îstiqrara bihayan û berfirehbûna herêma euroyê ne ku li gorî kahînên bedbextiyê yên mîna Milton Friedman ew herdu aliyên polîtîkaya BCE'yê wê bibûna sebebên îflaseke zû, lê diyar e pêşbîniyên wan xelet derketin.

Kitêba kolektîf The euro at 10 (3) ku bi dîrektoriya Kenneth Dysonê profesorê ji Cardiffê hate belavkirin, teşxîseke hûrbîntir dabîn dike. Berhema ku li dû boçûna siyaseta aborî ya navnetewî hatiye birêkxistin, cihêrengiya sektoran, hêman û hokarên serekî yên qada aboriyê û xweseriyên aborî yên dewletên pêwendîdar bi hev re dinirxîne. Kirteyeke makroekonomîk a giştî bi aşkerayî nîşan dide ku mezinbûna aborî lawaz e, rêjeyên kar dîsa daketî ne û herwiha dahatên malbatan her ku diçe kêmtir zêde dibin; bêguman ev yek di heman demê de nakokiyek e digel bilindbûna qazancan, bi taybetî qazancên darayî. Lê belê Dyson balê dikêşe ser berdewamiya cihêrengiya aboriyên netewî û gelek encamên çaverênekirî yên euroyê. Kitêb digihe wê qenaetê ku pirsên çarenekirî hêj jî gelek in.

Dysonê ku digel Danois Martin Marcussen hev-dîrektoriya kitêbeke (4) sebaret bi bankên navendî kirî, vê carê paradoksa BNE'yê radikêşe ser mexderê: Saziyeke bi yekcarî wêdeyî netewan [ser-netewî] û xwedana doktrîna xwe, lê di warê sazûmanî de nebûna desthelateke siyasî ya bi pileyeke qiyasbar jê re kêşeyan durist dike. Ewrûpîkirina ku ew derdibirre berî her tiştî serkeftina doktrîna darayî ya aboriya alman, anku ya "sîstema ordo-lîberal" e bi şêweyê hêzeke "sist" ku herwiha di pakta îstiqrar û mezinbûna aborî de jî derdikeve pêş. Lê belê, em bi ti awayî nikarin bibêjin ku yekgirtina li dora euroyê, taybetmendiyên bankên navendî yên netewî, meseleya "şefafiyê" jî tê de, bêtesîr kirine an jî jê birine. Wekî din jixwe karîgeriyên wê vedigerine ser şiyana dewletan ji bo sepandina polîtîkayên budceyî û darayî yên nisbeten otonom. Her beşeke kitêbê pesend dike ku pêwîst e pûte bi şert û çarçoveyên netewî bê dan ji bo têgihiştina layenên vê avahiya ser-netewî.

Dawî, Les banques centrales sont-elles légitimes (5) [Gelo bankên navendî meşrû ne, navê kitêba behskirî] dimîne wekî meydanekê ji bo rewtên zanista aboriyê yên serdest ku, herwekî Civaknas François Simiand bal dikêşa serê, li pêş ti abstreksiyon an jî ezoterîzmê paşkişiyê nake. Bo mînak hizreke kitêbê dibêje ku "heke nelihevî û nakokiyên ku diqewimin li ber çav bêne girtin, duyemîn baştirîn polîtîka, hewldanek e ji bo nehêlana pêkhatina nazikiya darayî lê belê ne teşebuseke giran a mudaxilenekirinê gava ku îflaseke darayî bi pêş tê". Tiştê ku em têdigihin: Herçend di teoriyê de bazar [piyase] ti caran îflas nekin jî, di pratktîkê de, divê banka navendî, carinan, di rewşeke qeyranê de, wan xelas bike.

FRÉDÉRIC LEBARON

**Werger ji fransî**
**Ergîn Opengîn**

---

(1) Di nav herêma euroyê de şazdeh welat hene: Almanya, Fransa, Spanya, Îtalya, Belçîka, Luksembûrg, Hollanda, Portekîz, Awusturya, Fînlanda, Îrlanda, Qibrîs, Malta, Slovakya, Slovenya, Yûnanistan.

(2) Otmar Issing, The Birth of the Euro, Cambridge, Cambridge University Press, 2008, 296 rûpel, 15,99 £.

(3) Kenneth Dyson, The Euro at 10. Europeanization, Power, and Convergence, Oxford University Press, Oxford, 2008, 472 rûpel, 50 £.

(4) Kenneth Dyson, Marcussen (ed.), Central Banks in the Age of the Euro. Europeanization, Convergence, & Power, Oxford University Press, Oxford, 2009, 384 rûpel, 55 £.

(5) Jean-Philippe Touffut (dîr.), Les banques centrales sont-elles légitimes?, Albin Michel, Paris, 2008, 308 rûpel, 22 €.

**Le Monde Diplomatique kurdî**
Ji aliyê Rûdaw Media GmbH
ve tê weşandin

**Edîtorê giştî**
Faysal Dağlı

**ALMANYA**
**Le Monde Diplomatique kurdî**
**(kurmancî)**

**Designer**
Mehmet Nazmi Demir

**Şêwirmenda weşanê**
Berîvan Aymaz

**Rêvebirê hunerî**
Hasan Hüseyin Deveci

**Verger**
İbrahim Seydo Aydoğan,
Aynur Bozkurt, Cemil Denli,
Ergîn Opengîn, Alîxan Serhedî,
Lokman Turgut

**Asîstant**
Semra Polat
Sharo İbrahim Garip

Tlf: 00 49 (0) 221 26 00 40 02
Fax: 00 49 (0) 221 26 00 49 81
info@lemondediplo-kurdi.com
www.lemondediplo-kurdi.com

Rûdaw Media GmbH
Gutenbergstr. 63a
50823 Köln / Almanya

**KURDISTAN**
**Le Monde Diplomatique kurdî**
**(soranî)**
Ji aliyê Rûdaw Media
Company ve tê weşandin

**Edîtora beşa soranî**
Nazend Begîkhanî

**Rêvebirê hunerî**
Husên Hîmatî

**Designer**
Baxtiyar Mistefa

**Verger**
Muhsîn Ahmed, Amir Ahmad,
Hardy Mohammed, Kawa Dastoorrah,
Mesûd Diryaz, Ahmedê Mela

**Asîstant**
Selam Sadî

Tlf: 00 964 (0) 750 488 56 96
info@lemondediplo-kurdi.com
www.lemondediplo-kurdi.com

Rûdaw Media Company
Caddeyî 100 Metre, Hewlêr,
Kurdistan / İraq

**FRANSA**
**Le Monde Diplomatique**

**Damezrêner**
Hubert Beuve-Méry

**Rêvebir**
Serge Halimi

**Sernûser**
Maurice Lemoine

**Cîgirên sernûser**
Martine Bulardi,
Philippe Rivière, Anne-Cécile Robert

**Redaksiyon**
Alain Gresh, Mona Chollet,
Pierre Rimbert, Dominique Vidal

**Rêvebirê hunerî**
Alice Barzilay

**Dokumantasyon**
Olivier Pironet

**Sekreter**
Sophie Durand, Monique Salomé

Tel: 00 33 (0) 153 94 96 01
Fax: 00 33 (0) 153 94 96 26

1-3, rue Stephen-Pichon,
F-75013, Paris

**ABONETÎ**
Rudaw Media GmbH
Deutsche Bank
Konto: 245016101 - BLZ: 37070024
IBAN: DE21 37 07 00 24 02 45 0161 01
BIC: DEUTDEDBKOE
**Almanya:**
Salane: 40 Euro - 6 meh: 20 Euro
**Dervayê Almanya:**
Salane: 50 Euro - 6 meh: 25 Euro

www.arsivakurdi.org